


# Kurd (Dîrok û Kultura Wan)

Jemal Nebez



JEMAL NEBEZ • Kurd, Dîrok û Kultura Wan

avesta | KURDOLOJÎ: 236 | 17

*The Kurds, Culture and History*

*Kurd Dîrok û Kultura Wan*

*Jemal Nebez*

*(Berlin, 1997)*

*Wergera ji Ingilîzî*

*Ergîn Opengîn*

Edîtor: Abdullah Keskin

Berg: Genco Demirer

Wêneyê Berg: El Cizîrî

Tashîh û Mîzanpaj: Avesta

Çapa Yekem: 2008, Stenbol

Çap: Berdan Matbaası

Sadık Daşdöğen Davutpaşa Cad.

Güven San. Sit. C Blok, No: 239

TOPKAPI / ISTANBUL

Tel: (0212) 613 12 11

© Avesta, 2007

Ji xeynî danasînê bêyî destûra  
weşanxanê bi tu awayî nayê kopîkirin

**AVESTA BASIN YAYIN  
REKLAM TANITIM MÜZİK DAĞITIM LTD. ŞTİ.**

Hüseyin Ağa Mahallesi

Sakız Ağacı Caddesi

Öğüt Sokak No: 7

BEYOĞLU / ISTANBUL

Tel-Fax: (0212) 251 44 80

(0212) 243 89 75

Ekinciler Caddesi

Nurlan Apt. Giriş Katı No: 2

OFİS / DİYARBAKIR

Tel-Fax: (0412) 223 58 99

[www.avestakitap.com](http://www.avestakitap.com)

[info@avestakitap.com](mailto:info@avestakitap.com)

ISBN: 978-9944-382-36-6

Jemal Nebez

KURD  
DÎROK Û KULTURA WAN

*Wergera ji Ingilîzî*

Ergîn Opengîn

K

Gotarên Jemal Nebez di 19.09.1997an de li Civata Kurd li Berlinê bi zimanê almanî, Dr. Hasan M. Alî pêşgotin nivisandiyê, Dr. Hanna Küdler ji almanî wergerandiyê inglîzî. Wergera kurdî li ber wergera inglîzî çêbûye. Koberhem hejmar: 7

Zincîreya Semînar û Korên Zanistî, hejmar: 3

Gotara duyem axaftina panelê ku di 28 Çiriya Duyê 1993yan de li Parîsê di konferansa 'Zimanê Kurdî ber bi sala 2000ê' de hatiye pêşkeşkirin. Zanîngeha Sorbonne û Enstîtuya Kurdî ya Parîsê konferans organîze kirin. "Kurdistan Studies Journal" hejmar 5, Uppsala (Swêd), 2001. Ji aliyê "Western Kurdistan Associality" di sala 2005an de li Londonê cara duyem hatiye weşandin.

# naverok

Pêşgotin / 7

Awirek li ser jiyana Jemal Nebez / 11

Kurd, Dîrok û Kultura Wan / 17

Zimanê kurdî

Ji tradîsyona devkî bo zimanê nivîskî / 55

Hindek berhemên Jemal Nebez yê çapbûyî / 87

هه و النامه‌ی کتیب

Di Îlona 1997an de, bi helkefta merasîma vekirinê ya Mala Civata Kurd li Berlînê, li Almanyayê, kurdologê navdar Dr. Jemal Nebez axaftineke bi sernavê: "Kurd; dîrok û kultura wan" pêşkêş kir û ev axaftin gelekî bi germî hate pêşwazîkirin.

Ev axaftin ne tenê ji ber naverok û firehiya xwe, belkî ji ber ku ji daneyên deqîq û delîlên dîrokî yên zanistî pêk dihat gelek girîng bû. Dr. Nebez li ser gelek mijar û babetên cihê axaft, bo nimûne, dîrok û mîtolojiya kurdan a kevin a berî xirîstîyaniyê, bilindî û kûratiya kulturî ya kurdan li jêr sî û sîbera gelek êrîşên xelkên biyanî di Kurdistanê re, cihêrengiya dînen li Kurdistanê, ligel bal û girîngiyeke taybet li ser sînkretîzmê; wekî taybetmendiya herî beloq a kultura kurdan a dînî, û nasandina sînkretîzmê, wekî fênomeneke bi tewawî cuda ji dînen têkel.

Dr. Nebez, zanyarekî (fîzîknas) ku bi analîtîkî difikire, di



rabirduyê de aliqî û asê nema, herwiha axaftina wî ne mîna ramaneke arkeolojîk jî bû, bêhtir gotareke *Archigenesis* bû, ku bi awayekî rewan ji serdemên borî digihe rewşa gelê kurd ya niha.

Ev aliyên li jorê navborî, di nav rêza kronolojîk de û bi bingehên xwe yên zanistî di axaftinê de hatine vekolan. Mirov dikare bi dilniyayî bibêje ku ev gotar, netewe û boçûna wan a dî-nî her çi dibe bila bibe, dê bi kêr hemû mêjiyan bihê ku dipirsin û li dû rastiye ne.

Ji bilî wê hindê ku axêver, qederê niv sedsalê ye çalak e di warê kurdolojiyê de û li ser mijar û qadên cuda bi çend zimanan gelek xebatên akademîk belav kirine, ew, yek ji wan kêmkesan e ku li Almanyayê (welatê kurdolojiyê yê edetî) meyl û elaqeya li ser kurdolojiyê vejandiye piştî şerê cîhanê yê duyem ku êdî hema bêje çi behsa kurdolojiyê nedihate kirin li wir. Bêhtir bi xêr û saya wî bû ku xwendina 'Kurdolojiyê' hate avakirin di Institut für Iranische Philologie de li FU-Free University/Berlin (Zankoya Azad li Berlinê) ku bo 12 salan wî li wê derê wekî lêkolîner û mamosteyê akademîk kar kir.

Bi lêkolînên dûr û dirêj ên dehan salan û analîzkirina belgeyên ku ji aliyê zordestên li ser kurdan ve bi şewandin û sextekarî hatibûn guhertin û destkarîkirin, Dr. Nebez karî gelek rastiyan veşartî derbîne ber ronahiyê û bi vî awayî bexş û xizmeteke mezin kir bo belgekirina dîroka kulturî ya gelê kurd. Hêj di 1950an de Dr. Nebez ji aliyê raya giştî ve dihate nasîn, ji ber pêşkêşkirina wî ya kurdan wekî neteweyekê û kêşeya wan a neteweyî ku hewlekê dilêrane bû lê belê wê demê piranî şaş dihate famkirin. Ji hingî ve, wî ne tenê ji hizirvanên kurd ên hişk û bêmeslehet xwestiye ku werine pêşiyê, belkî ew bi xwe jî bûye yek ji wan ên pêşiyê. Wî têgeheke kurdbûnê pêşkêş kiriye, yanî kurdbûna neteweya kurd ku bi wê têgehê hemû tiştên din ên li ser meseleyê hatî gotin bûne tiştên

asayî û bêbuha. Dilê vê felsefeyê, yek cure Magna Chartaya kurdî, awayê fikirîna neteweyî ye û bingeha kurdbûnê sembiyoza (pêkvejiyan) ligel gelên cîran e. Tiştê ku Dante bo Zerdeşt gotî 'peyva wî ji kevir e, xebata wî avahî ye' dikare derbarê Nebez de jî bihê gotin.

Di axaftina xwe de Dr. Nebez analîzeke hurd û deqîq a etîmolojîk û etnografîk a gelek şahidên dîroka kurdan pêşkêş kir: 'Peyv, têrm, tişte û her çi zuhûr û xuyabûna jiyana civakî ya berê', ku bi sedsalan e wekî 'ne-kurdî' hatine dêran ji aliyê wan kesan ve ku Kurdistan dagîr kirine, û bi bêfikirî wesa hatine qebûlkirin ji aliyê kurdên ku şik nedibirinê û rexne lê nedigirtin.

Ev yek aşkera dike ku Dr. Nebez ne dîroknasekî asayî û jirêzê ye, berevajî, wî bi xwe dîrok çêkiriye lew yekî wesa ye ku rexneya kulturî û prensîbên sosyal û felsefîk digihîne hev û şêwe dide wan.

Ji bilî baweriya bi mafê gelê kurd ê welatekî yekbûyî, bēyî ku pêdivî bi izna hêzên din hebe, yanî wekî mafekî mîratî î ji xwe, du prensîbên sereke hene ku Nebezî dinimînin: Lêgerîna bêdawî ya belgeyên dîrokî û îfadekirina rastiyan bi awayekî herî qirardar, bi awayê ku di vê axaftinê de bi zelalî hate îfadekirin.

H. Mohemed Ali  
*Serokê Civata Kurd li Berlînê*

هه و النامهه كئيب

## Awirek li ser jiyana Jemal Nebez

Jemal Nebez di 01.12. 1933an de li Silêmaniyê wekî kurê alimê misilman ê têgihîştî hatiye dinyayê. Bavê wî, ew bi çend zimanan mezin kir û kulturên gelên cîran bi nêzîkî pê dane nasîn. Ligel dewamkirina xwendîngehên dewletî li Iraqê, wî derfet hebû li ser huqûq, felsefe û teolojiya îslamê jî bixebite li ber destên bavê xwe û alimên din ên welêt. Vê xebatê pêdivî bi zanîneke têr tesel a zimanên erebî û farisî û herwiha edebiyatên van zimanan hebû. Zêde ser de neçû, hêj dema xwendekar bû pê hesiya ku ne tenê rewşa polîtîk a gelê kurd, belkî zimanê kurdî jî bi muşkule bû. Heke rewşa polîtîk ya guherînê ba, diviya gelê kurd bi rêka zimanê xwe bihata ronîkirin û bo zimanê kurdî reformek pêwîst bû.

Jemal Nebez fizîk û matematîk û pedagojî li Fakulteya Rahênana Mamosteyan a Zanîngeha Bexdayê xwendin di nivê yekem ê 1950an ta payiza 1959an.. Materyalên xwendinê hingî bi ingilîzî bûn ku ew di xwendîngeha seretayî û navîn de fê-

rî ingilîzî bûbû û li Zanîngeha Bexdayê jî dewamî li fêrbûnê kiribûyê. Di hengava wê demê de wî çend kitêbên fîlozof û nivîskarên rojavayî xwendin, û gelek gotar nivîsandin di rojnemeyên ereban de derbarê mafên siyasî, civakî û mirovî yên gelê kurd de. Yek ji van gotaran ku di 1954an de nivîsandibû, gotareke rexneyî bû li ser hevpeyvîneke-çapemeniyê ya Celal Bayarê kevne serokcumhurê Tirkiyeyê yê hingî ku di hengava gerekê de li DYAyê kiribû. Di wê hevpeyvînê de Celal Bayar hebûna her çi gelê ji bilî tirkan li Tirkiyeyê înkâr dikir. Nivîsa rexneyî ya Nebez, di rojnameya Bexdayê 'Sawt el-Ahalî' (dengê gel), weşana Partiya Demokratîk a Niştimanî ya Iraqê (el-Hizb el-Watanî el-Dimuqratî) de hate weşandin. Wê hingî 'Sawt el-Ahalî' bi edîtorîya siyasetmedarê ereb û pêşengê sosyal demokrat ê navdar Kamil el-Çadirci (4ê Nîsana 1897-1ê Sibata 1968an) dihate weşandin. Weşandina rexneya Nebez bû sebebê muşkuleyêke dîplomatîk navbera du hevalbendên Pakta Bexdayê de -Tirkiye û Iraq- û herwiha serêşiyên huqûqî ji partî û rojnameya wê re, lê belê hevkat pê çêbû bo demekê balê bikêşe ser rewşa kambax a bi milyonan kurdên di bin sistema eskerî û dij-kurd a Tirkiyeyê de.

Hêj dema xwendekar bû Jemal dizanî ku ew dê rojekê muheqqeq dersên fizîk û matematîkê bide di lîseyên Kurdistanê de. Ji ber vê hindê, wî dest pê kir materyalên fêrkariyê bi zîmanê kurdî durist bike, da karê şagirtên kurd hêsan bike ku dema ew tenê bi zîmanê erebî fêrî mijarên zanistê dibûn gelekî zehmetî pê ve didîtin.

Ji Çiriya Pêşî 1955an heta 1961an, Jemal mamosteyê lîseyê yê dersên matematîk û fizîkê bû; sê salan li Başûrê Kurdistanê li Kerkûk û Hewlêrê û sê salan jî li Besra û Bexdayê li Iraqê mamostetî kir. Hêj di serî de Jemal hewl da alîkariya şagirtên xwe yên kurd bike bi şiklê ku dersên wan bi makezîmanê wan bide. Ji ber kurdî hingî qedexe bû di lîseyên Kurdistanê de,

tedbîr hatin girtin li dijî wî hem ji aliyê siyasiyan ve û hem jî di nava çarçoveya sîstema dîsîplînê ya xwendîngê de, ku bi sirgûna wî ya bo Besraya başûrê Iraqê bi encam bû. Di wan du salên ku li Kerkûkê mamostetî kirî de, Jemal bîngêhê yekem kitêbên fizîk û matematîkê bi zimanê kurdî danî. Di 1956an de wî elfabeyeke stensil a li ser cebîrê durist kir û di 1960an de pê çêbû yekem kitêba fizîkê bi kurdî biweşîne bi sernavê; '*Destpêk bo Mekanîk û Taybetiyên Maddeyê*', ku tê de ferhengokeke dewlemend a têrman hebû li ser fizîk û matematîkê.

Di havîna 1956an de Jemal çû Sûriye û Lubnanê ku li wê gelek rewşenbîr û nivîskarên kurd nas kirin ku bi zaravayê kurmanciya bakur dixebitîn û diweşandin. Hindek ji wan Apo Osman Sebrî (1ê Kanûna 1905-10ê Çiriya Pêşî 1993), Qedrîcan (1916-1972), Xanima Rûşen Bedirxan (11ê Tîrmeha 1909- 1ê Hezîrana 1992), Ahmed Namî, û yên din bûn. Wan behsa avakirina 'Akademiya Zimanê Kurdî' û pêwîstiya bikananîna elfabeyeke latînî ya yekgirtî bo zimanê kurdî dikirin. Protokola civîna wan bi destnivîsa Osman Sebrî, ku çûye dilovaniya Xwedê, hate weşandin di nav kitêba Jemal '*Kurdî bi Elfabeya Latînî*' de ku li 1957an li Bexdayê hatibû weşandin. Di hengava wê kurte gera xwe ya li Şamê de wî namilkeyek bi erebî nivîsand li ser '*Tevgera Azadiya Kurdistanê û Amacên Wê*' ku wî îthafî Nasirê serokcumhurê Misrê yê berê û pêşengê ereb ê nasyonalîst kir. Di wê namilkeyê de berjewendiyên muşterek ên herdu neteweyan, kurd û ereban destnîşan kirin. Paşî di heman salê de (1957) Nasir bernameyeke rojane bi Kurdî da destpêkirin di Radio Kahîre de ku her roj di bernameyê de sirûda neteweyî ya kurdan "Ey Reqîb" jî dihate lêdan. Jê pê ve, kurd, dîrok û kultura wan ji hingî pê ve hate lêxebitîn li Zanîngeha Kahîreyê û kitêbên dîrokî yên alimên navdar ên kurd dîsa hatine çapkirin, bo nimûne, *Şerefname* ku di sala 1596/97an de hatiye nivîsandin û tê de bêhejmar detayên

dîrokî hene ligel teswîra sînorên Kurdistanê ya sedsala 16an.

Jemal ji nû ve sefereke dîtir kir di havîna 1957an de, vê carê bi aliyekî din ve lê bi niyeteke wek ya pêşî, çû bo rojhilatê Kurdistanê û Tehranê. Wî li Kirmaşanê ligel yên din nivîskarê kurd Fetah-Elî Heyderî Zêwacoyî û li Sineyê (Senendec) mela û nivîskarê kurd, Ayetullah Mihemed Merdoxî Kurdistanî (1885-1975) nas kir. Wan li hev kir ku her berdewamî xizmetê li ziman û kultura kurdî bikin.

Di salên muteakîp de -heta 1962an ku ji Kurdistanê derket da bête Ewrûpayê- Jemal bi zimanên kurdî û erebî gelek nivîsî li ser mijarên cihêreng ên filolojîk, kulturî û siyasî.

Jemal Nebez yekemîn kurd e ku hem rejîma totalîter a Rûsya Sovyetê û satelaytên wê yên li rojhilatê Ewrûpayê û hem jî bi giştî marksîzm û komûnîzm bi awayekî eşkerayî rexne kirine û bi zanistî analîz kirine, lê divêt bi sosyalîzmê re neyê têkelkirin ku bi ya Nebez sosyalîzm sîstemeke civakî ye ku ji hemiyên din bêtir azadî û wekheviyê dabîn dike. Ji ber vê jî nabe ku sosyalîzm bi sîstemeke totalîter bê û ne jî ji aliyê proletaryayê bê sepandin, ew bi azadî û perwerdeya mirovane ava dibe.

Wî gelek ceribandîn weşandin li ser vê hizrê. Hewlên wî 'Ekola Sosyalîzmê ya Kurd' pêk anî ku partiya KAJYK a Kurd hizrên wê ekolê bi şiklê wan ê ewil helgirtibûn. KAJYK di 14ê Nîsana 1959an de hatibû avakirin û heta Adara 1974an wekî partiyeke polîtîk ma. Wê ekola sosyalîzma kurd, azadî û wekhevî wekî tamamkerên hev diyar dikirin. Bêyî wekhevî azadî û bêyî azadî jî wekhevî ne mumkun e. Herwiha, azadî neda-beşbar e, yanî çawa ku tu navgîn ne di navbera jîyan û mirinê de ne, wisa jî tu navgîn ne di navbera azadî û ne-azadiyê de ne. Hûn nikarin hindêk azadiyê ji A re û hindêkî kêmtir ji B re terxan bikin. Nebez hizrên xwe kite bi kite rave kirine di kitêba xwe ya bi zimanê kurdî de *'Hindek Ramanên Bingehîn li*

ser *Ekola Kurd a Sosyalîzmê* (çapa yekem, Stockholm, 1984, çapa duyem Hewlêr, 2001).

Dr. Nebez gelek mijar li zanîngehên cihê yên Rojhilat û Ewrûpayê xwendine, wekî fizîk, matematîk, felsefe û pedagojî li Zanîngeha Bexdayê 1950-55; erebî, ilmê îslamê, îranolojî, pedagojî li Zanîngeha Munich û Würzburgê 1963-66; îranolojî, ilmê îslamê û pedagojiya berawurdî li Zanîngeha Hamburgê 1967-70; zanistên siyasî, rojnamegerî û huqûq li Zanîngeha Azad a Berlinê 1970-79.

Di 1965an de dema xwendekar bû li Munichê, ligel hevalên xwe yên partîzan Brûsk Îbrahîm û Letîf Elî, Yekîtiya Neteweyî ya Xwendekarên Kurd li Ewrûpayê (National Union of the Kurdish Students in Europe -NUKSE) ava kir. Di 1985an de wî û penaberên din ên ji Kurdistanê, akademîsyen, zanyar, rewşenbîr û hunermendan Akademiya Zanist û Huner a Kurd li Stockholmê ava kirin. Di nav endamên avaker de Brûsk Îbrahîm (muhendis), toksîkolojîstê (jehrnas) navdar Dr. Bahran Resul (profesor li Zanîngeha Uppsalayê), Dr. Kemal Elî (dîroknas), Fexrî Salahschor (nivîskar û lêkolîner), Dr. Hesên Hisamî (cerrah), Dr. Issam Şerîf (ekonomîst) hene.

Dr. Nebez wekî wergêrekî profesyonel jî xebitiye li dadgehên Almaniyayê û noteran, bi zimanên erebî, farisî, kurdî û almanî.

Wî sehkeriya zimanê kurdî kiriye di "Staatliches Prüfungsammt für Übersetzer und Dolmetscher" de li Berlinê (1978-83) û di "Bayerisches Staatsministerium für Unterricht, Kultus, Wissenschaft und Kunst" li Munichê (1992). Hêj dema li welatê xwe bû hindêk berhemên edebî ji Shakespeare û Gogol wergerandin bo kurdî. Profesore rojhilatnas ê fransî Thomas Bois ew wekî 'wergêrê bêqusûr' helsengand (Bois, Thomas: *Connaissance des Kurdes*, Beyrouth, Khayats 1965).

Di salên 1970î û serê salên 1980î de Jemal li wan karan bû-



ye: 1971-72 dersdar, Free University of Berlin, Enstîtuya Fîlo-  
lojiya Îranî; 1972-76 berpîrsê zanistî di warê Rojhilatnasiyê de  
li Deutsche Forschungsgemeinschaft (Saziya Lêkolînê ya Al-  
man); 1978-82 profesorê alîkar, Îrana îslamî, farisî û zimanên  
din ên Îranî, Free Universtiy of Berlin; û 1978-83 sehkerê wer-  
gêr û mutercimên zimanê farisî li Berlinê (Staatliches Institut  
für Dolmetscher und Übersetzer) û sehkerê wergêr û muterci-  
mên zimanê kurdî li Munichê (Wezaretê Perwerde, Zanist û  
Kulturê ya Bavaraianê).

Dr. Cemal Nebez endamê Deutsche Morgenlandische Ge-  
sellschaft (Civata Oryantal a Alman), Deutsche Vereinigung für  
Politische Wissenschaft (Komela Alman a Zanistên Siyasî),  
Akademiya Zanist û Huner a Kurd li Stockholmê, Deutsche  
Gesellschaft für Sprachwissenschaft (Civata Zimannasiyê ya  
Almanyayê), Societas Iranologica of Europe, û Nichtraucher-  
bund Berlinê ye (Yekîtiya Cigarenekêşan).

کتابخانه  
کتابخانه

## Dîrok û Kultura Kurdan

**M**êvan û beşdarên hêja! Êvarbaş, hûn bi xêr hatine, mijara me *kultur û dîroka kurdan* e. Min divêt di serî de bibêjim ku dîroka kurdan ne tenê dîrokeke gelekî kevnare ye, belkî gelekî dilsoj û têkel e jî ligel kultureke muqabilî wê dewlemend. Lewma, ji we tîka dikim li min negirin ku di nav saetekê de ez dê bi zor bikaribim kurteyêke mijarê bidim.

Îro kurd, qederê 40 milyonan in. Navê niştimana wan Kurdistan e, an ku 'welatê kurdan.' Kurdistan ne navê welatekî an jî dewletekê ye, lê belê erdek e ku di sedsala 20an de bi darê zorê hatiye parçekirin di navbera pênc dewletan de (Tirkiye, Îran, Iraq, Sûriye û Yekîtiya Sovyetan). Piştî belavbûna Yekîtiya Sovyetan, serê salên 1990î, parçeya Kurdistanê ya Sovyetan (Kurdistana Sor) bû parçeyêke Azerbaycan û Ermenistanê. Îro, kurd mezintirîn netewa xwedanwelat a bêdewlet e li ser rûyê erdê.

Kurdistan ji Qefqasyayê dirêj dibe ta Zerya Spî û ji wir ta di-

gihe Kendavê. Beşeke wê dimîne di nav Mezopotamyayê de ku wekî 'landika mirovatiyê' tê qebûl kirin. Hêj berî bi hezaran salan li vê herêmê kulturên bala yên wekî mîtrayî an jî bawerîya rojê hebûn. Bûdayî hebû li wir; mazdayî dîne zerdeştîyan hebû ku xwe disparte têkiliya di navbera başî û bediyê de wekî dualîzmeke xwezaya jiyane. Herwiha, dîne manî an jî manîti jî hebû. Dîne manî, bi awayekî sembolîk dualîzma xwezayê radigihande hebûna ronahî û tarîtiyê. Cihûyî, xirîstîyanî û îslam hebûn (û hêj jî hene) li Kurdistanê. Di sedsala nozdehan de gelek kurd hebûn ku dînen xwe berdan û çûne ser dîne bahaî.

Koka vî dîni ji babayîti tê ku ji aliyê Mela Ali Muhemmedê Şîrazîyê farisekî Şî'e (1819-1850) ve hatibû danîn. Navekî din ê Şîrazî jî Bab bû û sebebê vî navî ew bû ku bi erebî dihate wateya 'derî' (bab) û Şîrazî xwe 'wekî deriyê di navbera Xweda û mirovan de' dida nasîn. Bi saya Bahauallah (1817-1892), Babayî piştîre bû dîne bahaî. Aştiya cîhanê û dûrî ji siyasetê, bingeheên vî dîni ne ku di cîhana îslamê de pirr tê zorlêkirin.

Bila behsa me li ser dînan bes be, aya gelên li vê 'landika mirovatiyê' dijiyan kî bûn, çawa bûn? Li vir ez bes hindekan bi nav bikim, bo nimûne îlamî, hîtî, hurrî, med, mîttanî, karduxî, korduenî, sasanî, aşûrî, yewnanî, ew gel in ku an xwecihên wî parçeyê taybet ê dinyayê bûn an jî ew der dagîr kiribûn. Kurdên resen ligel wan kulturên di têkiliyê de bûne û îstîfade lê dibirine, û dewlemendiya kultura wan, wekî ku dê li vir bête nîşandan, li ser vê bingehe hatiye pê.

Em dikarin dîroka kurdan bikin du serdem, dema pêş-îslamê û ya piştî hatina îslamê. Hatina îslamê bo Kurdistanê û Îranê di sedsala 7an de piştî Îsa, rûdaneke herî girîng bû ji bo herêmê û hemû cîhanê. Vêga wisa bifikirin: Îslam di sedsala 7an de piştî Îsa hate vê herêmê, û piştî şeş sedsalan bi ser vê de, yanî di sedsala 13an de bi durustî, rûdaneke din a girîng çêbû

li wir: Dagîrkirina moxol-tirkan ku li sertaserê Kurdistanê he-  
ta Bexdayê pêk hat. Dema dagîrkerên moxol-tirk hatin tev de  
îslam qebûl kirin, û -tiştê pirr girîng- wan zimanên erebî û fa-  
risî jî bo ragihandina rêveberî û dînî qebûl kirin. Bilî hebûna  
sinifeke nû ya rêveber a îslamî ku gelên nûhatî herêmê jî tê de  
bûn, di warê kulturî-dînî de tu guherînên mezin pêk nehatin  
piştî dagîrkirina moxol-tirkan. Lewma, bi dagîrkirina moxol-  
tirkan, mirov dikare îddîa bike ku kawdana kurdan a kulturî-  
dînî di hemî qedemeyan de dibe du beş, dema berî hatina îs-  
lamê û dema piştî wê.

Di dema pêş-îslamî de dîn û baweriyên navborî hebûn li  
wir; mîtrayî an jî baweriya rojê, bûdayî, mazdayî û manîî, ci-  
hûyî û xirîstiyani, di hengava gihiştina îslamê de yên herî ber-  
belav mazdayî û manîî bûn.

Di demên ewil ên mirovatiyê de mîtrayî hebû li sertaserê cî-  
hanê, û bermayên vê tradîsyona baweriya rojê li her derê têne  
dîtin. Dema mirov duayekê dikin bo Xweda, bê hemdê xwe  
serê xwe dizivirînine esmên bi aliyê rojê ve. Ev yek li her de-  
rê wiha ye. Ev bermayên mîtrayiyê, bêguman gelekî zelal in di  
kultura kurdî de. Di nîveka alaya Kurdistanê de şiklê rojê he-  
ye ku dema Komara Kurdistanê di 1946an de li paytexta xwe  
Mahabadê hate damezrandin, bû alaya resmî ya Kurdistanê.  
Ev nûmûneyeke hevçerx e bê ka roj bo kurdan çendî girîng e.  
Hêjayî gotinê ye ku rengên kesk û sor û zer bi hev re rengên  
kurdan ên neteweyî ne.

Li dû mijûliya zanistî a bi salan li ser mîtolojiya kurdan, ez  
dikarim bibêjim ku *roj*, *heyv* û *stêr* xwedanê girîngiyeke tay-  
bet in di mîtolojiya kurdan de. Di vê kontekstê de em dibînin  
ku kurd gelekî zû bi feleknasiyê û herwiha matematîk û zanis-  
tên xwezayî daketine.

Çend rwanghên (rasatxane) heyv û stêran hebûn li Kur-  
distanê. Ya herî naskirî li ser çiyayê Gilezerdeyê bû li dorûbe-

rên Silêmaniyê. Yên elaqedar dikarin gotareke li ser vê rwan-gehê di kovara *Deutsche Morgenlandische Gesellschaft* (no. 122 ya sala 1972an) de bixwînin ku min bi Profesor Wolfhard Schloserê feleknaşê alman ê naskirî re nivîsiye.

Zerdeştî û bûdayî li dor heman wextî, qederê 6 sedsal berî Îsa, derhatin. Ji ber ku Zerdeşt îranî bû (heke ne kurd bûbe), dîne zerdeştî gelekî bi hêsanî belav bû li Kurdistanê. Gelek pe-restgeh û abîdeyên li ciyên cuda cuda, bi taybetî li herêma Kir-maşanê li Rojhelatê Kurdistanê, şahidên vê yekê ne îro.

Baweriya zerdeştî li ser bingehê 'sêyeyekê' (trinity) ye: 'Baş bifikire, baş biaxive, û baş tevbigere.' Yek divê 'derew û fêlba-ziyê'<sup>1</sup> neke da ku bibe xwedanê vê sêyeyê. Bi ya Zerdeştî, du hêz hene li dinyayê, hêza başiyê û hêza bediyê ku herdem şe-rê hev dikin û ne xuya ye ka kîjan hêz dê bi ser bikeve di tê-koşîna di navbeyna wan de. Heke mirov ligel aliyê baş bin, an jî parçeyeke 'leşkerê heqiyê' bin, başî dê serbikeve. Encam dê berevajî bidêre û hêza bediyê dê serbikeve heke mirov ligel be-diyê de bin. Dualîzma kurd-îraniyan ne wekî dualîzma semî-tîk e. Di dînen Semîtik de, di xirîstiyani, cihûyî, û îslamê de, Xweda bi xwe bedî afirandiye (hêza bediyê); û Xweda (an jî başî) dê muheqqeq serbikeve axirîn. Ev ne wiha ye di zerdeş-tiyê de. Di zerdeştîyê de encam pê hereket û refdarên mirovan e. Yanî heke mirov ligel başiyê bin, Xweda (Ahura-Mazda, an jî Hurmiz di nav kurdan de) dê serbikeve. Berevajî wê dê çê-be heke mirov xwe bidine rexê bediyê ve; hingî xerabî (Ehrî-man, an jî Hermîn di nav kurdan de) dê hukmî bike.

Dîne bûdayî di sedsala 6an de BZ li Asyayê dest pê kir, û piştî hingî zû belav bû û gihîşte Kurdistanê jî. Pêşengê dîni,

1 Li vir tiştê balkêş cotwateya di zimanê almanî de ye. Bi kurdî hindêk dişibin hev, bo nimûne, du peyv hene bo 'dêw': Dêw û drînc. Drînc tête wateya 'derew' jî bi zimanê Pehlewî. Gotinek heye di kurdî de: Derewîn dijminê Xwedê ye. Ji ber ku 'şeytan' dijminê Xwedê ye, li vir şeytan, derewînî simbolîze dike.

Sedr Herteyê bi paşnavê 'Bûda' (560-480 BZ), di malbateke pirr dewlemend û gewre de mezin bû li bajarekî nêzîkî Nepalê. Wî malbata xwe zû terikand û dewlemendî û deshilat dane aliyekî. Wî fikra wazhênana (destjêberdan) ji dinyayê beyan kir ligel xweparastina ji alkol û xwarinên tamdar, û bêexlaqiyê. Bûdayî hizra hezkirina ji hemî giyaneweran belav kir. Wî kuştina her çi heywanan jî balindeyekê qedexe kir. Divêt li vir diyar bikim ku kurd îro hêj jî balindeyan wekî heywan nahe-sibînin. Bi ya min, vê têkildariyeke qedîm a dînî heye. Di mî-tolojiya kurdan de, balatirîn bûnewer di destpêka afirînê de bi şiklê balindeyekê tê temsîlkirin, û balinde hêj jî wekî simboleke sersirûştî bi gelek awayên cuda xwedanê ciyekî qahîm e di nav kultura kurdan de.

Bûda, ne tenê bi tesîra zerdeştîyê û/an jî mazdayiyê, ligel heywan û balindeyan kuştina her çi giyanewerekê qedexe kir, wî gote mirovan ku derewan nekin û durust bibin. Dizî cem wî di nav gunehên herî mezin de bû. Bi tesîra hînduyiyê, Bûda bawerî bi koça ruhan (tenasuh) dianî. Şîroveya bûdayiyan ku Bûda 'kurê Xwedê' tamamî saf û pak hatiye dinyayê wekî ku Îsa ji Meryemê çêbû, tesîra bûdayiyê li ser dînê xirîstiyaniyê nîşan dide, herwiha tesîra wê ya li ser gelek dînen kurdan ên sînkretîk\* (pêkhatî), wekî ehl-î heq ku ezê paşî bi nimûneyeke konkret ronî bikim.

Zerdeşt şeş sedsalan berî Îsa jiya. Bi vî awayî dema pêxember Manî dînê manî pêş xist, mazdayî jixwe dînekî têra xwe kevn bû. Serê ewil Manî bo hizrên xwe yên dînî xirîstiyân bû û di sala 242an de PZ, pêxemberiya xwe beyan kir. Ne wekî zerdeştî û mazdayiyê, Manî li ser başî an bediyê neaxaft, lê belê ew li ser ronahî û tarîtiyê axaft. Ronahî ruh e, û pak e. Tarîti madde ye, û qirêjî ye. Dema giyanewerek dimire, ruhê wî diçe esmên û madde -ku bed e- diçe erdê. Di hebûna her mi-

\* Îzaha sînkretîzmê di meqaleya duyem têbiniya sêyem rûpel 56 de heye (-wr.)

rovekî de du tişt hene, pakî û qirêjî. Ji bo ku mirov xwe pak bikin divêt bimirin, û dema mirov hêdî hêdî û hemî dimirin, dawiyê tu kes dê nemîne li ser rûyê erdê; bi tenê ruh dê bimînin û ew ê pak bin. Lewma Manî li dijî muesseseya zewacê û çêbûna zarokan bû. Bi vî awayî mirovatî dê bi dawî be û dê xwe pak bike.

Dema Manî dest pê kir dîne xwe li Kurdistanê belav bike, xirîstiyani jixwe li wir hebû. Manî di sedsala sêyem a piştî Îsa de jiya. Dema dîne wî hate Kurdistanê, li wir gelek kurdên xirîstiyani hebûn. Ev yek bi çavkaniyên aramî hatiye piştraskirin ku yek ji wan Mar Marî ye ku li Urfayê keşe bûye û di 226 PZ de miriye. Bîranînên wî hatin wergerandin bo zimanê almani jî di nivê duyem ê sedsala dawî de.<sup>2</sup>

Jê pê ve, wê demê cihûtî hebû li Kurdistanê ji ber ku gelek cihûyên cezakirî hatine Kurdistanê. Di belgeyên dîrokî de bo nimûne di Tewratê de behs li welatê medan tê kirin. Med, bapîrên kurdan tene qebûl kirin û pesna ku di Tewratê de bo medan tê kirin, dikare bo kurdan jî bê hesibandin.

Balkêş e ku gelek hîpotez hene derheqê binewarên (orijîn) kurdan de. Ji baweriyên mîtolojîk dest pê dikin ew hîpotez (mn. ku kurd ji têkiliyê efsanewî ya di navbera cin û xulamên Qral Silêman de hatine) ta gelek fikrên bi meylên polîtîk (mn. ku kurd bi 'eslê xwe ereb in an jî tirk in). Heke yekî dil lê be bi rast û durustî binewarên mîletekî têbigihe, divêt li ser ziman, dîrok û hemî bermayên arkeolojîk ên wî mîletî bixebite. Hîpoteza herî pêbawer a li ser binewarên kurdan digihe medan. Mezintirîn layengîrê vê teoriyê, oryantalistê rûs ê di warê navneteweyî de navdar û pisporê kurdan Vladimir Minorsky (1877-1966) ye. Lêkolînên min ên li ser zimannasiyê ku min di 1970an de li Almaniyayê bi kurdî û almani weşan-

2 Hoffman, Georg: Auszüge aus syrischen Akten, Leipzig 1879-81, hej. 7 (1881), rp. 74-75 û Minorsky V. di 'Enzyklopaedie des Islam.', "Kurden" (Kurd), r. 1232

din, gihiştine heman encamê, ku belê bêşik têkiliyek heye di navbera med û kurdan de. Îro, navên kevn ên ciyên cografî yên qedîmî li Kurdistanê şahidên wê têkiliyê ne, bo nimûne Amed, Amêdî, Amûde. Divêt diyar bikim ku li vir tîpa A bi wezîfeya Ava, Avah(y)î (cî, xanî, avahî) radibe. Û heke kurd ne ji medan lê ji hurriyên qedîm hatibin, wekî ku hindêk zan-yarên wekî Egon von Eickstedt, û îro Mehrdad R. Izady difikirin, ew herwiha ligel cihûyan jî jiyane di imparatoriya medan de, li erdekî ku cihûyan ji bo penahê berê xwe dabûnê û ku -piştî jibeynçûna medan- wekî Kurdistan hatibû binavkirin. Cihû ne tenê di demên qedîm de li vê herêmê jiyane. Gelek ji wan di sedsala 20an de berî avabûna Îsraîlê hêj jî li wir dijiyan, ku ligel avabûnê koç kirinê. Ew wekî cihûyên kurd tene binavkirin ji ber ku meyleke wan a bicibûna bi hev re heye, carinan bi hejmarên gelek zêde. Xwe îro jî, ew mirovên bi baweriyên xwe cihû û hevvelatîyên Îsraîlê, ji aliyê kulturî ve xwe bi kurdan re didin nasîn û heta dibêjine xwe; 'Ana Kurdî' (bi zimanê îbranî, bi wateya 'Ez kurd im').

Dema îslam hate Kurdistanê jixwe gelek dîn hebûn li wir ku hêj nehatine behskirin, bi taybetî dînen sînkretîk ên kurdan. Dînen sînkretîk ên kurdan ew dîn in ku baweriyên mîtolojîk ên pîrr kevnar digihînin elementên dînen behslêkirî. Ew dînen sînkretîk ên kurdan, bi naverok û hindêk ayînen xwe ji hev cuda dibin. Tiştê hevbeşê wan hemî dînan ew e ku birreke baweriyên kevn ên cuda digihînin hev û mentiqane têkil-dar dikin lê belê wan nahelînin. Dema em behsa sînkretîzmê dikin mebesta me jê ev e. Di vê kontekstê de hûn nikarin bibêjin ku ew dînen têkel in, ji ber ku di dînekî têkel de element gelekî pitir li hev aliyayî ne, û lewma zehmet tene naskirin; hetta pîrrî yekcar nayên naskirin. Wekî mînakekê bo dînekî sînkretîk em dikarin li vir li desteyeke gulan binêrin. Kulîlkeke zer heye lê, yeke sor, yeke spî, û belgên kesk hene lê. Her



yek ji wan taybet e, bes hemî bi hev re desteyekê pêk tînin. Deste, bi sînkretîkiya xwe tiştêkî nû ye. Heke yek rabe û kulîlkan û belgan ji hev veqetîne û hetta ji hev biçirîne û paşî wan parçeyan berhev bike, ew dê bibe mîkstûr. Dereceya mîkstûrê dibe biguhere. Divêt hindêk ji parçeyên orijînal bêne naskirin, nexwe mirov nikare behsa tevliheviyekê bike. Li gel vê jî, ferqa di navbera sînkretîzmê û dînekî têkel de hêj jî gelekî bingehîn û girîng e.

Di sînkretîzmê de ferq û cihêrengî parastî ne, lê belê tiştêkî nû jî dertê. Ev yek berevajî proseya pêkhatina dînekî têkel e ji ber ku dema dînekî têkel pêk têt, ferq û cihêrengî her kêmbibin. Taybetiyêke dînen kurdan ew e ku sînkretîk in, û ev sebebek e bê çima kultura kurd ewqas dewlemend e, çima kultura kurd bi mîratî kultureke plûralîst e.

Ji dema ku di sedsala 7an (PZ) de hate Kurdistanê ve, îslamê, bêşik şikl daye dînen kurdan ên sînkretîk û bi awayên cuda ew dewlemend kirine. Ev çend mînak in. 'Êzdî' gelek caran wekî 'şeytanperest' têne nasîn li derve, lê belê ev bêqîmetkiri-neke zikreşane ye. Ya rast, ew dînekî sînkretîk e ku gelek elementên mîtrayî û manîiyê parastine. Dema êzdî nimêjan dikin berê xwe didine rojê ku ev 'edeteke Mîtrayî ye. Êzdî dibêjin ku her kes 'sîbera (şeytan) xwe ya tarî' ye. Ev bawerî muqabilî manîiyê û muqabilî wê fikrê têt ku her giyandarek ji ronahiyekê an ku ruhê pak ('baş'), û madeyeke qirêj ('bed') pêk têt. Dema êzdî, Roja Îniya Mezin û Pêxember Îsa pîroz dikin - wekî ku her zanyarekî dîni dikare tê derxe- edeteke xirîstiyaniyê disepînin. Dema êzdî wekî derwêşên kurd rêz dibin û dansa transê ya navdar dikin, hingî kiriyara wan dikare wekî baweriya îslamî ya kurdan bê binavkirin. Heta niha an qet, an jî pir kêmbêz û hurmet li kurdan û kultura wan hatiye bexşandin. Û niha, dewlemendiyên vê kulturê têne dîtin lewma giranî û meziniya bêqedrîkirin û cudakariya rabirduyê zelaltir dibe.

Wer tê zanîn ku elewî, peyrewên Eliyê xelifeyê misilmanan in lê belê ev şîroveyeke ne rast e. Bi lêkolîneke wisa, êzdî jî bûn peyrewên Yezîdê kurê Muawiyeyê xelifeyê misilmanan. Ev etîmolojiya amiyane ye ku bi tenê li ser bingehê wekheviya dengan e. Hindek ereb heman rêbazê bi kar tînin û îddîa dikin ku 'Shakespeare' bi eslê xwe ereb bû û navê wî 'Şêx Zûbeyr' bû.

Wekî rastiyeke meselê, êzdî dibêjine xwe 'êzdî', ne 'Yezidî' ku ev tiştêkî pir muhîm e. 'Êzd', bi kurdî 'Xweda' ye (an jî milyaket), û Êzdî rasterast dibe bawermendê Xweda (ne ku şeytanperest). Di semînera xwe ya bi sernavê 'êzdî ne "Şeytanperest" in' de ku min di Gulan 1990an de li Zanîngeha Bermenê pêşkêş kiribû, min bi hûrgilî rave kir ka wekheviya fonetîk a di navbera peyva 'Şeytan' a bi îfadeya kurdî û peyva 'Şeytan' a bi orijîna xwe Semîtîk (bi zimanê îbrani 'satan-şeytan') bû sebebê şaşfamkirineke dîtir a mezin. 'Şeytan'a bi kurdî tête wateya 'bi bedenê milyaketekê', û tu elaqeya wê bi şeytan re nîne. Tevlîheviyeke dîtir li ser navê pîroztirîn nirxa êzdiyan an ku 'Tawûsê Melek' derhat ku li gorî wateya peyva 'tawûs'ê ya di kurdiya îro de hatibû wergerandin. Bi ihtîmaleke mezin peyva 'tawûs' jî zimanê yewnanî hatiye dariştin û elaqe bi peyva Zeus û Theos heyê ku wateya Xweda îma dike. Hevaheng, Tawûsê Melek, Meleka Xwedê ye. Êzdî bi xwe jî Tawûsê Melek wiha qebûl dikin û wiha dihebînin.

Li vir û niha em nikarin rave bikin ka êzdiyan çi reaksiyon dane averêkirina dînê wan bi destên biyaniyan, ka çawa xwe li wan guhertinan anîn û çawa muqabilen şîrove kirin ew. Dêvla wê, divêt em li rewşa manend a elewiyan binêrin. An jî ber nezaniya tewaw an jî ji ber mebestên polîtîk ên ne-zelal, elewî carinan wekî neviyên Eliyê çarem xelifeyê îslamê têne nasandin; carinan wekî 'qelpe misilman'; û carinan jî bi îdeolojiya nijadperest a Mustafa Kemal ('Ataturk') ve têne pêwen-

dîdarkirin. Min 'ceribandinek' a Enstîtuya Etnolojîk a FUYa Berlinê dît ku bi wê boçûnê rave dikir. Zanista bedbext! Ciyê heyirînê ye ku sewiyeya kurdolojiyê li Almanyaya ku heta Şerê Duyemê Cîhanê niştmana Kurdolojiyê bû, daketiye nuqteyeke wesa ku qelpe zanistekê wiha jî lê mumkun e. Gelek tezên master û doktorayê li zanîngehên Almanyayê, hind layengîr in ku dema mirov wan dixwîne, têdigihe ka nivîskar di kîjan organîzasyonê de dixebite an jî dê bixebite, pirrî caran li 'Deutsche Orient Institute' li Hamburgê.

Her çî kesê ku dixwaze baweriya elewiyan bi rastî têbigihe, divêt wê, di nav konteksta dînen sînkretîk ên dîtir ên li Kurdistanê de binirxîne. Çend elaqeya êzdiyan bi Yezîd hebe, hind elaqeya elewiyan bi Elî heye. Li gorî lêkolînên min ên fireh, têgeha elewî têkildarî hêza agirî ye ku agir simboleke ronahiyê ye di kultura kurd de. Peyva 'halav/hilav' a bi kurdî, xwedanê wateya 'hilma ava kell' an jî 'serê gurriya agirî' ye. Elewiyan qewî elaqe bi Elî re nîne bes bi halav/hilavê re gelek heye, ji ber ku herwekî kurdên dîtir ku li bal wan agir pir nixdar e, elewî jî êgir pîroz dihebînin. 'Edetê wan e ku bêyî anîna navê Xwedê û/an jî estexfurullahiyê agir an mûmê venemînin.

Bi vê helkeftê, peyva ku wekî 'alev' bû malê zimanê tirkî, peyva 'halav/hilav' a kurdî bû; ne bi şiklê berevajî ku tirk dê îddîa bikin. Hetta wateya eslî ya 'hilav/halev' a kurdî (serê gurriyê) jî ma piştî ku peyv kete nav zimanê tirkî.

Hindek şaşfamî jî li ser ehl-î heq (xelkê rastiye) hene ku bi navên kakeyî û yaresan jî tene nasîn. Dibêjin ku ew 'Eliyullahî' (Elîperest) ne, û lewma jî qelpe misilman in. Di rastiya xwe de Xwedayê ehl-î heqê, ne Elî ye; lê Sultan Sahak e. Dibêjin ku ew ji keçeke kurd peyda bûye û wekî ku di halê Meryemê de ducanîbûneke pak bûye. Carekê dema li bin darhinarekê radizê, dendikeke fêkiyê dikeve nava devê wê ji ber ku balindeye-

kê tam li hindava serê wê fêkî kirrandibû û dendik xistibû.

Bi gelek awayan em dikarin bibînin ku ew dînên ku heta îro jî li Kurdistanê dijîn -êzdî, elewî, şebek, heqqe, ehl-î heq (an jî kakeyî an yaresan)- hemî elementên cihêreng teşkîl in û baweriyên nû pêk anîne, ligel ku gelek wekhevîyên esasî jî hene di navbeyna wan de. Hemî, Yezdan wekî xaliq û take hakim qebûl dikin. Ew, yek-Yezdan e û li her der û gavê (omnipresent) ye. Ligel vê jî, ev Yezdan rasterast hukim nake, bi rêya heft *alîkarên* xwe yên berpirsên herêm an beşên cuda, hukmê xwe dike. *Alîkareke sereke* an jî melekeke serek heye ku serkirdayetiye li melekên din dike û di nav wan de jî melekeke jin heye. Ew dîn hemû, hebûna şeytên red dikin û mirov bi xwe wekî 'şeytanê' mirov/xwe qebûl dikin.

Jê pê ve, baweriya bûdayiyê ya koça ruhan parçeyeke dînên sînkretîk ên kurdan e, û herwiha baweriya ku hebûna îlahî (Xweda) carinan bi rêya laşdarbûna ruhên xwe xuya dibe. Herwiha, hemî temsîlên efsanewî yên van dînan, têkildarî ciyine diyar in li Kurdistanê. Stran û muzîk aîde hemî rê û resmên merasîmên wan dînan in. Di hemî çalakiyên wan dînên sînkretîk ên kurdan de xwedanê ciyekê ne, û tiştê balkêş ligel stran û muzîkê ew e ku hem mêr hem jî jin beşdar dibine van çalakiyan. Taybetî di nav misilman û xirîstiyanan rojhilatî de ew cure çalakiyên dînî ji ber ku her du zayend beşdar dibinê bi tarîfa 'çalakî û merasîmên serseriyî' têne kirêtkirin.

Berevajî îslamê ku nirxeke zêde dide rojî û nimêjan, hemî dînên sînkretîk ên kurdan têkiliyên mirovan û alîkariya mirovan girîngtir qebûl dikin ji rojî û nimêjan.

Hemî dînên sînkretîk ên kurdan, heta dereceyekê xwedanê wê kakila hevpar a kultura kurd in ku me taze teswîr kir, û hemî li ber îslamê sekinîne di sedsala 7an de. îslam bi darê şûrî û bi rêka şerî hat. Di sedsala 7an de Kurdistan parçeyeke Împaratoriya Sasanî bû ku Sasanî împaratoriyeke bi hêz bû û di-

jîtiya Împaratoriya Romayê dikir. Dema erebên misilman ji çolê derhatin, bilî şûr tu çekeke wan a dîtir nebû. Leşkerê Sasanî xwedanê tîr û kevanan bû. Çendan ereb bi hejmara xwe kêmtir bûn û li ser erdekî nenas bûn jî, mexlûb nebûn. Ereban pê çêbûn Împaratoriya Sasanî birûxînin. Pê çêbûn paytexta împaratoriye Tisafounê (nêzîkî Bexdayê) vegirin, û wiha bi-kevine Kurdistanê. Heta îro, sînore Kurdistanê nêzîkî Bexdayê ye. Bi vê helkeftê, navê Bexda, ne bi erebî ye, lê peyveke kurdî-îranî ye. Ji 'Bagadata'yê hatiye dariştin ku tête wateya bajarê 'Xudê dayî.' 'Bag' bi wateya Xweda ye (wekî bi zimanê rûsî ku ew jî zimanekî îndo-ewrûpî ye). Herdu heceyên ewil ên peyva 'Bagadata'yê têkildarî Xweda ne, heceya sêyem (data) têkildarî koka kurdî-îranî 'dan'ê ye ku bi vî awayî Bagadata/Baghdad dibe 'ciyê Xwedê dayî.' Tirkan jî peyva 'bag' wergirtiye nav zimanê xwe, lê belê wan bi şiklê 'bey' guhertiye bi wateya 'efendî' an jî 'mîr.' Helbet 'efendî' wateyeke yunanî ye.

Dema ereb hatine Kurdistan û Îranê, yekem hedefa wan belavkirina îslamê bû. Çendan çekên wan bêhêz bûn jî bi ser ketin. Heta niha, sirra serkeftina wan nehatiye peyda kirin. Zelalkirina vê pirsiyarê dê xizmetê li dîroka îslam û ya rojhilatê herduyan bike. Helbet gelek boçûnên kê m zêde tatmînker hene li ser pirsê 'çawa ereb li leşkerekî tewaw derheq hatin', lê belê heta îro çî raveyên rasteqîne nehatine kirin. Îro 1.2 milyar misilman hene li ser rûyê dinyayê.

Kurdan bergîrî li têketina misilmanan a bo Kurdistanê kir û herwiha li dijî dînê nû ye ku li ser wan dihat ferzkirin û ku tesîr li jiyana wan a civakî dikir jî têkoşîn. Mezintirîn serhildana kurdan bo 20 salan dewam kir bi pêşengiya Papak-i Xorrem (dîn) û di nivê yekem ê sedsala 9an PZ de pêk hat. Yek ji hedefên vê şoreşê, pêkanîna civakeke bêsinif bû ku di wê civakê de jin jî dê bibana xwedanê heman mafan ligel mêran. Kurdan di serhildanên gelên dîtir ên tepeserkirî de jî cî girt.

Bo nimûne wan piştgiriya eskerî da şoreşa koleyan (bi navê 'Şoreşa Reşikan' tête zanîn) li başûrê Iraqê. Vê têkoşînê ji 868an heta 883an PZ kêşa. Parastina kurdan li dijî hukmê ereb/îslamî bi sedsalan dewam kir.

Bêguman kurdan xwest li ser dînên kevnare û li ser dînên xwe yên sînkretîk bimînin. Heçî dînên kevnare ne, pîrraniya kurdan li ser dînê zerdeştî an jî mazdayiyê bûn. Em jixwe derbarê dînê zerdeştî de axaftin, derbarê 'baş' û 'bed' û sêyeya 'bi tenê baş bifikire, baş biaxive, baş tevbigere' de. Kurdên li bajarên, xwestin dînê zerdeştî berdewam bibe. Divêt bê zanîn ku dînê zerdeştîyê pêwîst dikir ku jiyana koçerî bê berdane. Dema dînê zerdeştîyê li Kurdistanê belav bû, beşeke mezin a kurdan dev ji jiyana koçerî berdane û xwe dane ser kar û xebatên kasibî û çandiniyê. Bi vî awayî du şeweyên jiyane pêk hatin li Kurdistanê: Yê yekem 'kurd' e ku wekî niv-koçer jiyana xwe bi nêçîr û xudankirina heywanan dibe serî; û yê duyem jî 'goran' e ku dêmanî ye û bi karên çandiniyê ve mijûl e, herwiha medenî ye û bi hewlên kulturî û rewşenbîrî re elaqedar e. Çê dibê ku peyva 'goran' ji 'Gewr-an' hatibe dariştin, navê ku ji peyrewên Zerdeştî re dihat kirin. Em dibînin ku Goran li Kurdistanê hergav mirovên bi felsefe, edebiyat û bilindkirina kultura kurd re elaqedar bûn. Ev tradîsyon heta îro jî hatiye. Niha jî, li Rojhilatê Kurdistanê ku qismen ser Îranê ve bûye, kurdên goran hene (nema li ser dînê zerdeştîyê ne lê li ser dînê 'ehl-î heq' in ku tête wateya 'xelkê Xwedê'). Peyrewên vî dînê zerdeştîyê hêj di sedsala 12an de hewl dan bi kurdî binivîsin, bi formeke taybet a kurdî bi navê 'goranî.' Li dû ehl-î heqan, dînên kurdan ên din, heta ew kurdên bûne misilman jî, bi şîrovekariya dînî ve mijûl bûn. Mirov dikare îddia bike ku kurdan hem bi rêka dînên xwe gelek tişt li kultura cîhanê zêde kirine, hem jî bi rêka bexşên xwe yên bo dînê îslamê.

Zana, rewanbêj û alimê misilman ê navdar Îmam Mihemed

el-Xazalî (1058-1111 PZ) destnîşan kiriye ku kultura îslamî li ser çar stûnan e. Wekî temsîlên wan stûnan navên çar zana-yan tîne. Sê ji wan kurd in: Şarezûrî, Amedî û Dînawerî. Ji ber girîngiya mezin a El-Xazalî bo îslamê bi giştî, nirxandin û hukmên wî wekî Magna Chartayekê ne ku pesnê bexşên kurdan ên bo kultura îslamî ya bilind dide.

Ligel vê, kurdan îslama kurd a nû û cuda li kultura îslamê bexşand. Çend terîqetên derwêşan hene wekî Neqşebendî-Xalidî, Qadirî, Nursî, Nimetullahî, ku ne meyldarên wateya zahirî ya Şerî'etê (qanûna îslamî) ne bi awayê ku di demên îslamê yên destpêkê de qedere 1400 sal berê di teolojiya skolas- tîk de hatibû diyar kirin.

Bi rêka şîrovekirinan, an jî îçtihadê, bi alîkariya me'rifetê (gnosîs), felsefeyê û rewanbêjiyê wan terîqetên derwêşan tim hewl dan tişteki nû peyda bikin di nav cûzî û paragrafên Qur'an û sunnetê de. Wan xwest şîroveyên nû peyda bikin da ku têkiliyên mirovan û jiyana civakî hêsantir bikin bo gelî. Heta îro terîqetên derwêşan hene li Kurdistanê û heta derece-yeke girîng hindêk rêk û aliyan li ber dîne îslamê datînin. Destberdana ji dinyayê û sofiyatiya di van terîqetên derwêşan de ihtîmaleke mezin ji Bûdayiyê tê. Navdartirîn terîqetên der- wêşan ên kurdan, ya Şêx Ebdul Qadirê Geylaniyê bi navê Xews e (1077/8-1166), dîsa ya Mewlana Xalid e (1776/7-1827), û ya Şêx Marifê Node(h)yî ye (1753-1838).

Tiştê balkêş sebare bi kurdan ew e ku wan kariye têgehên xwe yên berî dagîrkariya îslamê biparêzin. Kurd her karibûne dînen sînkretîk pêk bînin û di her rewşeke pêkanîna dîneke sînkretîk de, ew dîn digihiştine qonax û wateyên ji jêr-wate- yên parçeyên xwe wêdetir, ku ev yek sebebê serkeftina kurdan a kulturî ye.

Zehmet e ku mirov behsa tişteki bike û daxwaza materya- lan bike dema ku ew materyal bo herkesî qasî hev naskirî ne-

bin. Lewma ez dê nimûneyeke din bidim. Me jixwe dîneki sînkretîk şibande desteyeke kulîlkan. Em dikarin komeke muzîkê jî bişibîninê. Her kesek amûrê xwe lêdide, bes ew bi hev re tiştêkî nû diafirînin.

An jî bila koleksiyoneke keviran be. Li gorî danîna keviran, divêt guhaztinên di navbera wan de cuda cuda bêne dîzaynkirin û pêdivî bi hewleke mezîna heye heta ku hemî tişt bi rêk û pêkî lê têt. Ahenga tevahiyê û mesaja wê dê ji aliyê kevîrên gir û mezîna ve bi nisbeta ciyên vala diyar bibe. Cudayiyên heyî û parastî ji bo diyarkirina ahenga tevahiyê qasî lêhatin û bicîbûna beşan şert e, û ev serkeftina girîng a kultura kurdî û herwiha taybetiya wê ya sereke ye.

Bi ya min meyla ser sînkretîzmê taybetiyeye xweser a kultura kurdî ye. Mirov bi zimanê polîtîk dikare bibêje ku kultura kurdî pluralîst e.

Civakek dibe plûralîstîk heke derfetê bide çend meyl û aliyên têra xwe ji hev cuda. Bo nimûne, heke li Almaniyayê aliyên polîtîk ên cuda bigihîne hev da koalîsyonekê an jî hukûmetekê ava bikin, ew wekî mesela SPD, FDP hwd ji hev tên nasîn. Her yek ji wan xwedanê taybetiyên xwe ye, bes heke ew hemî li ser bernameyekê li hev bînin, hingî ew tiştêkî nû diafirînin, mn. yasayekê ku ne eynî ye ligel tu take fikreke polîtîk.

Pirsa hanê dimîne ku belê çima kultura kurdan a sînkretîk û plûralîzm û toleransa wê nakeve pêş di polîtîkaya kurdan de. Em nikarin niha bi hûrgilî bi vê pirsê dakevin, ji ber ku divêt em di nav çarçoveyê cuda de, di çarçoveya 'reel-polîtîkayê' de lê bikolin. Ligel vê jî ez îddia dikim ku -herçend partiyên kurdan ên xwîniyên hev hebin niha û sedsala 20an ku ji bo kurdan bûye sedsaleke qetîn û giriyê û li ber çavan be jî- ew hemî kesên ku dibêjin duberî taybetiyeye kurdan e, derbarê kurdan de pirr kêmbûnê dizanin.

Di dawiya vê sedsalê de min dil lê ye bi awayekî pozîtîf û



konstruktîv bipirsim bê ka kîjan taybetîyan kiriye ku kurd hêj jî cî bidine dînen kevnare ku li ciyên din ji mêj ve ji beyn çûbûn; û çî pêşmerc li bal kurdan hebûye ku wan qismen pê çêbû wan dînan biparêzin û dînen xwe yên sînkretîk pêş bêxin?

Bo çî ew çend dînen kevnare û dînen sînkretîk ên kurdan karibûn li Kurdistanê bimînin ligel ku dagîrkariya îslamê li kar bû jî? Û çîma ji aliyê gelên cîran ve nehatine parastin ku hema bêje bi tevahî îslam helgirtin? Bes yek bersiva me heye bo vê pirsîyarê. Ji ber ku meyla wekhevîyê heye li cem kurdan. Ev yek bi xwe mumkun dike ku çend fikrên cuda yên li kar, bi hev re hebin û nerihetî û aloziya ji wê bête helkirin, bi kurtî xelata toleransê. Cihêrengiya kurdan divêt bête nasîn, bête xwedankirin û parastin. Ev cihêrengî û çeşîddarî, kilîla jiyaneke bi rûmet û wekhev e bo kurdan.

Li dilê Kurdistanê, li *Kangawarê*, perestgeha Anahita (xwedawenda pakî, baran û avê) heye; gelek dêrên xirîstîyanan hene dîsa li Kurdistanê, gewre malbendê êzdî ê pîroz (li Lalişê) heye, peristgehên cihûyan hene, û hêj gelek cemên elewî, kakeyî, şebek, û sarayîyan hene. Ev hemî, bi hezaran salan e ku hene, herçend carinan 'bi tenê' bo çend sedsalan bûne jî. Çîma reqîb û muxalifên siyasî yên di nav ereb û farisan de (û Bahauallahê pêxemberê bahaiyan jî) direviya Kurdistanê? Bahauallah du salan li Kurdistanê jiya, ji 1854an heta 1855an dema ku li her derê li dû wî bûn, û wî dê bikariya di tevahiya jiyana xwe ya mayî de jî li wir bi aramî bijiya heke ji bo belavkirina dîne xwe bi rê neketiba. Çîma hevkarekî Seddam Huseyîn ê nêzîk, ku bi salan di bin hukmê Seddam de qetla kurdan kiribû, Seddam terikand û pena bire Kurdistanê? Xwe dijminên kurdan jî tene Kurdistanê ji ber ku mahneya hêviya wan heye ku ew dê starekê peyda bikin. Ew pê dizanin ku 'edetê kurdan e ku dijminê xwe bibexşin, dema ew dijmin mîna mêvan tene malên wan. Kurd, tekane millet e li Rojhilata Nêzîk ku reqsa

xwe ya 'edetî, reşbelek, parastiye, ligel ku bûne hedefa rexneyên fanatîkên gelên cîran ku dibêjin kurd bêexlaq in ji ber ku mêr û jin bi hev re direqisin di reşbelekê de. Çawa çêdibe ku jina kurd ne neçar bû desmalê bavêje serê xwe li wan herêmên ku tu hêz û tesîra şelanderan lê nebû? Jina kurd dikarî bi mêran re bixebite jî li nav zeviyan, ku îro jî dikare. Û çawa çêdibe hindêk jinan dikarî çekan jî hilgirin û bigihine payeyên pêşengiyê ligel ku jinên li welatên cîranên wan bêpar bûn ji van tiştan? Çawa çêdibe ku jineke wekî Kara Fatmayê pêşengî kir li leşkerekî mêran ku ewrûpayiyan, anku çapemeniya Almanya û rojhilatê di sedsala 19an de, hejmarek weşan kirin li ser wê? Belam jinên wekî wê ne tenê di sedsala dawî (sedsala 19an) de hebûn. Panzdeh sal berê, di salên 1980an de, jineke kurd a bi navê Xeco Yaşarê pêşengiya komeke pêşmergeyan kir, û bi wan re jiya li çiyayên Kurdistanê. Paşî, rabû çû Parîsê û tezeke doktorayê nivîsî li zanîngeha Sorbonneya. Çawa çêbû ku Mucahîdiyan (tevgereke muxalîf a faris) jineke kurd kirin fermandarê hêzên xwe yê eskerî?

Hêjayî behs e ku kurdekî bi navê Qasim Emîn (1865-1908) ku dora salên 1900an ji bo mafên jinan têkoşiya li Misra konservatîf, navê Muharrir el-Mar'ah (azadkerê jinan) lê hatibû kirin. Qasim Emîn ne tekane kurd bû ku ji bo mafên jinan têdikoşiya. Gava ku Qasim Emîn derheqê 'Azadiya Jinan' (1899) û 'Jina Nû' (1906) dinivîsî, alimê ereb-misilman Mehmûd Şukrî el-Alusî (1857-1924), kitêbek nivîsî li Bexdayê, li ser ka çawa jinan ji mekteban dûr bigirin, da ku li malên xwe rûnin û 'nekarin nameyan binivîsin ji mirovên xerîb re.' Navê kitêba xwe danî "*El-Issaba fi Man' el-Nisa en el-Kitaba*" (teşebuseke bi mebesta astengkirina rêyan da ku jin nikaribin binivîsin).

Hêjayî behskirinê ye ku hindêk nîşane hene ku civaka kurd di demên kevn de bi huqûqa dayikî hatiye rêvebirin, lewre rast e ku xwe îro jî, ne tenê di folklor û mîtolojiya kurdan de

belkî di jiyana rojane de jî jinê pirrî caran desthilatiyeke xurtir û statuyeye baştir heye ji mêr. Îro li Kurdistanê zarokên xweşdivî, navên dayikên xwe hildigirin, ne yên bavên xwe. Ev yek dikare wekî nîşaneke wê yekê bête dîtin ku di serdemên pêş-îslamî de ciyê jinê gelekî girîngtir bûye di nav kurdan de ji yê ku tê bawerkirin. Li Xwedawenda Anahîta û gewre perestgeha wê ya Li Kangawarê li Rojhilatê Kurdistanê bifikirin ku bermayên wê îro jî diyar in.

Dema îraniyan li dijî Şah serî hildan û piştî Xomeyniyê tundrew ê şî'e û 'komara wî ya îslamî' girtin, kurd ku li dora pêşengê xwe yê rewşenbîrê misilman Îzedîn Huseynî dicivîyan, tekane kom bûn ku muxalefet dikirin û ji bo avakirina Komara Demokratîk a Îranê -bêhude- israr dikirin. Ji ber wê hindê heta îro jî terora dewletê, hem li Îranê hem jî li derve, daye dû wan. Ev hemî bi zelalî nîşan didin ku kurd ne tenê bi zimanekî cuda diaxivin lê ew ji ber cihêrengiya kultura xwe ya giştî jî cuda dibin ji milletên cîran. Jiyana ji aliyê sîtemkar û dagîrkerên wan ve li wan hatibû û hatiye ferzkirin, bi sedsalan e, ji cerga hatina îslamê ve, gelek qurbanî dane ber xwe. Îslam wekî şûşeyeke bi şiklê qûbbeyê hate ser herêmê, ku di bin wê de, wekî ku berê jî hate gotin, kurdan bi xurtî û israr kir ji bo parastina 'edetên xwe.

Rastiyeke dîrokî ye ku fermandarên kurdan an jî şêxên kurdan ku hem serokên dînî hem jî yên siyasî bûn, sebarek bi meyl û aîdiyetên dînî yên eşîrên xwe û erdê ku hukm lê dikirin, ji berê ve bi toleranstir bûn; ya rast bi toleranstir bûn ji fermandarên ku ereb, faris û tirkên cîran rêvedibirin. Mînakek hukûmeta kurdan e ku piştî Şerê Yekem ê Cîhanê di bin mandaya Brîtanyayê de li başûrê Kurdistanê hatibû avakirin. Şêx Mehmûdê (1882-1956) pêşengê dînî yê kurd ê navdar, bi resmî hatibû tayînkirin bo Serokatiya Kurdistanê. Paşî bi Qraltiya Kurdistanê hatibû tackirin. Ev dewleta kurdan qedere pênc

salan berdewam bû (1919-1924). Di hengava wan salan de tu kes nehat îdamkirin, îşkence li tu kesî nehat kirin, tu jinek nehate recmkirin ji ber zînayê wekî ku îro berbelav e li Îran û Suudî Erebiştanê, tu dizekî dest lê nehate birîn û ferq û cudayî li tu kêmareke dînî nehate kirin. Heman awayê jiyana cemawerî serdest bû di dema Komara Kurdistanê (1946) di bin fermanê Serok Qazî Mihemed (1893-1947) de jî ku ew fermandarekî misilman ê navdar bû. Şêx Mehmûd û Qazî Mihemed du pêşengên kurd ên tradîsyonel bûn ku bi kultur û edebeke kurdewarî mezin bûbûn.

Bênizamî û şerên navxweyî yên di navbera partî/siyasîyên kurdan de heta radeyeke bilind encamên karîgeriya tirk-tûranî, ereb-baasî, faris-şahînsahî-xomeynî ne li ser sîstema perwerdeya kurdan ku bi rêka saziyên dewletî xwe li ser kurdan ferz kirine di pîrriya sedsala 20an de.

Ka em vegerine sedsala heftan, dema hatina îslamê. Piştî ku îslam li Kurdistanê belav bûbû, herçend ne ewqas bi temamî, tiştêkî neasayî qewimî. Hejmareke zor a kurdan, hemî jî rewşenbîr, dest pê kirin xizmetê li kultura îslamî ya nû bikin, heta ji vê wêdetir, xwe bi cegerdarî dane dewlemendkirina kulturên îslamiya ereb û îslamiya faris. Ev elaqe hindêkî bi derengî pêk hat bes rasteqîne bû. Paşî, piştî ku tirk hatine herêmê û -bi temamî berevajî kurdan- tavilê îslam helgirtin, kurdan vê carê jî xizmet li kultura îslamî ya osmanî kir.

Rewşenbîr û hizirvanên girîng ên kurd xizmet li zimanên erebî, farisî û tirkî jî kirine, û berhemên girîng nivîsandine bi van zimanan. Wan zimanê xwe kurdî îhmal û feramoş dikirin ku ew hemî belgekirî ne, bo nimûne di Ferhenga Împaratoriya Osmanî 'Qamus ul-Aalam' de ku ji layê Şemseddîn Samî ve di sedsala 19an de hatiye nivîsîn û di 1314 hîcrî /1896-7 de hatiye weşandin, dibêje: 'Aya ne ecêb e kurdan ewqas zana hene, bes bi zimanê xwe nanivîsin. Ew xwe didine erebî û farisî-

yê. Çima wesa ye?' Û çima di dîroka kurd de bûye taybetiye-ke diyar, ku kurd kê mguh didin xwe?

Niha ez vegerime serê teblîxa xwe dema ku min gotî ku Kurdistan herêmek e ku maye di bin tesîra gelek medeniyetan de. Bo nimûne yewnanî gelek caran di nava halê şerî de bûn ligel Împaratoriye Axamenî û Sasanî. Îcar ew bi hejmarên mezin li Kurdistanê bi cî dibûn û bi sedsalan li wir diman.

Ihtîmal e gelê Kurdistanê têkel bûbe ligel yewnaniyan, û peyvên zimanê yewnanî jî helgirtibin. Yek ji balkêştirîn peyvên qedîmî yên yewnanî, peyva 'mitra' ye (bandaja eniyê, kûmê metranî) ku bi forma 'mezer' hatiye di kurdî de, bi wateya 'şaşika misilmanan ku bo mizgeftê serê xwe pê dipêçin.' Berê, alimên kurdan şaşıkeke dîtir a taybet bi navê 'mezer' didane serê xwe. Xwe îro jî me çiya û gundine hene li Kurdistanê ku navên yewnanî lê ne.

Kurdan zanîngeheke navdar hebû li navçeyeke bi navê Herranê ku bermayên wê heta îro jî dimînin nêzîkî Urfayê li Bakurê Kurdistanê. Di destpêka serdema îslamî de zanîngeha Herranê navendeke zanistê bû li Rojhilatê. Hevalên me yên ereb ên li vir muheqqeq Herran bihîstine ji ber ku ligel zana û huqûqnasê misilman Ibnî Teymiye, gewre filozofên ereb ên wekî Farabî jî li wir xwendine. Îro Herran kavil e, du kîlometir dûr e bo Urfayê li Bakurê Kurdistanê. Gelek zanayên girîng ên rojhilatê xwendekar bûn li Herranê. Bi xêra kurdên hingî, kultura yewnanan hate wergerandin bo erebî û farisî. Kultura rojava û kultura îslamê bo yekem car li Kurdistanê hatine ba hev. Divêt ji bîr nebe ku Urfa (Ruha), landika kultura xirîstîyanî jî bû.

Kurdan ne tenê layê kulturî ve xizmet li cîranên xwe bi taybetî ereb, faris û tirkan kir, belkî wekî esker jî xizmetguzar bûne. Dema xaçperestan êriş birine ser 'erdê pîroz' Felestînê, hukimdarê kurd Selaheddîn (1137-1193), bi leşkerê xwe yê kurd

meşiya Felestînê û xaçperest têkbirin. Ligel gelek ziyaneke zêde jî, wî pê çêbû bigihe serfiraziyê. Selaheddînî bed-reftarî nekir ne li ereban ne jî li ewrûpiyan û ji ber vê hindê Selaheddîn û gelê kurd cihê xwe di dîroka cîhanê de girtin. Di dîrokê de heye ku dema Selaheddîn çû Şamê şexsiyetekî ereb wiha xêrhatin li wî kir: 'Xweda, şikir bo te ku bi xêra kurdekî dewleta xaçperestan serşor û dînê pêxemberê ereb hêzdar bû.' Paşî got: 'Em zor pê kêfxweş in ku birayekî kurd dibe xwedanê welatê me ne yekî biyanî.' Selaheddîn wiha bersiv dayê: 'Ez ne ji bo xwedantiyê, lê bo xizmetkirinê hatim.' Dema Selaheddîn di 1189an de yekem nexweşxane ava kir li Misrê, wî navê wê danî 'bîmaristan' ku bi kurdî ye û tete wateya 'ciyê ji bo nexweşan.' Îro misrî hêj jî dibêjine wê nexweşxaneyê kevnare 'bîmaristan', her wekî bo hemû nexweşxanan dibêjin 'bîmaristan.'

Ne tenê Felestîn û Misr, lê Sûriye û Ûrdûn jî heta îro şahidên rabirdûya kurdan a şikûdar in ku hingî bi vê yekê dihesin dema li abîdeyên kevnare yên ku bo wan wekî xizîneyan in vedigerin. Ger em yên binavkirina tenê du mînakên qudreta kurdan a di rabirdûyê de bin, li Sûriyeyê bermayên keleheke bi navê 'Keleha Kurdan' (Hosn el-Ekrad) heye ku bo demekê hêzdar bûye û li Ûrdûnê dîsa bermayên 'Keleha Salt- û Aclûn' hene.

Min divê detayeke dîtir a balkêş lê zêde bikim derbarê bexş û îlaweyên kurdan ên bo kultura Rojhilata Nêzîk de. Vê carê, dewlemendkirineke pêşîn a kultura îslamî ya ereb e. Dema misilman hatine Îranê ku kurd û îraniyên din lê bi cî û war bûn, îslam bû dînê resmî, bû dînê dewletê û erebî jî bû navgî-nê ragihandinê hem di mesele û têkiliyên dînî û hem jî yên dunyawî de. Belam li wir danûstandineke kulturî jî hebû sebarret bi zimên. Ereban birrek peyv helgirtin ji kurdî, bi taybetî têrmên teknîkî, wekî bo nimûne qelem, berîd (xizmeta postê), fen (huner), hendese (geometrî). Min di Gulan 21ê 1994an de

li Kolnê, bi zimanê erebî teblîxeke bi detay pêşkeş kir derbarê wê meseleyê de. Ew axaftin (teblîx) ji bo gelek alimên misilman ên çar aliyên dinyayê hatibû kirin. Teblîx, îsal (1997) hate weşandin bi sernavê 'Kurdên tepeserkirî û birayên wan ên misilman.' Qe nebe hindêk ferheng û ferhengên ansîklopedîk, bo nimûne Ferhenga Firûzabadî ya navdar, dibêjin ku peyvên di zimanê erebî de ji bo qelem, huner, geometrî, xizmeta postê, defter peyvên biyanî ne di zimanê erebî de. Mixabin ne çî û dema wê ye ku em bikevine nav detayên etîmolojiya van peyvan.

Xebîneteke mezin e ku serfiraziyên kurdan ên kulturî û îlaweyên wan ên li mîrata rabirdûya cîhanê, daîmî hatine feramoşkirin û kêmbuhakirin, bi taybetî dema mirov li dema pêşîslamê difikire, û herwiha ne ji wê kêmtir di dema li dû dagîrkariya ereb-îslamî de.

Mirov dikare ewqas tiştî jî ji bo muzîka kurdî bibêje. Rîtim û pîvanên xweserî muzîka kurdî hene. Muzîknas dikarin sebebên vê yekê diyar bikin û rave bikin. Tiştê ku ez dikarim ji we re bibêjim, hindêk agahiyên dîrokî ne. Muzîk di sirûşa kurdan de xwedanê ciyekî ewqas peyt e ku bêguman ji demên mêjeyî ve her ligel kurdan bûye.

Muzîka kurdî di sedsalên 8 û 9an de gelekî populer lêhat di qesrên Bexdayê yê hukûmdarên erebên misilman de, ihtîmaleke mezin bi xêra bestekar û stranbêjê kurd Ishak Muslî (767-850 PZ). Hindêk têrm hene ku ji aliyê muzîkarên ereb ve têne bikaranîn, bo nimûne '*Rast Kurdan*' (wate 'Kilîla Kurdan') û têrmên din ên wekî '*Watar el-Kurdan*' (wate 'têla ûda kurdan') û '*Kar-Kurd*' û '*Beyatî-Kurd*.' Ew ketine nav zimanê erebî û şahidiyê li orijîna xwe ya kurdî dikin. Bêşik e ku muzîka kurdî heta îro muzîka rojhilatê dewlemend kiriye. Muzîkar, stranbêj û bestekarên kurd ên ku muzîka gelên cîran bi rêk û xêra muzîka kurdî dewlemend kirine bêhejmar in. Rehîm Mo-

enî Kirmaşanî ji nav farisan, Nazim Xezalî ji nav ereban, û Îbrahîm Tatlises û Îzet Altinmeşe ji nav tirkan bi tenê çend mînak in. Divêt bête diyarkirin dewletên ku kurd parçe kirine û hukmî li Kurdistanê dikin, heyîn û elementên kultura kurdan hilgirtine. Carinan bi rêbazên gelekî prîmîtîf ev yek kirine, bo nimûne 'bi rêka yasayan.' Sûriye, cejna kurdan a neteweyî Newrozê (cejna sala nû) di Adar 21ê de wekî 'cejna daran' pîroz dike. Tirkiyeya ku ji cerga avabûna xwe di 1923/24 ve cezayên giran dane pîrozkirina cejna Newrozê, hema çend salên berê beyan kir ku 'Nevruz', 'cejneke kevn a tirkan e', û rengên kurdan ên neteweyî kesk û sor û zer ku bi salan bû qedexe bûn, nişkî ve wekî rengên nêrîtî yên tirkan qîmetdar bûn. Binêrin ewende hêsan e.

Niha em dîsa vegerine dema dagîrkariya ereb-îslamî. Ev yek rastiyeke ku di sedsalên li dû dagîrkirina bi zordarî ya ereb-misilmanan de ku pişt re versiyona fars-misilman û ligel yeke tirk-misilmanan jî da pey, kurdan dev ji ziman û kultura xwe ya rêk û pêk bernedan, ligel ku di xuyanê de û bi eşkereyî xwe didane ser endîşe û entereseyên kulturî yên xelkên cîran, wate ereb û farisên hingî.

Qederê 700 sal berê (di sedsala 13an de), gelekî dîtir ê etnîk hate herêmê, dema ku zincîreya eşîrên moxol a bédûmahîk, ligel eşîrên tirk û tirkmenan ji Asyaya Navîn meşiyane nava herêmê û çûn heta digihe ciyê ku îro jê re Asyaya Biçûk tête gotin. Wan dagîrkerên nû di sala 1258an de pê çêbûn Xelîfeyê îslamê dabiêxin li Bexdayê ku heta wê demê di destê ereban de bû.

Malûm e kurdan jî ber xwe dan li hemberî dagîrkerên nû. Wan hewl da mîrîtîyên serwer ava bikin. Dema wan pê çêbû, helbet vê carê jî hewl dan ku wan biparêzin. Hingê, tu dewletên modern nebûn bes mîrîtî hebûn ku ew jî awayekî hukmê serwer bû. Ne tenê li Kurdistanê wiha bû, li Rojhilatê giştî wi-



ha bû. Kurdan jî çend mîrîtî hebûn. Yên herî bi hêz Hesnewiyên ku di 959an de PZ hatibûne avakirin, û Dostkî (990-1096 PZ) bûn ku li Kurdistana Navîn cîwar bûn û têkiliyên dîplomatik danîbûn ligel Basiliusê II. ê Împaratorê Bîzansê (957-1025).

Dema di 1258an de Xelîfetiya îslamê hate daxistin ji aliyê dagîrkerên tirko-moxol ve û nûhatiyên hêz bi dest xist, wan ne tenê ew hêz di destê xwe de girt lê firehtir û zêdetir jî kir, ji ber ku wan tavilê baweriya îslamê hilgirt, mezhebê îslamê yê ku Xelîfeyê Bexdayê temsîl dikir, bi gotina tekûztir mezhebê sunnî. Ev destpêka xanedana biçûk a sunnî-îslamî bû li Asyaya Biçûk, xanedana ji malbateke tirk ku navê serokê wan Osman bû. Vê xanedanê, Împaratoriya Osmanî ava kir ku di 1299an de bi şiklê mîrîtiyekê dest pê kir û di 1923/24an de bi yekcarî tewaw bû.

Serê ewil, sê mezheb hebûn di îslamê de: Sunnî, şî'e, û xaricî. Îro xaricî ne ewqasî girîng in. Bi tenê hejmareke kêr ji wan mane li Afrîqaya Bakur. Sunnî û şî'e dimînin ku ji wan niha sedî 85 sunnî û nêzîkî sedî 15 jî şî'e hene. Wekî ku hatî amajekirin, dema Osman û eşîra wî mezhebê sunnî helgirtin, ev mezheb bû mezhebê resmî yê Împaratoriya Osmanî (1299-1923/24). Li Îranê, safewiyan (1501/1502-1736) ku mîrîtiyêke fireh û mezin a ji pirranî faris û azeriyan pêk dihat, mezhebê şî'e helgirtin. Ew destpêka hukmê safewiyan bû di sedsala 16an de. Desthilatiya safewiyan xurtî li faris û azeriyên li bin hukmê xwe kir da bibin şî'e ku serê ewil pirraniya wan Sunnî bûn. Dema şerên dînî yên di navbera osmaniyên sunnî û şî'eyên safewî de, kurdan aliyê osmaniyan digirt. Ligel wê, serdemeke yekcar nû dest pê kir bo kurdan. Berî wê (û berî dagîrkariya ereb-misilman), kurd bi tenê ligel faris û îraniyên dîtir ên wekî belûcî di têkiliya nêzîk de bûn. Axir rihên kurdan ên kulturî gelek pitir nêzîkî faris û belûciyan bûn ji nûhatiyên

herêmê, wate ereb û tirkan. Hindek herêmên bi giranî farisnişîn, di heman demê de warên gelek eşîrên kurdan jî bûn. Ji ber vê hindê, kurdan gelek caran aliyê eşîrên faris digirt dema ku şer çêdibûn li dijî dagîrkeran.

Ev rewş bi tamamî guherî dema ku heft sedsal piştî dagîrkariya ereb-misilmanan û pênc sedsal piştî dagîrkariya moxoltirkan, safewiyan dest avête yek cure 'polîtîkaya hêzê' ya bi rengekî dînî li dijî kurdan ku bi helkefta wê polîtîkayê qetla kurdan kirin. Dema di 1514an de şerekî dîtir ê pirr mezin qewimî di navbera osmanî û safewiyan de, kurdan aliyê safewî û farisan negirt. Berevajî, hevalbendiyê kurd-tirkan; têkçûna safewiyan anî. Şerê Çaldiranê yê diyarker, mêjûyê girîng tê-te hesibandin di dîroka cîhanê de.

Bi vê helkeftê min divêt zelal bikim ku naskirina Îranê bes bi farisan re, ne rast e. Faris bi tenê parçeyê Îranê ne. Îran gelekî mezin û cihêreng e. Mirov dikare têkiliya faris, kurd, belûcî û azeriyan a ligel Îranê muqayese bike ligel têkiliya alman, fransî an jî ingilîzan a ligel Ewrûpayê. Kurd îranî ne. 'Her çi ciyê kurdek lê, Îran e' gotiyê pisporekî rojhilatê yê Ewrûpayî di sedsala 19an de piştî ku bi çavên serê xwe rojhilat dîtî. Peyva Îran bi 'eslê xwe ji 'Bum-i Aryanam' tê ku bi wateya 'erdê Aryanana' e. Di zimanên qedîm ên Îranê de peyva 'Îran' nebû, lê 'Eran' hebû ku kurd îro hêj jî nabêjinê 'Îran' (faris dibêjinê) lê dibêjinê 'Eran.' Ev yek dêrîniya zimanê kurdî nîşan dide. Kurd îranî ne, bes ne faris in, û faris jî ne kurd in, ligel ku herdu jî -wekî îranîyên din (belûcî, tacîk, patan, ossetî)-xwedanê kultureke muşterek a îranî ne. Mîna fransiyan, û ingilîzan, hemîyan taybetiyên xwe hene, mîna kulturên xwe, bes hemî parçeyên Ewrûpayê ne û kultura Ewrûpayî par dikin. Heman tişt sebareî bi kultura Îranî jî heye ku ji Asyaya Navîn dirêj dibe heta Zerya Spî û aliyê başûr jî heta Kendava ereb an jî kurd-faris. Li aliyêkî vê kendavê ereb hene lewma dibêjinê

'Kendava Ereb', û li aliyê dîtir jî faris hene, belam îro jî herwekî di rabirdûyê de eşîrên kurd dijîn li aliyê din ê Kendavê. Ji ber vê hindê, bi egera tekûziyê, heke nebêjinê 'Kendava Îranê' divêt ji wî aliyê kendavê re bibêjin 'Kendava Kurd-Faris.' Ji ber vê sebebê ye ku navê welêt hate guhertin, 'Persia' kirin 'Îran.' 'Îran' bêhtir hewîner e.

Bi kurtahî, dagîrkeriya erebên ku di sedsala heftan de PZ îslam anîne Kurdistan û Îranê, rûdaneke mezin bû di dîroka kurdan de. Rûdana dîtir a mezin dagîrkeriya hozên tirkan a ji bakur bû ku bû sebebê daketina Xelîfeyê li Bexdayê. Împaratoriya Osmaniyan bi şiklê mîrîtiyeke biçûk dest pê kir ku Osmanê danerê xanedanê wekî serokê xwe hîlbijartibûn. Kurdan jî mîrîtî û xanedanên xwe yên serbixwe hebûn ku bi awayên cihê digihîştine pîrraniya eşîrên kurdan. Heman tişt di nav farisan de jî hebû. Dilsozî û têkiliyên polîtîk hingî jî qasî îro pîralî bûn, bes helbet bi gelek awayan cuda ji yên îro.

Niha em dîsa biçine 1514an ku mējûyeke girîng e di dîroka kurdan de. Wê salê, tirkên osmanî (ku sunnî bûn) hevalbendiyek çêkirin ligel kurdên sunnî li dijî farisan. Cînegirtina kurdan a li aliyê farisan, encama polîtîkayeke herî şêtane ya safewiyên wê hingê bû. Li ser navê mezhebê xwe, gelekî bi eşkereyî qetlîam kirin li Kurdistanê. Şî'ebûna xwe pîrr mezin dikirin, heta dereceya şî'etiya fanatîk. Bi hezaran hatin kuştin. Hingî, kurd li aliyê tirkan bûn li dijî Safewiyên faris. Wan Tebrîza paytexta safewiyan jî vegirtin bo demekê, bes helbet paşî vekîşiyên. Li dû wê, hevalbendiyê eskerî ma di navbera tirk û kurdan de. Îttîfaqeke bi wî rengî berê pêk nehatibû, û niha yet werar bû şiklekî gewretir, wate Împaratoriya Osmaniyan. Ne rast e ku bibêjin Împaratoriya Osmaniyan ji aliyê tirkan ve hatiye avakirin. Mîrîtiyên kurdan serçaveya sereke bûn sebarret bi herêma hukm lê dihat kirin û pêdiviya hevkarîyê. Heke kurdan li hev nekiriba bi osmaniyan re bo şerê li dijî safewi-

yan, safewiyan dê hukmê rêvebirinê bi dest bixista. Avabûna Împaratoriya Osmaniyan li ser bingeha vê soza ji kurdan re bû ku Sultanê Osmanî dê rêz li serxwebûna navxweyî ya mîrîtiyên kurdan bigirta. Peyman hatin girêdan bes tirkên osmanî rîayet lê nekirin.<sup>3</sup>

Zêde pê ve neçû ku polîtîkayên êrîşkarane ekspansîonîst (firehxwaz) ên tirkên osmanî eşkere bûn. Du sal piştî yekgirtina mîrîtiyên Osmanî û kurdan (1516-1517), Sultanê Osmanî Selimê I. Sûriye û Misr li erdê xwe zêde kirin. Di sala 1517an de wî ne tenê bi fêlbazî Xelîfetî ji ereban stand, lê berê leşkerê xwe da Ewrûpayê da şerê milletên cîran ên xirîstiyanan ku yewnanî, bulgarî û awusturî bikin ku ew hemî wekî 'xwedênenas' dihatin dîtin. Welatên wan hatibûn dagîrkin. Divêt bête diyarkirin ku osmaniyan hêj gelekî berê di sala 1453an de Konstantînopola paytexta Bîzansê vegirtibûn. Helbet qesta me Istanbul e. Peyva Istanbul formeke xerabkirî yê navê orijînal a Constantinople ku paytexta Bîzansiyan bû. Di sedsala şanzdehan de Sultaniya Osmanî-Tirk hemî welatên ereban daxilî erdê xwe kirin. Di 1639an de, piçek zêdeyî sedsalekê piştî şerê Çaldiranê, Osmaniyan ligel dijminên qedîmî li hev kirin ku Kurdistanê li ser kaxez dabeş bikin.

Di navbera 1839 û 1859an de, osmaniyan rêzeke fermanan bi navê 'tanzimat' (fermanên reforman) weşandin û dest pê kirin sîstema kurdan a aborî û civakî ya kelepûrî hilweşînin. Li Kurdistanê erdê bo çandiniyê millî/mîrî kirin, ku heta hingî ne aîdê malbat an jî şexsan bû, bêtir aîdê tevahiya eşîran bû an jî malê çend gundên li rex hev bû. Çandin û çinîn bi cemawe-

3 Nameyek ji Sultanê Tirk bo Idrîs-î Bidlîsî, hatiye weşandin di kitêba '*Tacul-Tevarih*', çapa 2. 1279/80, Stenbol, rp. 332, hatiye nivîsîn ji aliyê Khuje (Xoce) Sedettin (1537-1599). Di vê nameyê de Sultan pesnê Idrîs-î Bidlîsî dide, û behsa rêkirina diyariyan dike ji wî re. Idrîs-î Bedlîsî di kitêba xwe "Selîm-name" de dinivîse; Sultan Selîm tika kiriye, ku Bedlîsî di nava wî û şah û mîrên kurdan de bibe navgîn.

rî dihatin kirin. Ev yek hêj jî nêrîtek e li hindêk herêmên dût û çiyayî yên Kurdistanê. Zimanê kurdî ji bo vê mijarê jixwe têrmên resen hebûn hêj bi sedsalan berî ku komûnîzm û sosyalîzm li Ewrûpayê derbên, bo nimûne *Herewazî* (zibare) û navkoyî. Osmanîyan ew erd dane destê nûneran da ku îdare bikin. Piştî wextekî nûner bûn xwedan. Sinifeke feodal a ku ji derve dihate rêvebirin pêk hat ku ligel rêveberên Osmanî hevkarî dikirin li dijî xelkê xwe. Îro “gundparêz” tişteki mîna wê nêrîta kevin e.

Ligel destûrên tanzîmatê ku bi tenê li hindêk herêmên taybet û bi hin mercên diyar hatibûn fermanan, êrîşên din pêk hatin da ku hêz û desthilatiya serwerî an jî mîrên kurdan bibirrin, bo nimûne, hukmê kurdan ê lihevkerî û serbest bi terzekê hate guftugokirin û lêpîrsîn û dawiyê jî êrîşên eskerî lê hatin kirin. Di sedsala 19an de, li 1851an, tirkên osmanî karibûn mîrîtiyên dawî yên Kurdistanê birûxînin. Ya dawî Mîrîtiya Babanî bû. Rûxîna mîrîtiyên kurdan bi xêra sîleh û alîkariya teknîkî ya Prusyaya selefê Almaniyayê pêk hat. Navdartirîn fermandarê bejayî yê Prusyayî yê di xizmeta Sultanê Osmanî de, Helmuth von Moltke (1800-1891) bû ku pişt re bû mareşal li Prusyayê. Lê ew bes yek ji gelekên bû.

Kêm wextek piştî ku kurdan peyman girêdan ligel tirkan di 1515an de, ew pêhesiyên ku Selteneta Osmanîyan rêz li peymanê nagire.

Heke kurdan di 1515an de federasyoneke rasteqîne ava bikira ligel Selteneta Osmanîyan li dewsa girêdana rêzeke peyman û kontraktan, dê ew tengavî û şerpezetiya ku bi sedsalan dewam kir nebûya. Gelek raperînên herêmî pêk hatin li dijî Seltenetê. Lê belê, bi taybetî piştî ku tirkan û Prusyayê hevalbendiya xwe germ û xurt kirin, kurd bedbext bûn. Heke Prusyayê alî osmanîyan nekiriba, dibû ku kurdan bikariya peymanê ne nû girê bidin ligel tirkên osmanî, lewre kurdan jî hêzeke

eskerî hebû wê hingî. Bi tenê çend belge hene derbarê wê demê de. Belam çavkaniyeke nadîr heye ku ew bi eşkereyî diyar dike ku ihtîmal û bingeha peymaneke nû hebû di navbera serwerên kurd û tirkên osmanî de, helbet berî ku Prusya bibe hevalbend. Bo çî ew ihtîmal nebû rastî di dema krîtîk de, bila ev mesele niha bimîne.

Dewsa wê em li çavkaniyekê binêrin ku gelek agahiyan digihîne me derbarê kurdên hingî de, an ku di dîroka pêşîn a modern de.

Çar sedsal berê kitêbeke giranbiha bi navê *Şerefname* hate nivîsîn. Wateya *Şerefnameyê*, 'kitêba Şerefî' ye, û Şeref (1542/43-1603/4) ne tenê zanayekî girîng ê Bidlîsê bû, lê ew kurê serwer an jî mîrekî kurd jî bû. Bavê wî berî jidayikbûna Şeref reviyabû aliyê Îranê yê faris ji ber şerên berdewam ên li mîrîtiya wî li dijî Selteneta Osmaniyan. Lewma, Şeref li Qomê, hate dinyayê, li bajarê pîroz ê şî'eyan. Fêrî zimanê farisî bû û li qesra qralên safewiyan jiya. Dema pêhesiya ku safewiyan dil lê bû wî bi kar bînin ji bo dijayetiya gelê kurd, rabû vegeriya bajarê xwe Bidlîsê ku li wir di sala 1596/7an de kitêba xwe ya dîrokî bi zimanê farisî nivîsî. *Şerefname* berhemeke hêja ye li ser dîroka gelê kurd.

Zanyar û kurdologê rûsî N.J. Marr bê westan li ser wê berheme xebitî. Belam pê navdar nebû. Tiştê ku ew pê navdar bû dijminatîya Stalîn ya li hemberî wî bû. Stalîn çend gotar nivîsandin li dijî Marr derbarê zimannasiya giştî de.

Çima Stalîn li dijî Marr rabû derbarê mijarên zimannasiyê de? Ihtîmaleke pir mezin ji ber ku Marr pisporekî kurdan û herwiha dostê kurdan bû. Divêt bête zanîn ku Stalîn muxalîfê kurdan bû, heke ne bi yekcarî dijminê wan jî be. Stalin bû yê ku di sala 1927an de Komara Otonom a Kurdistanê an jî 'Kurdistan Sor' fesh kirî ku Lenîn ji kurdan re ava kiribû. Stalîn ew erdên kurdan li erdê Azerbaycanê zêde kirin û pişka pitir

ê nufûsa kurdan sirgûn kire Kazakistanê. Di hengava Şerê Du-  
yem ê Cîhanê de, Stalîn, ew kurdên ku li herêma ku berê jê re  
Komara Otonom a Kurdistanê dihat gotin mayî, sirgûn kirin.  
Stalîn carekê got ku ew di bin tesîra pozîtîf a Ataturk de ma-  
ye û herwiha ya Hitler jî (ku Hitler carekê gotibû ku Ataturk  
mamosteyê wî ye). Heçî polîtîkayên wî yên li ser kurdan in,  
Stalîn ji wan herduyan ne kêmtir bû.

Normal e ku tu qîmeta zanistî ya gotarên Stalîn yên li dijî  
Marr nebû. Wî nekarî argumanên Marr bêqîmet bike lewre  
Marr zimannasekî mezin û pisporekî kurdan ê herî zîrek bû.  
Dawî, divêt fikra wî ya derbarê *Şerefnameyê* de jî bête zanîn.  
Marr carekê got ku dîrokê kurd ji bîr kirine, bes heke *Şerefna-  
me* bi hişyarî bê vekolîn, ku di sed'sala şanzdehan de (bi du-  
rustî 1596/7) ji aliyê kurdekî ve hatiye nivîsîn, ew dê 'kêrî da-  
girtina valahiyê bêt.'<sup>4</sup> Ez, wekî şexsê xwe vê piştrast dikim. Ez  
jî bi kûr û dûr xebitîme li ser vê berhemê û îddîaya min ku Îm-  
paratoriya Osmanîyan li dû rêzeke peymanên ligel mîrîtiyên  
kurdan ên wê hingî hate avakirin, pişka pitir ji xebata min a li  
ser *Şerefnameyê* hatiye pê.

Di berhema xwe de Şerafeddîn Bidlîsî, sînorên Kurdistanê  
diyar dike. Rastiyeke wê demê ye ku hingî hemî hêz li gorî er-  
dî dihat cîbicîkirin. Hingî tu dewletên neteweyî nebûn. Dew-  
letên li ser esasê neteweyê, bi sînorên neteweyî, bes piştî Şo-  
reşa Fransî ya 1789an pêk hatin. Berê, tu sînorên neteweyî li  
Ewrûpayê jî nebûn. Belam 200 sal berî Şoreşa Fransî, kurdek  
rabû û behsa neteweya kurd kir ku ji eşîran pêk dihat, û sîno-  
rên neteweyî yên Kurdistanê jî wekî ji Kendava Faris-Kurd -ji  
Hormuzê- dirêj dibe heta Kafkasyayê, û ji wir heta digihe Zer-  
ya Spî, xêz kirin.

Şeref di 1596/7an de, bi awayekî zelal û bêşik hebûna hes-

4 ...Lêkolîneke tekûz a *Şerefnameyê* dê dagirtina valahiyê hêsantir bike.' *Sha-  
refname*, çapa bi rûsî. Moskowa 1963. rp. 615.

tiyariyeke neteweyî di nav kurdan de, xiste nav qeydan ku wê hestiyariyê, hesta basît a normalî û asayîbûnê têk biriye, û ku -eşkere ye- ew hestiyarî bo demeke pir dirêj e serdest e di nav kurdan de. Nexwe ew dê wekî kurd nehatibana naskirin. Min navê tu mînakên ji demên qedîm an jî ji dêrîniya yewnan û romanana bidim, lewre me raporteke kevn a ji aliyê ewrûpayiyekî heye derbarê kurdan de.

Marco Poloyê îtalî (1254-1324), ku wekî yekem 'seyahê cîhanî' navdar e, li Musilê li ser rêka xwe bo Çînê kurd nas kirin, û tiştên ku derbarê kurdan û Kurdistanê de fêr bûyî nivîsîn da ku hevçerxên xwe yên ewrûpayî ronî bike.

Kurdologa îtalî Mirella Galettiyê, ew nivîsên ku bo kurdî jî hatine wergerandin berhev kirin. Min Galetti di Tebaxa 1991an de nas kir bi helkefta civîneke Akademiya Kurd a Zanist û Hunerê li Viyanayê. Wê got ku ji bo têkiliyên pêştir ên kurd û îtaliyan lêkolîn kirine, bes bêçine bûne. Ew pê bawer e ku Marco Polo yekem ewrûpayî ye ku peyva Kurdistan telafuz kiriye. Lê belê berî wî rojhilatiyek hebûye, tirkekî bi navê Mahmûd Kaşgarî. Ew li Bexdayê jiya û li wê di 1073an de kitêbeke bi sernavê 'Diwan-i Lugat it-Turk' nivîsand, an ku 'kitêba peyvên tirkî.' Di nava vê kitêbê de ku di 1940an de li Enqereyê hatiye çapkirin, nexşeyeke bi erdekî mezin heye û tê de bi erebî 'Bilad el-Kurd' an ku 'erdê kurdan' nivîsiye. Dîsa kitêbeke din heye ji aliyê dîroknasê faris Hamdullah Mustawfi ve di 1339/40an de bi sernavê 'Nuzhet el-Qulub' (Gerra Dilî) hatiye nivîsîn. Di vê kitêbê de ew jî behsa Kurdistanê dike û diyar dike ku hingî Kurdistan li şanzdeh eyaletan hatibû dabeşkirin. Yek ji kevntirîn nexşeya Ewrûpayiyan a ku navê Kurdistanê tîne, di 1561an de li Romayê hatiye kêşan û ji aliyê 'A. Lafreri' ve hatiye îmzekirin û sernav lê 'La descrittione della prime part dell' Asia' ye.

Wekî encam vê jî bibêjim ku gotareke dirêj heye derbarê



Kurdistanê de her ligel sînorên wê yên di Ansîklopediya Osmanî-Tirk a navborî, 'Qamûs ûl Aalam" de.

Lewma Kurdistan ne îcada Karl May e (1842-1912), ne jî têrm bi tenê ji aliyê kurd û ingilîzan hatiye bikaranîn, wekî ku ne tenê hindêk fanatîkên tirk dibêjin. Kurdistan heqîqetêke dîrokî ye. Ligel vê, Kurdistan zêdeyî heqîqetêke dîrokî ye û zêdeyî rastiyeke cografîk e. Ew rastiyeke kulturî ye jî.

Bêguman Kurdistan û kurd li herêmê peyda bûn. Ne ku ew ji valahiyê xuya kirin. Lê belê dewletên ku îro Kurdistan parçe kirine ku wekî polîtîka wesa muamele li kurd û Kurdistanê dikin heçko ew valahiyek in, û di eslê xwe de ew ji tu-derê peyda bûne. Ew dewlet ji tuneyiyê rabûn ku ew jî vê dawiyê, piştî Şerê Yekem ê Cîhanê. Ew dewletên çêkirî ne, ligel sînorên xwe yên çêkirî, ku tenê bi saya hêza zordestiyê ligel terora dewletê dikarin hebin. Heçî Kurdistan e, ew bi hezar salan e asayiyane mezin dibe, digihe. Kurd, her li wir jiyane û 40 milyon hêj jî dijîn.

Ew hemî kultura kurdî par dikin û nûnerên wê kulturê ne, ligel ku hawlatiyên dewletên cuda ne jî, vêga şeşan. Ev yek rastiyeke e ku kurdan ber xwe dane li hemberî asîmîlasyonê ligel ku hatine dabeşkirin bi raya navneteweyî, ligel ku tepeseriya hovane hebûye li ser wan. Çi li wan mumkun kiriye ku xwe ragirin? Bi ya min ji ber ku ew li ser esasên sînkretîzmê û di nav çarçoveya kultura kurdan a plûralîst de peyt bi hev ve girêdayî bûne.

Vêga têkoşîneke polîtîk ya pir-alî ya navneteweyî li kar e li dijî kurdan ku ez dibêjimê 'polîtîkaya dabeşkirinê', û ji ber vê hindê guftugoyên daîmî hene li ser cudatiyên kurdan. De em tiştê wan dike yekîti bipirsîn; tiştê wan ê hevbeş! Min pê bawer e ku serfiraziya kurdan a kulturî ew e ku heta radeyeke bilind dikarin cudatiyan xweş bibînin û wan cudatiyan bi awayekî organîk girê bidin, bo nimûne bi awayekî sînkretîkî.

Diyar e, girr û raza dewlemendiya otantîk û girîng a neteweya kurd ev e ku bi serbilindî pêşkêş dike.

Divêt amaje pê bikim ku gelek mirovên mahir û afirîner hene di nav kurdan de ku li derveyî kultura kurdî dixebitin. Gelek nivîskar, hunermend, filozof heta dewletiyên navdar ên ereb, tirk û farisan, kurd bûn û îro jî kurd in. Cîranên me bi vê rastiyê dizanin bes kêm ewrûpayî pê dizanin ji ber ku li dûrî kultura Rojhilatî dijîn, û ji ber ku kurd nabêjine wan. Min divêt tiştêkî zelal bikim: Mêjiyê kurd, zanista kurd, muzîka kurdî heta dereceke esasî hate rakêşan bo kulturên ereb, faris û tirkan û bû hêza jiyanê ji van her çar kulturen re. Bexşa zan-  
yar, nivîskar û hunermendên kurd ew qasêde ye ku ev kultur bêtir wan nikarin bêne sêwirîn.

Binêrine Yaşar Kemal. Nivîskarekî zimanê tirkî ye, bes bi xwe kurd e. Bila şair Ehmed Şewkî be. Birayên me yên ereb ên hazir bêguman bi wî dizanin. An jî li şair Şemseddîn Zarkulî bifikirin, an jî Selîm Berekat li Sûriyeyê. Dîsa bila şair Bilind Heyderî be ku 'ekola şî'ra nûjen a erebî' ava kir. Ew hemî kurd bûn. Gelek alimên misilman, pirr li dû Dinawerî, Amedi (Imadî) û Şarezûrî çûn, dîsa her kurd bûn. Li herkesî eyan e ku îro li Rojhilat û Îranê wergêr, nivîskar û muzîkarên herî baş kurd in. Dîsa li Ewrûpa û DYAyê jî gelek zanyarên navdar ên kurd hene niha, bo nimûne, pisporê kompûterê Profesor Kemal Mecîd (ku li Ingilîstanê dersê dide û lêkolînan dike), pisporê matematîkê û muhendisê elektronîkê Profesor Celal Xelanî (li DYAyê) û doktor û bîyologê tîbbî Dr. Goran Cemal ku li Brîtanya Mezin dixebite û car bo carê di asta wezaretê de lê dişewirin. Petrokîmyager Profesor Nadir Nadirofê ji Kazakistanê ku di qada navneteweyî de baş tê nasîn, endamekî berê yê kevne Akademiya Sovyet a Zanistan, û niha endamê Akademiya Zanistan a Rûsyayê; Profesore dermanan Behram Resul ku li Swêd û DYAyê dixebite û wê dawiyê xelateke zanistê wergirt

ji bo berhemhênana dermanekî nû ('Xalatan') ji bo fişara zêde ya çavan (*glaucoma prophylactics*)- ew hemî kurd in. Ev nîşanî me dide ku 'kurdbûn' dikare bi serfiraziya kulturî, teknoloji û zanistê ve bê têkildarkirin, û dîsa ev nîşanî me dide ku heta niha kurdan behre û qabiliyeta xwe ne ji bo çakkirina qedera xwe ya giştî bi kar anîne, ligel ku wan dikaribû wer bikira. Dêvla wê, ew zêdetir bi nasîn û zanîna xelkên cîran û ewên ku pê re dijiyan ve daketibûn. Wan xwest bi wan re xweş li hev bikin û bi çalakiya xwe ya favorî ve bilebikin: Berhevdan, kêşan, yekkirin û cihêkirin. Dibe ku ev bi kêr û keyf be, bes vê rewşê bi giştî gelek muşkule û asteng deranîne ji kurdan re.

Piştî Şerê Yekem ê Cîhanê, dema netewe-dewletên nû hatin avakirin ku bi sînorên çêkirî, Kurdistan parçe dikirin, rewşeke penceşêrî pêk hat. Wan dewletan qet û qet fikra ceribandina helkirina muşkuleyê nekir, derveyî rêbaza demokrasiyan, wan hema fikra wê ihtîmalê jî nekir ku kurd bi xwe dê biryarê bi çarenûsa xwe bidin. Wan hewl da kêşeya kurdî bi darê zor û hêzê hel bikin û hêj jî wesa dikin ji ber ku dixwazin bawer bikin ku ev kêşe -herwekî hemî yên din- dikare bi hêzê bête helkirin. Ya esil, ne tenê kêşeya kurd bi darê zorê hel nabe, belkî tu kêşe bi zorê hel nabin! Heke kêşe bi xurtî û zorê bihatana helkirin, ew dewlet ji mêj ve bû ghiştibûne amacên xwe. Ji kerema xwe li Sedam Huseyîn bifikirin, ku heta sîlehên kîmyayî û bîyolojîk jî bikaranîn li dijî kurdan. Niha li kû ye? Kurd heta hetayê nayên tepeserkirin.

Piştî Şerê Yekem ê Cîhanê du kêşe derhatin li Rojhilatê ku ji ber xeletiyê hêzên kolonyal ên ewrûpayî pêk hatibûn: Kêşeya kurd û kêşeya Felestînê. Ev herdu kêşe Rojhilatê diêşînin, heta ne bi tenê Rojhilatê. Hêzên gewre wesa difikirin ku heke ew alîkariyê li wan herdu gelan bikin da ku kêşeyên xwe hel bikin, û dawî li piştgiriya bo dewletan binin, dê nerihetî û şêlûbel derbêt. Lê rastî, berevajiyê wê fikrê ihtîmaleke mezin-

tir e. Heke gelên felestînî û kurd bigihine mafên xwe, û kêşeyên muteakîb bi demokrasiyê bêne çareserkirin li ser esasê wekhevîyê, hingî em dê serdemekê cihê bijîn. Dîsa jî qesasên xedar dê hebin. Ew li her derê hene, xwe li demokrasiyan jî. Gel çend memnûn be bila be, azadî çend berbelav jî be, muheqqeq hindek kes dê hebin ku dê qesta bikaranîna zordariyê bikin. Belam, heke feraset demokratîk be, bêguman hingî zor û tundûtêjî qasî ku îro heye nabe li Rojhilatê. Her milletî an jî neteweyê mafê xwe-rêvebirinê heye, û milletê hakimê îro nika-re wî mafî heta hetayê ji yê bindest bigire.

Muşkule qet û qet ne milletên hakim in, lê dewletên wan in. Zêde nerihetî nîne di navbera milletên cihê yên Rojhilatê de. Muşkule, dewlet bi xwe ne û saziyên wan ên hêzê çawa têne bikaranîn ji aliyê endamên neteweyên serdest ve. Bes ev neheqî heta hetayê devam nake. Wekî ku kurdên êzdî dibêjin: 'Wextek dê bêt ku dinya dê ewqas pak û safî be ku heke tu hêkekê danî aliyekî dinyayê û tu ji aliyê din lê binêrî tu dê hêkê bibînî.' Heke wa'de wiha be, hindekî biçûktir/kêmtir jî dibe dîsa. Ev e tiştê ku me divê, hem ji xwe re û hem jî ji birayên xwe yên felestînî re. Lê belê, ne tenê ew belkî cihû jî birayên me ne. Ew neteweyeke medenî û miletekî qedîmî ne ku zêdeyî du hezar sal in ligel kurdan di têkiliyê de ne. Pêwîst e herdu jî -cihû û felestînî- rêza mafên hev bigirin. Têkiliyên bi vî rengî di dil û aqlê me de ye ji bo ereb, tirk, faris û kurdan jî. Belam em hêj jî dûrî wê amacê ne. Kes cewaba gaziya me nade. Em bi tenê dikarin daweya mafên xwe bikin ji ereb û tirk û farisan.

Ji ber vê hindê bû ku me (Akademiya Kurd a Zanist û Hunerê) nameyek nivîsî bo Jitzhak Rabin dema ku em pêhesiyan ku Îsrailê dê hevkarî bikira ligel Tirkiyeyê -hem eskerî hem jî ne-eskerî. Me rexne li vê girt, û wî bersiveke gelekî dostane da me. Hevalê me Dr. Hassan Ali, dîrektorê Civaka Kurd li Berlî-

nê, ku îro em mêvanên wî ne, bi wê yekê dizane, lewre ew jî endamekî Akademiyê ye. Jitzhak Rabin wiha nivîsîbû: 'Polîtîkaya me ew e ku her gelê li Rojhilata Navîn xwedanê azadiya xwe, xwedanê hebûna xwe, û xwedanê mafê xwe yê xwe-rêveberiyê be.' Dê pirr baştir bûya heke ev mirov hêj jî sax ba, lê terora yekî xapiyayî bû sebebê Jitzhak Rabin. Ew ne tenê ji gelê Felestînê re belkî ji gelê Îsraîlê re jî qeybeke mezin bû. Mirina trajîk a Jitzhak Rabin, mîna mirina zû û nepenî ya Turgut Özalê serokkomarê Tirkiyeyê bû ku mirina wî zerer gihande kurd û tirkan herduyan. Bi mirina Özal re, kurte serdema ku siyasetmedarên tirk dikaribûn mîlîtarîstan kerr bikin jî qediya. Herwiha bi mirina Rabin re, serdema têgihîştina Îsraîl û Ewrûpayê qediya ligel hindêk boçûnên demokratîk ên realîst. Stratejîstên rojhilatî yên Îsraîlê, ligel amacên ne-realîst ên eskerî, bûn xwedan hêz û gotin. Natanyahu ligel mîlîtarîstên tirk baş li hev dike. Ma hûn ê li hêviya çî bin?

Tiştêkî ku ihtîmal e balkêş be ew e ku di kabîneya Natanyahu de, kurdek heye, General Jitzhak Mordikhay, ku ev jî mînakeke dîtir ê hevçerx e bo şexsên potansiyel ên kurd ku ne ji bo menfaeta kurdan in. Ligel vê jî, Jitzhak Mordikhay endamekî Rêxistina kultura Kurd-Îsraîlî ye û me fotoyekî wî heye li Civata Kurd li Berlînê ku di govenda kurdan de dileyîze. Dema Civata Kurd li Berlînê nameyeke dîtir sebareti bi heman mijarê (hevkarîya Tirkiye û Îsraîlê) şand ji Jitzhak Mordikhay re, wî hema bersivê jî neda. Ev nîşan dide ferqa di navbera Rabin û Natanyahu de.

Em jidil hêvî dikin ku hûn, mêvan û hevalên rêzdar, piştî vê çavpêketina li kultur û dîroka kurdan dê alîkarî û piştgiriya xwe ji doza kurd teksîr nekin. Her çî alîkariyeke biçûk dê têgihîştina kurdan û çarenûsa wan hêsantir bike. Alman dikarin bibêjine wan dewletên ku mafên kurdan nas nakin ku kêşeya kurd bi darê zorê û hêzê çareser nabe. Alman dikarin xwe

li vê yekê biceribînin bi awayekî objektîf û sebirkeş. Ji bo vê amacê kurd dê bi kêfxweşî hevkarîyê bikin ligel siyasetmedarên alman, û ligel gişt almanên ku dixwazin di duristkirina diyalogeke di navbera kurdan û welatên ku Kurdistan dabeşkirine de cî bigirin. Ya rast, polîtîka û endîşeya Civata Kurd li Berlînê ev e: Agahdarkirina raya giştî bê ka kêşeya kurd çawa dikare bê helkirin bi rêka diyalogeke erênî, û çalakkirina hemî hêzên demokratîk ên heyî, ne tenê li Almanyanê lê li seranserê Ewrûpayê, da ku kêşeya kurd bi awayekî demokratîk û aştiyane bête çareserkin. Spas.



## Zimanê kurdî Ji tradîsyona devkî bo zimanê nivîskî\*

**H**erwekî her kesê ku xema azadkirina zimanê kurdî yê tepeserkirî dixwe, ez jî gelek pê kêfxweş im ku ev konferansa navneteweyî pêk têt. Ew dê geşedanê bi hindêk pratîk û perspektîfên pêşerojê li ser zimanê kurdî bike. Ez wekî rojhatnasekî, herwiha wekî îranologekî û kesekî ku qederê çil salan e bi problematika piralî ya zimanê kurdî, kultur û dîroka kurdî ve lebikiye, ez, wate, qîmet û pêdiviya çalakiyên wiha dizanim û li ber çavê min mîna xizîneyekê ne. Lewre, min divê spas bikim bo Enstîtuya Kurdî ya Parîsê û Zanîngeha Sorbonnê ku hewl dan vê kombûnê pêk bînin. Ya rast ez jidil hêvî dikim ku ev kombûn, di heman demê de nebe hem yekem

\* Axaftina panelê ku di 28 Çiriya Duyê 1993yan de li Parîsê di konferansa 'Zimanê Kurdî ber bi sala 2000ê' de hatiye pêşkeşkirin. Zanîngeha Sorbonne û Enstîtuya Kurdî ya Parîsê konferans organîze kirin. "Kurdistan Studies Journal" hejmar 5, Uppsala (Swêd), 2001. Ji aliyê "Western Kurdistan Associality" di sala 2005an de li Londonê cara duyem hatiye weşandin.



hem jî axirîn çalakî, bêtir bibe pêngava ewil li ser rêka dûr û dirêj a xwedankirin û lêkolîna cidî ya zimanê kurdî ku ji ali-yê gelekî ve tê axaftin ku nifûs lê çil milyon e û bê dewlet e û di bin xeter û zextan de ye.

Lêkolînerên objektîf û bê pêşhukmî yên ku dîroka kurdan lêkolane, hemfikir in ku kurd nijadeke kevnare ye.<sup>1</sup> Kurd bi hezar salan e -dirêjtir ji ya ku belgeyên nivîskî dê bikaribin di-yar bikin- li ser axeke ku wekî 'landika şaristaniya mirovatiyê' hatiye binavkirin dijîn. Hema bes li mîtolojiya cihûtî û îslamê binêrin ku Çiyayê Cûdî li Kurdistanê wekî warê sekindana keştiya Nuh diyar dikin;<sup>2</sup> em ji dîrokê dizanin ku li ser axa kurdan û erdên li dorûberên wê gelek şaristaniyên pêşkevî hebûne, wekî şaristaniya Mezopotamya, ya hîtî, hurrî; karduxî, mîtanî, partî û sasanî. Jê bêhtir, gelek dînen sereke yên cihanê ji xwe re li ser axa kurdan cî peyda kirine, bo nimûne wekî mîtrayî (baweriya rojê), mazdayî (zerdeştî), dînen mîstîk, cihûtî, xirîstiyani, manî û îslam. Hetta îro jî li Kurdistanê gelek cime'etên kurdan ên ji dînen sînkretîk<sup>3</sup> hene, wekî

1 Ji bo zanyariyên bingehîn li ser dîroka pêşîn a kurdan, berhemên li jêr tene pêş-niyarkirin:

i. Minorsky, V. : "The Kurds", di nav *Encyclopaedia of Islam* de (Ansîklopediya Îslamê), Leiden, 1927.

ii. Driver, G.K.: "The Dispersion of the Kurds in Ancient Times", *Journal of the Royal Asiatic Society of Great Britain and Ireland* (JRAS), 1921, Beşa Çarem, rp. 563-572.

iii. Driver, G.K.: "The Name Kurd and its Philological Connections"; *JRAS*, 1923.

iv. Ahmad, Jemal Rashid: *Tarikh el-Kurd el-Qadim* ('Dîroka Qedîm a Kurdan') - bi erebî - weşana Zanîngeha Selahedînê, Hewlêr, 1990.

v. Ahmad, J. R. : *Dirasat Kurdiyah fi bilad Subartu* ('Xebatên Kurd li Welatê Subartuyê') - bi erebî - Bexda, 1984.

vi. Nikitine, Basil: *Les Kurdes*, Paris, 1956.

2 *Qur'an* (kitêba pîroz a îslamê), Cûziya 'HUD' No. 11, Riste 44. Li wir dibêje: 'Gemî hat û li ser Cûdiyê rawesta.'

3 Sînkretîzm yekbûna çend dînan ê bi şeweyê dînekî nû ye. Li vir divêt ferqa di navbera dînekî sînkretîk û tîkel de bê diyarkirin. Ez dînekî sînkretîk dişibînimê kome-

êzdî, kakeyî (yaresan, ehlî-heq an jî 'xelkê heqîqetê'), elewî, şebek, sarayî, bajwan, heqqa, hwd ku hemî bi hev re şahidiyê li wê rastiya hanê dikin ku kurd mîratgirên mîrateke kulturî ya bêhisab zengîn in.

Kurdan roleke girîng leyîstiyê di dîroka Rojhilatê de, hem berî hatina îslamê û hem jî piştî belavbûna îslamê di sedsala heftan de. Piştî îslamîkirina beşekî kurdan, kurdên misilman bi fedakariyê ku di nav milletên din de pir kêmtê dîtin, beşdarî li avakirina xanedanên ereb, faris û tirk kir. Ku em bes çendekan li vir destnîşan bikin: Avakirina Xanedana Ebbasî ji aliyê şoreşgerê kurd Ebu Muslim Xorasanî ve li sala 750 PZ, Selaheddîn (1137-1193) û qewirandina êriş û fetha li ser Fêlêstînê a xaçhilgiran di sedsala dwanzdehan de; avakirina Xanedana Safewî (1501/2 -1736) di serê sedsala 16an de ji aliyê Îsmail Şah Safî, kurê Şêx Safî yê kurdê pêşengê terîqetê derwêşan; û avakirina Împaratoriya Osmanî ku pîrriya mîrîtiyên kurdan ên azad piştgirî lê dikirin. Ew di 1515an de piştî şerê navdar ê Çaldiranê ku di wî şerî de Osmanîyan bi alîkariya kurdan faris têk biribûn, bi awayekî resmî tev li Xanedana Osmanî bûn. Bi vî awayî Împaratoriya Osmanî ava bû.

Serfiraziyên kurdan ên li ser navê cîranên wan ne tenê di warên eskerî û polîtîk de bûn; xêr û bexşa alim û hunermendên kurdan di dewlemendkirina kultura ereb, faris û tirk<sup>4</sup> de û bexşên wan bo gencîneya îslamê, hind mezin bûye ku sê ji çar kesên ku Xazaliyê alimê navdar ê îslamê wekî 'stûnên kultura îslamê' destnîşan kirine, kurd in.<sup>5</sup> Hal û rastiya ku

ke muzîkê ku di wê komê de her mûzîsyenek amûreke cuda dijene û her yek notayên cuda lêdide, lê belê, hemî bi hev re parçeyê yekgirtî ya muzîkê pêk tînin.

4 Abdul Karim Mohammad el-Modarris: *Ulamauna fi Khidmat el-'lim wa-l din* ('Alimên Me yên di Xizmeta Zanist û Dînê de') -bi erebî- edîtor Mohammad Ali el-Qaradaghi, Bexda, 1983.

5 Sê alimên kurd ev bûn: Dînewerî, Şa(h)rezûrî, Amedî (Îmadî), c.f. Morteza Motahari: *Khadamat-e motaghabel Islam o Iran* ('Xizmeta Muştêrek di navbera îslam û Îranê de') - bi farsî.

kurdan bi sedsalan hewl nedan hêza xwe ji bo avakirina dewleta xwe xerc bikin, an jî kultur û zimanê xwe bikemilînin, bala kesên xaricî kêşaye. Dîroknasê tirk ê osmanî Şemseddîn Samî di sedsala dawî de wiha nivîsiye di ferhenga xwe ya 'Qamus EI-Aalam' (Ferhenga Navan) de:

Hemî kurdên xwenda, bi zimanên erebî û farisî ve dadiketin, û zimanê xwe feramoş dikirin.<sup>6</sup>

Bes mînakek: Alimê kurd ê misilman Şêx Marifî Node (yî) Berzencî (1733-1838), nivîskarê bêtirî 46 berhemên giranbiha yên bi zimanên erebî û farisî bû.<sup>7</sup> Ev berhem li ser qanûn, etîk, teolojî, feleknasî, filolojî û edebiyatê bûn. Node (yî) Berzencî, 85 salan jiya û tenê yek kitêb bi kurdî nivîsî. Ferhengokeke biçûk a erebî-kurdî bû ku ji çend sed peyvan pêk dihat. Di pêşgotina vê kitêbê de Berzencî bi zimanê farisî ji me re dibêje bê ew kitêb çima nivîsiye. Diguhêzime vir: "Ji bo ku kurê min Ehmed peyvên erebî zûtir fêr bibe. Lewma min navê kitêbê danî Ehmediye."<sup>8</sup>

Rewşeke gelekî balkêş e ku di nav mîrîtiyên kurdan de ku ji aliyê xanedanên kurd ên azad dihatin rêvebirin bo nimûne wekî Hesnewî (avabûn 959),<sup>9</sup> Dostekî (990-1096),<sup>10</sup> hwd, kurdî bi qewlê zimanê resmî yê nivîskî nedihate bikaranîn. Belam ew bêtir wekî zimanê xelkê ma û di navbera xelk û rê-

6 Şemseddîn Samî: *Qamus ul-Aalam* ('Qamûsa Navan') bi tirkî-osmanî - Cild. 5, Stenbol 1314, rp. 3842.

7 Şêx Muhemmed Xal: *el-Şêx Maaruf el-Nudahi el-Berzincî* ('Şêx Maaruf Nudahi el-Berzincî') -bi erebî - Bexda, 1961.

8 Şêx Marifî Nodê: *Ahmadi*, çapa 2yê, Silêmanî, Çapxaneyê Jiyân, 1935.

9 Mihemed Emîn Zekî: "*Dîroka Dewlet û Mîrîşînên Kurd*", Wergera bi erebî: M.E. Ewnî, Qahîre, 1367 K/1948. (Kurmanciya wê: *Dîroka Kurd û Kurdistanê* - wergera bo kurmancî ji aliyê Ziya Avcî, Avesta, Stenbol, 2002.

10 Abdurraqîb Youssuf: *Hidarat el-Dawlah el-Dostakiyah fi Kurdistan el-Wusta* ('Şaristaniya Dewleta Dostakî li Kurdistanê navîn) bi erebî cild 2.

veberên wan de wekî navgînê ragihandinê yê sereke bû. Vê xemsarî û bêpaxaviyê tesîreke pirr neyînî li kurdan kiriye ku îro hêj jî karîger e. Baş ne zelal e bê ka çima kurdên xwenda 'sermiyanê' xwe yê rewşenbîrî li erdê yên din razandine. Me divê vê babetê bes bi kurtî rave bikin, ji ber ku babeteke aîdê beşeke din e ku ew pirsar hanê jî tê de ye bê ka çima kurdên xwenda nekarîn (an jî nexwestin) sermiyanê yên din îthal bikin bo Kurdistanê da xelkê xwe pitir 'ereb' an jî 'faris' bikin. Her çawa be, heke yek behsa 'xwe'ya xwe neke, an jî li dû menfaetên xwe nebe, hindekên din dê dêvla we bikin û gelek caran bi awayekî ne rast. Ji gizinga dîrokê ve wiha hatine afirandin şîroveyên xeyalî yên li ser orijîna kurdan, û fikrên ku nîrxê zimanê kurdî biçûk dikin. Me divê vê babetê bes bi kurtî behs bikin:

Bêtirî hezar salan dîroknasên ereb, bo nimûne wekî El Mesudî (mir. 956/7),<sup>11</sup> Ibn-Hewqel (mir. 977), hwd., îddîa kirine ku kurd ji cinan hatine. Helbestvanê faris ê dastanan Fîrdew-sî (932?-1020) di dastana xwe ya 'Şahname' (Kitêba Şahan) de dibêje ku kurd paşketiyên wan ciwanan in ku ji ber serjêkirina Zohakê (Ejdehak) zalim rizgar bûbûn, û karîbûn birevine çiyayan.<sup>12</sup> Xoca Saddedîn (1537-1599), muftiyê tirk ê Împaratoriya Osmanî wiha dinivîse di kitêba xwe 'Tac ut-Tewarih' (Taca Dîrokan) de:

Xwedê ferman daye ku kurd nikarin dewletekê ava bikin, ji ber ku, carekê ji caran, mirovekî gelekî kirêt ku mirov jê ditirsiya çû serdana pêxember Muhemmed. Pêxember tirsiya û ji mêrik pirsî bê ka ji kû derê dihat. Mêvan bi

11 El-Mesudi, Abu el-Hasan: Muruj el Dahab wa ma'adin el-jawahar, Les Prairies d'Or. Edition: Barbier de Meynard et Pavet de Caurteille, revue et corrigée par Charles Pallet, Tôme Sécond, Beyrouth, 166, rp. 249.

12 Firdosi, Abolqasem: *Shahname*. Editorî ji Joannes Augustus Vullers, Cilda Iem, Leiden, 1873, rp. 36, Riste 37-38.

awayekî dostane û rêzgir bersiv dayê ku kurd e. Pêxember berê xwe da esmên û got, 'Ya Xweda, tu firsetê nede kurdan ku bibin yek; yekbûna wan dê bibe sebebê wêranbûna dinyayê.<sup>13</sup>

Xerabkirina nasnav û zimanê kurdan digihe demên gelek berê ku di vê qewlêrka naskirî ya bi farisî de jî xuya bike (ji ber wergera inglîzî hatiye wergerandin):

*Erebî elif û bê ye,  
Farisî şirîn e wek şekir e,  
Tirkî karê hunerê,  
Kurdî tirra kerê ye.*

Ev yek rastî ye ku rewşenbîrên kurd xemsar in li hemberî zimanê kurdî, û herwiha mişebûna efsane û mîtên li ser babetê jî rastiyeke e. Bes mînakeke din da ku zelaltir bibe. Danerê dînê bahayî, Bahauallah (1817-1892) ku du salan (1854-56) bi navê nihênî 'Derwêş Muhemmed' ji bo xweveşartinê li Kurdistanê jiya, ji bo zimanê kurdî digot: 'Zimanê Ademî.' Wî digot ku Adem bi kurdî axaftiye, ji ber ku bi ya wî 'tu gramera' kurdî nebû.<sup>14</sup> Bahauallah tu fikr beyan nekirin bê Adem bi jina xwe Hewayê re bi çî zimanî axaftiye. Dê balkêş bûya ku me bizaniya bê Hewa bi çî zimanekî diaxaft; pêxember Bahauallah negote me.

Ziman berhemeke mirovî ya hizrî ye. Her ziman (bilî esperantoyê) ji qonaxa devkî dest pê kir wekî navgîna bazirganî û ragihandinê. Şert û mercên dîrokî derfetê bidin, zimanekî wesa devkî dikare bikemile ku bibe zimanê nivîskî. Ev şert û

13 Khuja Sadaddin: *Tac ul-Tewarih* (Taca Dîrokan). Stenbol, 1279/80 h. (1862/3), rp. 26, c.f. dîsa: *Salnama-i Vilayat-i Diyarbekir* (Salnameya Eyaleta Diyarbekirê) -bi tirkî-osmanî- 1301 h. (1884), rp. 138.

14 E. G. Brown: *Material for the Study of the Bahai Religion* Cambridge, 1961.

merc tixûbdar in ji ber civakê. Carinan faktorên dînî tixûba lê datînin, carna faktorên polîtîk, carên dîtir faktorên aborî û psîkolojîk an jî ya rast kombînasyoneke van hemî faktorên karîger in. Bo me wesa xuya dike ku faktorên dînî diyarker bûn di serdemên qedîm de, berê di pêşketina ji zimanê devkî bo zimanê nivîskî, û paşî bo standardîzasyonê. Kurd bi tenê li cîranên xwe binêrin bes e ku vê yekê bibînin. Bo nimûne, mîsyonerê xirîstiyân Mesrop Meştotz li sala 406an, tîpên ermenî durîst kirin da ku têkstên dînî bi zimanê ermenî qeyd bike. Dîne îslamê, hevkat kitêba pîroz a îslamê Qur'an, ku bi zaravayê Qureyş wehy bûbû, kir ku ev zarava bibe zimanê nivîskî yê hemî ereban.

Berê jî hate diyarkirin ku Kurdistan di tevahiya dîrokê de û niha jî, warê dînen herî cihêreng e. Lêkolînên li ser civakên ji dînen sînkretîk ên kurd ên behskirî, bi eşkereyî diçespînin ku di serdemên qedîm de dîne mazdayî, ji hemî dînen din pitir berbelav bû di nav kurdên li Kurdistanê. Wekî ku her kesê aş-nayê dîne zerdeştîyê dizane, ev dîn bi zimanê avestayî hatiye nivîsîn. Bi hizra min avestayî serekaniyeke kurdiya qedîm e. Ez dizanim ku kesin hene li ser vê hizrê em li hev nakin. Bi ya min, ew li ser zimanê kurdî bi dîrûdirêjî û objektîfiya pêdivî û di nav tevahiya wê de nexebitîne. Dema vê dikin, ew dê boçûna min a ku demekê li Kurdistanê bi avestayî axaftine bipeljirînin, nexwe divêt ew raveyeke din peyda bikin bo binyadên zimanê kurdî ku tu raveyên wesa her qet nînin. Lewma, heke em hevbîr bin ku berevajî îddiyên 'lêkolînên' pêşîn ên 'alim'ên ereb û faris, nabe ku kurd ji cinan hatibin, û ji esmanan daketibin mîna milyaketan, divêt em qebûl bikin ku ew paşketiyên wan gelan in ku hêj ji demên mêjeyî ve li welatê qedîm ê Medan jiyan, û wiha jî, di demên ewil de bi dîne Mazdayî emel kirin, û bi zimanê Avestayî axaftin. Xoşbextane, hewlên dawî bi vî aliyî ve bûne, an ku ligel fikra me ya temen-

dirêj in. Bo nimûne lêkolînên Îmadeddîn Doletşahiyê ji Kirmaşanê, li Rojhilatê Kurdistanê, li ser hin çiyayên ku huwiyetên wan hêj nehatine tespît kirin û navên wan ji zimanê Avestayî tî. Vî nivîskarî bi alîkariya raveyên fîlolojîk çespandiye ku ev çiya, her ew çiya ne ku li Kurdistana îro hatine destnîşankirin. Ez jidil pêşniyar dikim ku ew kitêba bi zimanê farsî, bê xwendin û lêxebitîn.<sup>15</sup>

Bes beşekî biçûk ê zimanê kurdî hatiye vekolan. Ji bo vekolandinê zimanê kurdî pêdivî ye em enstîtuyeye bo lêkolînên kurdolojiyê ava bikin. Li tu devera dinyayê enstîtuyeye bi rastî bo kurdolojiyê hatî terxankirin nîne, hetta li zanîngehên Kurdistana Başûr jî (Duhok, Hewlêr, Silêmanî) ku ji aliyê hukûmeta kurdan a li 'Herêma Kurdan' ve hatine avakirin û tene rêvebirin; di tu yekê de ne enstîtuya kurdolojiyê ne jî beşê 'kurdolojiyê' heye. Li wir, ligel gelek zanîngehên Ewrûpayê (ligel yên din, li Parîsê), ziman û edebiyata kurdî, û carinan jî dersên dîrokê tene fêrkin. Belam, ev ne kurdolojî ye. Kurdolojî vekolîna zimanê kurdî ya di rewş û çarçoveyên wê yên dîrokî de ye û bi prensîbên zanistî tete kirin. Bêyî ku kurdî bi awayekî sistematîk ligel zimanên îranî yên kevn, zimanên îranî yên navîn û yên nûjen bête berhevdan, tu kurdolojiya rast pêk nayê.

Divêt bête zanîn ku kurdolojî qedexe ye li Iraqê, taybetî di bin rejîma Baas de. Destûr hebû ku li ser kurdî li Zanîngeha Bexdayê û Silêmaniyê (paşî Hewlêr) lêkolîn bêne kirin, lê belê nedihêlan û heta îro jî nahêlin ku zimanê kurdî wekî zimanekî îranî bê qebûl kirin an jî xebatên berhevdanên fîlolojîk di navbera zimanê kurdî û zimanên din ên îranî de bêne kirin. Kirineke bi vî rengî dihate wateya 'cudakarî' û 'Shuoubia'<sup>16</sup> bo

15 Emadaddin Dolatshahi: *Joghrafiya-ye Gharb-e Iran* (Cografyaya Rojavayê Îranê) - bi farsî - Tehran 1363 h. (1984).

16 El-Şuoubia: Peyveke erebî ye ku bi wateya zimanî dibe 'xelkparêzî'. Têmek e ku ereban di demên ewil ên îslamê de çêkirin ji bo diyarkirina her çi kes an

Iraqê. Belam niha sê zanîngeh hene li wir di bin kontrola hukûmeta kurdan de (li herêma kurdan) û ez çak pê bawer im ku qet nebe li Zanîngeha Selaheddînê îmkanên danîna kurdolojiyê hene. Ez ji Wezîrê Perwerdeyê yê Kurdistanê hevî dikim ku hewl bide Beşa Lêkolînên Kurd ji Fakulteya Edebê cuda bike û fakulte an jî zanîngehekê ava bike ji bo Lêkolînên Kurdolojiyê.<sup>17</sup> Ez bawer im ferqa di navbera 'Lêkolînên Kurd' û 'Lêkolînên Kurdolojîk' de li her kesî eşkere ye.

Em niha vegerine mijara xwe, an ku şopandina zimanê kurdî ji tradîsyona devkî bo zimanê nivîskî. Meşa şervanên ereb di bin perçema îslamê de, demeke kurt piştî mirina pêxember Muhemmed, ku armanc dikir ku Împaratoriye Sasanî û Bizansê birûxîne, di vê şanoya şer de ciyekî navendî dane kurdan ku di navbera van erdan de dijiyan. Parastin û berxwedana kurdan li hemberî dîne nû bi sedsalan dewam kir, lê belê pê de pê de piraniya milletê kurd hêdî hêdî bû îslamî. Herwekî me berê jî behs lê kir, wê serdemê rewşenbîrên kurdan ziman û kultura kurdan ewqas îhmal dikirin ku şair û filozofê mezin ê kurd Ehmedê Xanî (1650/51-1706/7), 'Shakespeareê kurdan', dastana xwe 'Mem û Zîn' nivîsî berî bi 300 salan. Wî di kitêbê de rexne li kurdên xwenda girt û gilî û gazindên tûj li vê hindê kirin ku kurd bibûn 'êtîm', û zimanê kurdî yê feramoş 'sifir' bû (nisbet bi 'zêr'ê ji bo zimanê serdest).

Ew kurdên ku îslam ji xwe re wekî dîne xwe qebûl nekirin, xwedanê hizreke cuda bûn li ser kultur û zimanê kurdî. Ev komekê ku ne ereb bûn, niştimana wan ji aliyê şervanên ereb ve hatibû vegirtin, lê belê dixwestin ku xwedanê heman mafan bibin ligel ereban. Ev tîm, hîna jî ji aliyê zordar û nasyonalîstan ve tê bikaranîn ji bo kurdên ku huwiyeta xwe dixwazin û naxwazin bibin ereb.

17 Nivîskarê kurd Îbrahîm Ehmed (1914-2000) di konferansa Parîsê de bû her ligel Wezîrê Perwerdeyê yê 'Herêma Kurdan', Dr. Nasir Xefûr. Wan herduyan pêşniyar kir ku bi serperîştîya Jemal Nebezî saziyeke Fakulteya Kurdolojiyê bê avakirin di Zanîngeheke Kurdistanê de an jî Zanîngeha Lêkolînên Kurdolojiyê bê avakirin.



rastiya hanê hêjayî gotinê ye: Hukûmdarên îslamî yên ereb ên ku Kurdistan vegirtin û bo demeke kurt zerdeştî wekî 'Dînê Kitêbî' qebûl kirin, paşî êriş birine ser baweriya mazdayî û navê 'zindiqî'yê pê ve kirin. Ew kurdên ku li ser dînên xwe yên kevn man, neçar man xwe veşêrin û baweriyên xwe bi dizî 'emel bikin. Hingî li Kurdistanê ew dînên sînkretîk ên kurd ên navborî pêk hatin, (êzdî, yaresan, hwd.).

Kurdên misilman, erebî wekî zimanê xwe yê dînî helgirtin lê di heman demê de kurdî wekî zimanê axaftinê û danûstandina civakî ma di jiyana wan a rojane de. Li aliyê din, kurdên ne-misilman, ku dînên xwe yên cihê 'emel dikirin, hîn jî bi zimanê kurdî ve bestî bûn ji bo êdet û îbadetên xwe yên dînî. Heçî danîna elfabeyekê ye, êzdiyan elfabeya xwe ya nihênî durist kirin ku bi wê elfabeyê kitêbên xwe yên pîroz, 'Cilwe' û 'Mishefa Reş', transkrîbe kirin.

Cime'etên din ên dînî, bo nimûne yaresanan elfabeya erebî bi formê farisî bi kar anîn dema ku îlahiyên xwe yên bi kurdî transkrîbe kirin.

Kurdên xeyrî-muslîm jî karîbûn bingehekê peyda bikin ku binyad û binewanên xwe, welatê xwe û zimanê xwe bi awayekî dogmatîk bi hev ve girêbidin. Li vir çend mînak hene:

Di tesewûra êzdiyan de ew bi xwe ji tovê Adem hatine afirandin, ji ber Adem cot-zayend bû, û hemî xelkên din ji şûkirina Adem û Hewayê paşketin.<sup>18</sup> Gundê 'Laliş', li serê çiyayê ku navê xwe daye gundî (li devera Şêxanê, Kurdistanê Navînî), pîroz e bo êzdiyan ji ber tê bawerkirin ku ev çiya yekem pêngava Xwedê ye, û piştî wê, Xwedê sê hezar salan di gemiyekê de maye.<sup>19</sup> Di ramana êzdiyan de, Xwedê salê carekê, bi-

18 Theodor Menzel: 'Yazidi' in the *Handwörterbuch des Islam*, Leiden, 1941, S.808.

19 Die Heiligen Bücher der Jeziden oder Teufelsanbeter (Kurdisch und Arabisch), Hrsg. von Maximilian Bittner, Wien 1913, S.26.

harê, sera cime'eta wan dide. Serdana Xwedê li cejna wan a sala nû 'Sersal'ê rast tê ku ev cejn tim di Çarşembeya ewil a Nîsanê de tê pîrozkirin. Ew tê sera wan da ku qedera sala tê bêje, yanî da ku bide wan xeberên Sala Nû yên derbarê erdê û her hebûneke li ser erdê de, û da ku peymaneke 'gumrukê' an jî 'heqê derbasbûnê' bi wan re girêbide.<sup>20</sup>

Bawermendên yaresan jî, xwe bi qewlekî wek ê êzdiyan dibînin. Ew bawer in ku bi tenê cime'eta wan e xwedanê 'sirra Xwedê ya pîroz.' Pêxemberê îslamê Muhemmed dê ew 'sirr' ji wan wergirtiba, lê belê Xwedê bi xwe sirr da Pîr Binyamenê melekê serekê 'Heft Melekên' yaresan ku bi wezîfeya 'alter ego' (kesayetiya duhemî) yê Xwedê radibe, û wî jî bi zimanê kurdî da bawermendên yaresan,<sup>21</sup> bi vî awayî kurdî kir zimanekî pîroz. Ligel vê, gelek figûrên efsaneyî hene di baweriya yaresan de, wekî Baba-Nawus, Siltan Sahak (herdu laşên bûnewerê îlahî), û dayika Xwedê Dayirak a li Kurdistanê zayî. Li gorî baweriya wan dayika Xwedê, ku Siltan Sahak bi rêka 'ducaniya pak' anî dinyayê, keçeke ji hoza Cafan e.

Hannelore Küchler'a ku lêkolînên zanistî kirine li ser meseleya bê kurd xwe çawa dibînin û dinasin, di analîza xwe ya giranbiha de ku ji bo teza xwe ya doktorayê bo Freie Universität Berlin (Zanîngeha Azad a Berlinê) sepandibû, çespandiye ku êzdî, yaresan, û cime'etên din ên dînî yên li Kurdistanê, "komelên kurd in û xwekamîtiyeke (xwe-parêzî: *self-centeredness*) pirr bilind li ba wan heye."<sup>22</sup> Ew îddia dike ku temsîlên dogmatîk ên li jor navborî, mîna dîmenê 'reaksiyoneke jixwe-

20 Carl Brockelmann: *Das Neujahrsfest der Jezidis*, in der *Zeitschrift der Deutschen Morgenländischen Gesellschaft* 1901, Bd., 55, S. 388-89.

21 Hâji Nematollah Mojrem Mokri: *Shah-Nama-ye Haqiqat*. Le Livre des Rois de Vérité, publié par Mohammad Mokri, Tome Ier, Paris 1988, p. 202, vers 3841.

22 Hannelore Küchler: *Öffentliche Meinung. Eine theoretisch-methodologische Betrachtung und eine exemplarische Untersuchung zum Selbstverständnis der Kurden*. Inaugural Dissertation der FU-Berlin, 1978, S. 116-146.

ber e li hemberî hîpotezên riswaker ên ereban ên derbarê 'esl û binewanên kurdan de',<sup>23</sup> ku her wekî me gotî, ereb raveyên fantazmagorîk (xeyalî) pêş têxin dema statuya 'welatiyê duhemî' û 'zimanê duhemî' li kurdan û zimanê wan dikin.

Avabûna îslamê û belavbûna wê li Kurdistanê di sedsala heftan piştî Mîladê de, bû sebebê pêkhatinên diyarker di dîroka kurdan de. Hingî ewil cime'etên dînên sînkretîk ên kurd dest pê kirin û berî welatiyên xwe yên misilman, zimanekî nivîskî durist kirin ji zimanê xwerû axaftinê yê kurdî. Ji ber ku di nav kurdan de gelek cime'etên dînên sînkretîk hebûn lê tu sazî û sazûmaniyek nebû ku wan bigihîne hev, her cime'eteke dînî tradîsyona xwe ya dînî ku bes bi devkî dihate veguhestin, bi zarava û elfabeyên xwe yên herêmî transkrîbe kirin. Bi vî awayî tradîsyonên nivîskî yên cihê cihê pêk hatin. Zaravayê goranî xwedan girîngiyeke taybet bû di vê de; metnên herî kevn ên ji dema îslamê, di nav wan belgeyên ji me re mîrat mane de ne -ku ew metn, metnên xwerû dînî ne û bi wî zaravayî hatine nivîsandin. Yanî îlahiyên pîroz ên yaresanan bûn, wekî 'Dewreyî Behlul; ku nêzîkî heşt sedsalan piştî mirina Îsaiyî hatiye qeydkirin.<sup>24</sup> Nivîsandin û qeydkirina metnên yaresanan dora wê demê dest pê kir û heta sedsala şanzdehan dewam kir. Ev metn bi xwe her wekî kitêban in; ji wan ya herî girîng 'Defter-î Pirdivari' (Deftera Pirdivari) ye ji ber ku bawerî ew e ku ji aliyê Sultan Sohakê li jor navborî ve hatiye nivîsandin. Pirraniya van metnan bi pexşana kafîyeyî ne, û hemî hatine berhevkirin di nav yek kitêbê de bi navê 'Serencam.' Herwiha di *Serencamê* de hindê metnên pexşan hene ku behsa dîroka afirandinê û baweriya yaresanan dikin. Beşê bi pexşana kafîyeyî, bi navê 'Klam' tê zanîn. Rêzên pexşana kafîyeyî divê ji ber bêne xwendin da awaz pê çêbin. Hindêk beşên *Se-*

23 Ibid.

24 Sediq Safizade Borakeyi: *Dewre-i Bahlûl*, bi farisî, Tehran 1363h. (1984/5).

rencamê hatine weşandin ji aliyê Sediq-zade Borakeyyê lêkolînerê kurd ê şênîyê Tehranê ku li ser wan metnan xebitiye û beşin jê wergerandine bo farisî.<sup>25</sup>

Bi sedsalan dîne yaresanî di dewreke geşbûn û belavbûnê re derbas bû li Kurdistanê, bi taybetî li mîrîtiya Erdelanê. Ev mîrîti di sedsala çardehan de hatibû avakirin ji aliyê Bawa Erdelan ve. Erdê Zerdiawa (Keredag), Xaneqîn, Kerkûk û Kifrî ku jixwe niştimana kurdên goran bû, giş aîdê vê mîrîtiyê bû. Paytexta mîrîtiyê Şarezor bû ku îro xelkê wê bi kurmanciya navîn (bi navê din soranî) diaxive. Ji ber dîne resmî yê vê gewre mîrîtiyê yaresan bû û ji ber ev dîn bi zaravayê goranî dihate emelkirin, goranî bû zimanê resmî yê kurdan li seranserê herêmeke fireh ê Kurdistanê. Rastiya ku dîne yaresanî dînekî civakî bû jî karîger bû, ji ber ku dîndarên vî dînî yên herî feqîr bûn di nav tebeqeyên civakî yên kurdan de. Ji ber vê yekê hindêk kurdên axêverên kurmanciya navîn jî, ev zarava bi kar anîn. Bawerî ew e ku Sultan Sohakê navborî, Xwedayê yaresan, ji bajarokê Berzencî ye, ku xelkê wê hingî jî hêj jî bi kurmanciya navîn diaxivin. Herçend xelkê Berzenciyê li ser vî zaravayî man jî, ew bes îstîsnayek bûn. Bi riya qaîdeyên dînî yên yaresan, zaravayê goranî gelekî bi zû û baş belav bû, bi taybetî di nava xelkê feqîr de. Ligel vê, gelek rewşenbîrên kurd ên li derveyî erdê zaravayê goranî dijiyan jî, goranî wekî zimanê nivîskî qebûl kirin. Heke em gewre şairê sofî Baba Tahirê Hemedanî (935-1010) wekî îstisna qebûl bikin, ku helbestên wî yên navdar (*Rubaiyat*) bi têkeliyeke lekî, lurî, û goranî hatine nivîsandin, em dibînin ku navdartirîn şairên yaresanî bi sedsalan bes bi zaravayê goranî nivîsandine. Di nav wan de kesên wekî Bawa Yadigar (di sedsala heştan de li Şarezorê ji dayik bû), Yel-Begê Caf (1493-1554), û Xan Almas Xanê Luristanî

25 Sediq Safizade Borakeyi: *Dewre-i Heftwane* -bi farisî- Tehran, 1982.

(1662-1728) hene. Herduyên dawî, gelekî navdar in bo pêşbiniyên xwe yên balkêş ên derbarê dahatûya Îran, Rojhilat û cîhanê de.<sup>26</sup> Gelek şairên din ên kurd-misilman, bi sedsalan e ku bi zaravayê goranî nivîsandine herwekî Mela Perîşanî Kurd (hêj jî sax bû di 1398/99 de). Ew misilmanekî şî'e bû ku pir dijîtiya baweriya yaresan û derwêşan dikir. Şairên din ên wekî Seîdê Hewramî (1784-1842) û Mela Ebdul-Rehîmê Mewlewî Tavgozî (1806-1882) hêjayî behskirinê ne. Herduyên dawî şairên kurd ên navdar û misilmanên sunnî bûn. Divêt bê diyarkirin ku misilmanên sunnî û derwêşên kurdan gelekî bi dilsozî dijîminiya dînê yaresan dikir. Hebûna nufûseke mezin a sunniyan di nav kurdan de -ligel gelek terîqetên derwêşanji geşbûn û pêşketina zaravayê goranî danexist. Ligel gulvedana edebiyatê li mîrîtiya Erdelanê, bal û dên li ser muzîkê jî bûn. Muzîk elementeke bingehîn e di kultura civaka dînî ya yaresan de. Bi vê re têkildar, balkêş e ku kurdên li Kurdistana Rojhilat û Başûr, ciyê ku kultura Goranî lê belav bûbû, ji stranên re dibêjin 'goranî.' Asayî ye, ronesansa kulturî û zimanî ya ku bi handana goraniyê pêk hatibû, hemî rewşenbîrên kurd bi rûmet û xenî kir. Wiha dibêje şairê kurd Xanayê Qubadî (1700-1759), ku ji nişkê ve bûbû hostayê ziman û edebiyata farisî, di helbesteke bi babet zimanê kurdî de:

*Çendan bêjin jî farsî şirîn e wek şekir,  
Bi min kurdî hêj şirîntir e.  
Diyar e di vê dinyaya bêwefa de,  
Herkesek bes bi zimanê dayika xwe şad e.<sup>27</sup>*

26 Sediq Safizade Borakeyi: *Pishgouyiha-ye Il-Begi Jaff* ('Pêşbîniyên Il-Begê Caff') - bi farisî-, Tehran, Havîn 1369h. (1991). Sediq Safizade Borakayi: *Pishgouyiha-ye Khan Almas Khan* ('Pêşbîniyên Xan Elmas Xan') - bi farisî, Tehran, Bihar 1369h. (1990).

27 Jemal Nebez: *Pêwendarêti Kurdî*, bi kurdî, Stockholm 1986, rp. 78; Ji aliyê nivîskarî ve hatiye wergerandin bo Almanî, Weşana Akademiya Zanist û Hunera Kurd, Stockholm, 1987.

Bi saya mîrîtiya kurdan a bi hêz Erdelanê, dînê yaresan û zimanê wî yê 'pîroz' kurdiya goranî, belav bû bi her aliyekî Kurdistanê ve. Herçend mîrîtiyên din ên hêzdar ên kurdan hebûn ku li ser mezhebê sunnî bûn û li dijî dînê yaresan bûn, gelek kurd hatine ser dînê yaresan.

Di sed sala şanzdehan de, qeyran û serhildanên xeşîm û radikâl qewimîn li Kurdistanê ku wan qedera dînê yaresan, zimanê kurdî û gelê kurd diyar kir. Em dizanin ku Xanedana Osmanî ku di dawiya sed sala dwanzdehan de hatibû avakirin û li ser dînê sunnî misilman bû, li ser navê dînî şer dimeşand li dijî hemî dînen din, xirîstiyân û misilmanên şî'e jî tê de. Di serê sed sala şanzdehan de, Ismaîl Safewiyê berê navborî, Xanedanake şî'e ava kir li Îranê û hate ser hukmê serokatiya vî dînî. Herdu xanedanan (Osmanî û Safewî), cezayên bêwijdanane dane peyrewên reqîbên xwe. Ji ber ku pîrraniya mîrîtiyên kurd li ser baweriya sunnî bûn û lewma jî safewiyên şî'e dijminên wan ên eşkere bûn, osmaniyan ne bi zehmetî kurd kirin hevalbendên xwe. Bi alîkariya eskerî ya kurdan, osmaniyan êrîş bire ser dewleta safewiyan û paytexta wê Tebrîz vegirtin û wêran kirin. 'Biratiya eskerî' ya kurd û tirkên, ber bi hevalbendiyê siyasî ve çû. Di 9ê Tebaxa 1515an de, osmaniyan û mîrên kurdan peymanek girêda ku li hev dikirin ku herêmên di bin hukmên wan de bibin yek. Wiha hatibû danîn kevirê bingeha Împaratoriya Osmaniyan a paştir. Di peymanê de pasajek hebû ku serxwebûna navxweyî ya herêmên kurdan essehî dikir; pasajeke ku sultanên osmaniyan rêz lê negirtibûn. Balkêş e ku ligel ku dijminiyeke hevbeş a dînî hebû di navbera wan de, osmanî û safewiyan pişt re hevkarî kir da ku desthilatiya navxweyî ya mîrîtiyên kurdan hilweşînin û nûnerên xwe di mîrîtiyan de bi cî kirin da ku hêz û fermanrewayiyê bigirin destê xwe. Di 1639an de, osmanî û safewî bûn yek, û bi qaîdeyên Peymana Zehaw (Zuhab), Kurdistan par kirin di

navbera xwe de. Jê pê ve, herdu aliyan hewl dan ku mîrên kurdan berdîn ser ser û guhên yek û du.

Mîrîtiya Erdelan, ku bi dîtina dînî ne sunnî bû ne şî'e, li rewş û pozîsyoneke gelek şêlî û şikber de bû. Ji bo ku xwe biparêze, li milekî diviya bi qralê Îranê re li hev bike, li milê din jî bi sultanê osmaniyan re. Di rewş û şertên wesa de, bêtir belavbûna dînê yaresan û kurdiya goranî li Kurdistanê ne mumkun bû.

Hêjayî gotinê ye ku tepeseriya osmanî û îranî li ser kurdan encamên din jî deranîn. Rewşenbîrên kurd ên li mîrîtiyên kurdan ku niha di bin hukmê sultanê osmanî de bûn, hişmendiyeke mezin a nasyonalîzmê pêş xistin. Bexşeke bo zimanê kurdî jî hat ligel vê yekê. Di sedsala şanzdehan de zaravayê kurmanciya bakur bû zimanê nivîskî. Ev proses di mîrîtiya bakurî ya Botan de dest pê kir û hêdî hêdî li parçeyê bakur ê Kurdistanê belav bû. Li wir, kurdên xwenda xwe bi kultur û zimanê kurdî re mijûl kirin da ku herduyan pêş bixin û tradîsyonên xwe yê neteweyî belav bikin. Girîngiya vê yekê bi *Şerefnameyê* (1596/97) tê dîtîn ku ji aliyê Şerefeddîn Bidlîsî (1543-1603)<sup>28</sup> ve hatiye nivîsandin. Herçend wî ev berhem bi farisî nivîsandibe jî, naveroka wê balkêş û resen e. Behsa dîroka mîrîtiyên kurdan dike û agahiyên kûr dide derbarê tradîsyon û edetên kurdan de. Tê de, navên gelek binemalên kurd hatine hildan û behsa qehremanên efsanewî yê kurdan -wekî Rostem û Gurgîn hatiye kirin. Tiştê girîng ew e ku *Şerefname* tixûbên Kurdistanê destnîşan dike, û vê yekê wekî ku ew erdekî yekgirtî ye dike.<sup>29</sup> Dema *Şerefname* behsa ziman, edebiyat, û binemalên mîrîtiyên kurdan dike, ferq û cudahiyan jî radigihîne.

28 *Scheref-Nameh ou Histoire des Kurdes par Scheref, Prince des Bidlis* - publié par V. Veliaminof-Zemov, Texte Persan, Vol. I-II (1860:1862), St. Petersburg, 1860~1862.

29 Ibid.

Nivîsandina berhema Bidlîsî bi zimanê farisî, delîla vê ye ku ji bo kurdên misilman ên wê hingî tu tradîsyoneke bikaranîna zimanê kurdî ya bi nivîskî nebû. Ligel vê, ji sedsala şanzdehan pê ve hewlên pitir hebûn: Elî Teramaxî yekem gramerera erebî bi zimanê kurdî nivîsî di sala 1000 H. de (1591/2), da ku zarokên kurd ên ku heta wê demê tu materyalên wan ên bo xebitîna erebî nebûn, bibin xwedanê kitêbeke dersê.<sup>30</sup> Ev berhem pişt re hate firehkirin ji aliyê Mela Yunis Halkateynî (mir. 1785) ve. Halkateynî bi kurdî sê gotar nivîsandin li ser sînteksa erebî.<sup>31</sup> Melayê Cizîriyê alimê misilman ê kurd (1570-1640), meşaleya vê gulvedana ziman û edebî hilgirt. Wî helbestên xwe yên kurdî bi nîrxê yên Hafîzê Şîraziyê şairê navdar ê faris didîtin:

*Ger luluyê mensûrî  
ji nezmê tu dixwazî,  
Wer şî'rê Mela bîn  
Te bi Şîrazî çî hacet<sup>32</sup>*

Hişmendiya neteweyî ya Melayê Cizîrî û serbilindiya wî ya di Kurdistanê de di rêzên li jêr de jî eşkere ye:

*Gulê Baxê Îremê Buhtan im,  
Şebçiraxê şebê Kurdistan im.<sup>33</sup>*

Şair Feqê Teyran (1590-1660), Mela Ehmedê Bateyî (1441-

30 Jemal Nebez: "Die Schriftsprache der Kurden", *Acta Iranica*, Memorandum H.S. Nyberg, Leiden, 1975, pp. 97-122. p. 99.

31 Ibid.

32 El-Mulla Ahmad bin el-Mulla Muhammad el-Buhti el-Zivinki: *El-'lqâ el-Jawhârî fi Sharh diwan el-Sheikh el-Jizri* ('Şîroveya Dîwana Cizîrî'), Cild.2 Qamişlo, 1959.

33 Ibid., P. 824.



1495) û Elî Herîrî (1425-1541?) xizmeteke mezin kirin li zimanê kurdî bi rêya hunera xwe. Ew hewl gihîştine qedemeya herî bilind dema ku şair û hizirvanê neteweyî û arifê kurd Ehmedê Xanî (1650/ 51-1707) dastana xwe *Mem û Zîn* (hevberê *Romeo û Julietê*) nivîsand di 1694/5an de.<sup>34</sup> Li dû mirina Xanî, alimê kurd Mele Mehmudê Beyazidî (jidayikbûn 1791) dewamî li têkoşîna rewşenbîrî kir li bakurê Kurdistanê. Beyazidî herî zêde bi berhema xwe ya *Rabûn-Rûniştin û 'Erf-'Edetên Kurda tê zanîn*.<sup>35</sup>

Bi vî awayî du zimanên nivîskî hebûn li Kurdistanê: Goranî li rojhilat û başûr û kurmancî li bakur. Faktorên wekî duberiya Kurdistanê û parçebûna wê di nav gelek mîrîtiyan de, kêmasiya dewlet an jî hêzekê ku yekîtiya wan durist bike, nebûna dînekî hevbeş, polîtîkayên hukûmdarên Îranî û Osmanî ku tovên dijminî û kîndariyê direşandin di navbera mîrên kurdan de, hemiyan bi hev re tu rê nehêlan ji bo kurdan ku zimanekî resmî û nivîskî pêk bînin ji yek ji wan herdu zaravayên sereke. Ligel vê faktorê, hêzeke nû derkete ser sehneya Kurdistanê di sedsala nozdehan de, ku wê careke din zaravayê goranî daxiste statuya zimanekî bes devkî. Dor dawiya sedsala hejdehan, mîrîtiya Erdelanê xwe rêkxist ligel qralên qacaran da ku xwe ji hukmê osmaniyan xelas bike. Piştî hingî, osmaniyan gaziya xwe bire hevalbendekî xwe, Mîrê Babanan, da ku piştgiriya wan bike li dijî mîrê Erdelanê. Babaniyan bi hê-

34 Karê hunerî '*Mem û Zîn*' hatiye wergerandin bo gelek zimanên Ewrûpayî û ne-Ewrûpayî. Take wergera dramayê, versiyoneke kurtkirî ye ku min bi xwe durist kiriye û di 1969an de ji aliyê Yekîtiya Neteweyî ya Xwendekarên Kurd li Ewrûpayê (NUKSE-YNXKE) ve hatiye çapkirin. Çapa duyem a vê wergerê îsal di çarçoveya sêsed saliya '*Memû Zîn*'ê de bê weşandin. Di vê çapa nû de semînerê min jî dê hebe li ser '*Mem û Zîn*' û nivîskarê wê Ehmedê Xanî ku min di Çiriya Yekê ya 1993an de li Vienna Literaturhausê dabû.

35 Mele Mahmoudê Bayazidî: *Nravi i obicay Kurdov* ('Urf û Edetên Kurdan'), edîtor Margarete B. Rudenko, Moscow, 1963.

sanî karîn erdê Erdelanê vegirin û mîrîtiya xwe fireh bikin. Ji ber ku Babanî bi kurdiya kurmanciya navîn (sorani) diaxaftin, vî zaravayî niha îmkân peyda kirin bo belavbûnê, taybetî jî piştî ku Mîrê Baban Îbrahîm Paşa di 1784an de bajarê Silêmaniyê ava kir û kir paytexta xwe. Sedsala hejdehan, bû şahidê rabûna varyasyona Silêmaniyê ya zaravayê kurmanciya navîn. Ji gewretirîn şair û nivîskarên ku bi wî zaravayê nû bûyî zimanê nivîskî xebitîn, ew ên li jêr navdar in: Mehwî (1830--1904); Kurdî (1812-1851?); Salîm (1800-1869); Nalî (1800-1857/58); Sêx Reza Talebanî (1837-1909); Wefayî (1844-1914); Koyî (1817-1896/97); û Salmê Sine (1845-1909).<sup>36</sup>

Herçend varyasyona Silêmanî ya kurmanciya navîn bû zimanekî nivîskî yê pir-herêmî jî, mirov bi rehetî dikare têbigihe ku 'zaravayê zikmakî' yê pirraniya gewre şairên kurd di eslê xwe de zaravayê goranî bû. Herêmên girîng ên kurdên goran, wekî Kerkûk, Kifrî, herêma Rûbarê Sirvanê, Xaneqîn, Zerdîawa (Keredax) û eşîrên cihê yên goran wekî Cebarî, Talebanî û Zengeneyan jî dev ji zaravayê xwe yê eslî goraniyê berdane. Ji zaravayê goranî bes çend şair mane. Ligel vê jî, îstisnayeke gûzîde heye ji nav wan: Mewlewî Tewgozî (1806-1882). Bi damijandina mîrîtiya Erdelanê di nav xanedana qacar de di 1867an de, tu qadên fireh neman bo zaravayê goranî. Lewma, vî zaravayê şirîn û dewlemend, ciyê xwe wekî zimanekî edebî li Kurdistana Rojhilat û Başûr winda kir, û wekî ku akademîk û lêkolînerê kurd Seîd Xanê Kurdistanî ragihandiye,<sup>37</sup> bû 'zimanê pîrejînan li goşe û tenge kolanên Senendecê.'

Varyasyona nû ya zaravayê Silêmaniyê pêk hatibû ji enca ma têkelkirina zaravayê Şarezor, ê zaravayê kurdên Erdelanî,

36 Eladîn Secadî: *Mêjuyî Edebî Kurdî* ('Dîroka Edebiyata Kurdî') Bexda, 1952.

37 Seîd Xanê Kurdistanî: *Nizani/Mizgani (Mizgînî)* Tehran 1309h. (1930/31).

bi zaravayê Kalaçolan. Kalaçolan paytexta ewil a mîrên babanî bû. Meyla kurdên Silêmaniyê bo firehbûnê dewam kir. Îro, çaktirîn nivîskar û şairên herêma Goran bi zaravayê Silêmaniyê dinivîsin; ji nav wan alimê navdar Mela Abdulkerîm Mu-derris û herdu kurên wî, Muhemmed û Fatih. Bêtir hêjayî behs e ku gewretirîn reformîstê şî'ra kurdî, gewretirîn şairê serdemên nûjen ên kurdan, Abdulla Goran (1904/5?-18 Çiri-ya Duyê 1962) bi zaravayê Silêmanî nivîsandiyê.

Ji ber fetisîna serhildanên kurdan ên neteweyî li dijî hukmê navendî yê Împaratoriya Osmanî di nivê sedsala nozdehan de û hilweşîna hemî mîrîtiyên kurdan wekî mîrîtiya bi hêz a Botan, zaravayê kurmanciya bakur nekarî xwe ne li rojhilat ne jî li başûrê Kurdistanê pêş bixe. Zaravayê li jorê navborî, wekî zimanê nivîskî yê kurdîaxêvên kurmanciya bakur ma û ji aliyê rewşenbîrên kurd û wan saziyên kulturî ve hate pêşvebirin ku di dawiya sedsala nozdehan de li bal 'kurdên axêverên kur-manciya bakur' ve hatibûn avakirin. Her ligel yekem rojname-ya kurdî 'Kurdistan' jî ku ewil di 1898an de derketibû.<sup>38</sup>

Piştî parçebûna Kurdistanê ya berbad a di encama Yekem Şerê Cîhanê de, zimanê kurdî bi şert û mercên nû yên kolonyal re rû bi rû ma. Hevpeymanan (Brîtanya Mezin, Franse û Îtalya) nehêlan kurd dewleta xwe ava bikin. Kurdistan hate parçekirin di navbera pênc nû dewletên kolonyal de ku ji aliyê hêzên super ve li gorî berjewendiyên xwe yên aborî û stratejîk hatibûn avakirin an jî qebûlkirin: Tirkiye, Îran, Iraq, Suriye, û YKSS/Azerbaycan.

Netewe dewletên nû yên di destê tirk, ereb û farisan de, ku bi awayekî sexte bi alîkariya 'serketiyên' Ewrûpayî ve hatine avakirin, hewl dane ku asîmîlasyona kulturî pêk bînin li ser kurdan li ciyên ku wan nekariye bi rêkên eskerî wan tamamî qirr bikin. Ji ber ku ziman yek ji girîngtirîn faktorên huwiye-

38 Hannelore Küchler: Ibid., Footnote 21, P. 417.

ta neteweyî ye, ev hemî dewletên ku hêj jî bê îstisna xwedanê hukûmetên eskerî an jî awayên din ên antî-demokratîk in, an bi temamî kurdiya axaftin an jî nivîsandinê qedexe kirine, an jî di bin kontrolên gelekî sext de izin dane ku pirr kêmbê bikaranîn. Tirkiyeyê hêj di serî de, di nav çarçoveya 'polîtîkayên tirkkirinê' de, qedexe kiriye zimanê kurdî bê bikaranîn; û her çi bikaranîneke wî xeşîmane ceza kiriye. Tepeseriya giran û daîmî ya heftê salan, hişmendiya neteweyî ya kurdan pitir bi hêz kiriye; lê belê kemilîn û pêşketina zimanê kurdî hêdî û zêde kiriye. Zaravayê kurmanciya bakur (zaravayê Cizîrê), ku li gel ew hind şert û mercên zehmet jî wekî zimanê nivîskî ye kurdên bakur tê bikaranîn, tûşî gelek girîftên zimanî yên navxweyî bûye û hêj jî dibe.

Li Suriyeyê rewşenbîrên kurd, bi taybetî endamên malbata Bedirxaniyan, ji hebûna hêza manda ya Fransayê li Suriye û Lubnanê îstîfade kirin da ku xizmetê li zimanê kurdî bikin. Li gel weşandina hindê kovarên bi kurdî wekî *Hawar*, *Stêr*, *Roja Nû* û *Ronahî*, Celadet Bedirxan (1897-1951) yek cure elfabeya latînî jî durist kiriye bo zimanê kurdî (zaravayê kurmanciya bakur), ku hêj di nav kurdên axêverên kurmanciya bakur de tê bikaranîn. Kêmasî û qusûrên cihê yên vê alfabe yê hene, bi taybetî sebarê bi hindê dengên ku di zaravayên din de hene lê bêmuqabil in di elfabe ya Bedirxan de. Bo nimûne, 'r'ya girover û 'e', ji bo jihev cudakirina 'ker' (kerê ajal) û 'ker' (yê nabihîze); û 'gel' (xelk) û 'gel' (fasileya di navbera lîngan de). Bi her çi halê heyî, ev hemî weşan û çalakî hatin qedexekirin dema fransiyan welat bi cî hişt. Fransiyan, rojavayê başûrê Kurdistanê hêlan bêyî ku tu garantiyekê bo kurdan werbigirin ji Suriyeya netewe dewleta ereban a nû.

Li Iraqê, kurd, nisbet bi welatîyên xwe yên li dewletên cîran, çalaktir bûn di warê geşepêdana zimanê xwe de. Şans û pozîsyoneke wan a çêtir hebû. Piştî Yekem Şerê Cîhanê, kur-

dên başûrê Kurdistanê karîbûn qraliyetekê ava bikin bi serokatiya Şêx Mehmûd Berzencî (1882-9 Çiriya Pêşî 1956). Serê ewil, Şêx Mehmûd wekî waliyê Kurdistana Başûr hate nasîn ji aliyê hêzên dagîrker ên Brîtanyayê li Bexdayê. Dema gelê kurd, Şêx Mehmûd wekî Şahê Kurdistanê hîlbijart, şer û lêkdanan dest pê kir di navbera hêzên Brîtanya û kurdan de; û hêzên eskerî yên Brîtanyayê, başûrê Kurdistanê kirine nav sînorên netewe dewleteke ereban a nû avakirî, Iraqê de. Di hengava nêzîkî pênc salên ku dewleta kurdan di bin serokatiya Şêx Mehmûd de dom kir, kurdên xwenda xizmet li zimanê kurdî kirin. Hukûmeta kurdan hindêk rojnameyên kurdî weşandin<sup>39</sup> û hindêk mektebên kurdî ava kirin bo keç û kuran. Hêzên dagîrker ên Brîtanyayê jî dîsa rojnameyên xwe yên bi zimanê kurdî weşandin: *Tegeyiştinî Rastî û Pêşkewtin*.<sup>40</sup> Du inglîzan, Major Soane û Major Noel, ku endamên hêzên dagîrker ên Brîtanyayê bûn, xizmet li kemilandina zimanê kurdî kirin. Major Soane ligel kitêbeke gramera kurdî<sup>41</sup> kitêbeke dersê jî bi kurdî nivîsand.<sup>42</sup> Hetta wî 'perê mukafat' dida her çi kurdê ku dikarî gotareke bi kurdî binivîse bo rojnameya '*Pêşkewtin*'ê ku hem fêambar be bo hemî xwendevanan û hem jî bi peyvên kurdî yên durist bê nivîsandin. Kurdiya resmî zaravayê Silêmaniyê bû.

Li dû pêkhatina 'Qraliyeta Iraqê', 'Qanûna Zimanên Herêmî ya 1931an' hindêk mafên kulturî bexşandin bo gelê başûrê Kurdistanê, lê belê ew maf bi temamî nedihatîn 'emelkirin. Ligel vê yekê jî, rewşenbîrên kurdan hewl dan zimanê kurdî bikemilînin û bêtir pêş bixin. Pêngava ewil, guncandina elfabe-

39 Ev rojname: *Umêd-î Istîqlal*, *Rojî Kurdistan*; û *Bang-î Heq* c.f. Hannelare Küchler, *ibid.*, rp. 418.

40 *Ibid.*

41 Major E. B. Soane, CBE: *Elementary Kurmanji Grammar*, Bexda, 1919.

42 E.B. Soane: *Kitabi Awalamin Qiraati Kurdi* ('Kitêba Destpêka Xwendina bi Kurdî'), Bexda, 1920.

ya erebî-farsî bû, bi armanca duristkirina elfabeyeke modern û fonetîk bo zimanê kurdî, ku hemî dengên zimên bi nivîskî derbêxe. Ji bo vê jî, pêdivî bû hindêk nîşanên fonetîk li tîpên erebî bihatana zêdekirin da ku ew dengên kurdî yên ku di zimanê erebî de nînin jî bihatana nîşandan. Serkêşê vê armancê Kolonel Tofîq Wehbî yê (1891-1984) fîlolog û efserê artêşê bû. Hewlên wî yên zanistî û pirr girîng, zû bi zû hatin redkirin, dema hatin ber destên Wezareta Kulturê ya Iraqê ku meylidarê nasyonâlîzma hukmê ereban bû. Sebebê hatî diyarkirin ew bû ku tu 'nîşaneyên biyanî' an jî 'kûmên kurdî' nika-re bêne bicîkirin li ser 'tîpên pîroz ên erebî', ew tîpên ku Qur'an pê hatiye nivîsandin. Hêjayî behs e ku tîpên erebî, wekî jê re tê gotin, di eslê xwe de ne erebî bûn ne jî îslamî. Berî demên îslamî jixwe hebûn û ji elfabeya aramî ya kevn hatibûn dariştin, zimanê cihûyan ê qedîm. Herçend çapemeniya kurd û kitêbên dersê yên ku hukûmeta Iraqê ji bo dibistanên kurdan ên seretayî çap kiribûn, nedikarîn vê elfabeyê bi kar bînin heta dawiya salên 1950î, ev elfabe, ku ji bo zimanê kurdî hatibû nûjenkirin û guncandin, dîsa jî dihate zanîn di nava kurdan de.

Tiştêkî din jî hebû ku Wehbiyê li jor behskirî hewl dida çak bike di dema xwe de. Serê salên 1920î bû ku wî elfabeya latî-nî rêz û qeyd kir ji bo nivîsandina bi kurdî. Forma wî duristkirî, pitir li ser bingeha bikaranîna ingilîziyê bû. Hewlên wî vê carê jî sernekeftin; ji ber ku hukûmeta Iraqê, bi hincetên li ser navê dîne îslamê, belavbûna elfabeyeke 'ewrûpayî-xirîstiyani' li Iraqa misilman dîsa qedexe kir.

Li vir divêt bê destnîşankirin ku Wehbî heşt payeyên wezarete girtibûn di hukûmeta Iraqê de. Divêt bê zanîn ku elfabeya Wehbî ya latîni jî, wekî ya Bedirxan (ku ya wî zêde ne li ser mentîqa ingilîzî lê li ser elfabeyên tirkî û fransî bû), hindêk qusûr hebûn. Heke wan herdu lêkolîneran hevkarî bikira, îro

gelê kurd bi her îhtimalekê dê bûba xwedanê elfabeyeke çaktir a latînî.

Li Iraqê, hemî çapemeniya kurdî, radyo û weşan, heta hilweşîna monarşiyê di 14ê Hezîrana 1958an de, bi tenê bi zaravayê Silêmaniyê bûn ku bi şaşî wekî 'kurdiya soranî' tê binavkirin. Ji ber xemsariya 'kurdên soranî' sebareti bi zaravayê kurmanciya bakur ('badînanî' dibêjinê li Iraqê), axêverên kurmanciya başûr bi temamî dûr man ji fêrkirina zimanê kurdî û çapemeniya kurdî. Hukûmeta Iraqê, bo berjewendiya xwe, piştgiriya wê rewşa nexweş kiribû da ku kurdan cuda bike û wiha jî hukmê xwe peyt bike li ser wan.

Li vir divêt bê behskirin ku kurdên li Îranê di bin tesîra pêşketina zimanê kurdî ya li Iraqê de mabûn. Sebebê vê yekê bi rastiya hanê ve ye ku ji destpêkê ve, têkiliyên xurt ên siyasî hebûn di navbera kurdên Îranê û Iraqê de. Ji vê rastiye pê ve jî, zaravayên li Kurdistana Îranê pê tene axaftin (mukrî, erdelanî, lekî û kirmaşanî) gelek nêzîk in ligel 'zaravayê soranî' yê Iraqê. Herwiha kurdên Îranê heman elfabeyê bi kar tînin ligel kurdên Iraqê. Heçî elfabeya kurdî-rojhilatî ya guncandî ye, cara ewil di 1345 H. de (1966/67)<sup>43</sup> bo çapê hate bikaranîn, dema ku antolojiyeke helbestan bi wan tîpên guncandî hate çapkirin. Zûtir pêk nehat ji ber ku pêkûtiyên polîtîk ên li dijî wê gelek zêde bûn, û herwiha mesrefeke pirr zêde pê diviya. Ji ber kurdên Iraqê, yên ku bi kurdiya soranî dinivîsin, gelek îstifade ji peyv, biwêj û termînolojiya kurdên Îranê dikin, bi taybetî ji zaravayê mukriyanî, yek cure zimanê nivîskî yê standard pêk hatiye li Îran û Iraqê ku mirov dikare jê re bêje 'kurmanciya navînî.'

Herwiha divêt rewşa zimanê kurdî di dema Yekîtiya Sovyetan de neyê piştguhkirin. Di dema Lenîn de, heta dawiya sa-

43 Hesên Salah Soran: "Çapî Yekemîn Kitêbî Kurdî le Êran" ('Çapa Yekem Kitêba Kurdî li Îranê'), di kovara kurdî *Sirwe* de, Wurmê, Gulan 1993, r.62.

lên 1920î, herêma kurdnişîn xwedan statuya herêma otonom bû û wekî 'Kurdistana Sor' dihate zanîn. Ji bo nivîsandinê, li vê herêmê ewil elfabeya ermenî hate bikaranîn, paşî ya latînî. Pişt re statuya otonom a 'Kurdistana Sor' hate betalkirin û bi Azerbaycanê ve hate girêdan û rejîma Stalîn û sîmsarên miqaman ên Azerbaycanî zulm li kurdan kirin. Peyva 'kurd' bi xwe, û herwiha axaftina bi kurdî hate qedexekirin li Azerbaycanê. Ji nav heşt komarên Sovyet ên ku kurd lê dijiyan, wê hingê, bes Rûsya û Ermenistanê rê dan ku zimanê kurdî bê kemilandin. Kurdên xwenda yên van herdu komaran hewl dan zimanê kurdî pêş ve bibin, ligel ku di herdu komaran de jî zor li wan dihate kirin ku elfabeya kirilî bi kar bînin bo nivîsandina bi kurdî. Dîsa jî, mirov dikare bibêje ku kurdiya hem bi elfabeya latînî û hem jî ya bi elfabeya rojhilatî dihat nivîsandin, ne xerîb bû ji wan re. Bi riya têkiliyên xwe yên ligel kurdên Îran, Iraq, û Suriye û herwiha Tirkiyeya cîran, 'kurdên sor' karibûn zimanekî delal ê nivîskî pêk bînin li ser bingeha zaravayê kurmanciya bakur, lê bi gelek taybetiyên zaravayê kurmanciya navînî jî li ser.

Ji bo parvekirina bîr û encamên ku ez di temen û jiyana xwe de ghiştimê, ez dixwazim niha li vir hindek bîr û sepanên ji tecrubeyên xwe yên şexsî eşkere bikim:

Hêj di yekem nivê salên 1950î de dema min fizîk, matema-tîk û perwerde dixwend li zanîngeha Bexdayê, min dizanî ku rojekê bi her renekî dê mamostetiyê bikim di lîseyên Kurdistanê de. Ji ber vê hindê, min xwest îmkanan durist bikim ku alîkariya şagirtên kurd bikim, ku ew sebarek bi fêrbûna zimanê xwe yê zikmakî bi temamî bêsiûd û bêbeş bûn. Min jixwe hindek behre û sermiyan hebû ji bo wê armancê. Ez wekî kurê alimekî misilman hatime vê dinyayê ku wî ez bi gelek zimanan mezin kirim û kir ku bikevime têkiliyên nêzîk ligel kulturên gelên cîran. Derfeta min hebû ku ez li ber destên wî û



alimên din ên welatî li ser qanûnên îslamê (şerîet), felsefe û teolojiyê bixebitim. Vê xebatê, zanîneke pirr baş a zimanên erebî û farisî û edebiyatên wan pê diviya. Zêde pê de neçû hêj dema xwendekar bûm ez pê hesiyam ku zimanê kurdî pirr girftdar e, û heta niha jî wesa maye:

1. Elfabeyeke zimanê kurdî ya yek û yekgirtî nîne. Dêvla wê, sê elfabeyên cuda hene, bi navên elfabeya rojhilatî (ji elfabeyên erebî-farisî hatiye duristkirin), elfabeya latînî, û elfabeya kirîlî. Elfabeya kirîlî, ji bo kurdî ya herî kêrhatîtir e, û îro, piştî belavbûna Yekîtiya Sovyetan, ne girîng e bo zimanê kurdî û lewma jî dikare dev jê bê berdan. Li milê din, elfabeya rojhilatî girîng û jîndar e, lê belê kevne-mode û destnexweş e; herwiha pir zehmet e bo fêrbûnê û ne ewqas kêrhatî ye jî bo kurdî. Elfabeya Latînî ji hemiyar zêdetir li zimanê kurdî tê, bes astengên polîtîk û dînî hene li ber qebûlkirin û cîbicîkirina wê ya temamî. Ligel wê jî, elfabeya latînî ya Bedirxan pêdivî bi nûkirin û reformê ye. Ji ber ku kurd bi elfabeyên cuda dinivîsin, tûşî astengî û zehmetiyarên tînan di parkirina berhemên xwe yê zimanî de. Hêj dema ez xwendekar bûm gihiştibûm wê qenaetê -ku heta îro ligel min hatiye- ku kêmasiya elfabeyeke yek û yekgirtî, felaketeke mezin e bo gelê kurd. Qebûlkirina elfabeyeke hevbeş dê rê li ber ragihandineke çêtir veke di nav kurdan de û dê nêzîkbûna zarava û devokên cihê hêsantir bike. Li vir ez behsa nêzîkbûnê dikim ne yekgirtineke temamî. Zimanekî yekgirtî pêdivî bi gramereke yekgirtî heye ku îro tu yeke wesa ne berdest e. Lewma, tiştê gelekî girîngtir meseleya elfabeya yek û yekgirtî ye. Ez ligel wê baweriyê bûm, û hîna jî ligel im, ku elfabeya latînî divêt bê nûkirin û pêşxistin. Pêşxistina nivîsandina zimanê kurdî bi elfabeya latînî, nayê wê wateyê ku elfabeya rojhilatî yekcar bê feramoşkirin. Di her halûkarekê de, rewşa polîtîk û dînî derfetê nade vê yekê. Rejîma Saddam Huseyîn, hevkarê me Dilşad Merîwanî îdam

kir ji ber ku wî ne bi elfabeya latînî lê bi elfabeya erebî ders didane şagirtan. Ev rastî li milekî, em guhertineke firende û pûç jî pêşniyar nakin; dema mirov li xizîneya kultura mezin a nivîskî û çapkirî ya bi zimanê kurdî ku kurdên Iraq û Îranê di heftê salên dawî de pêkanîne dinêre, divêt ji guhertineke wesa dûr bimînin.

2. Ne zimanek, lê du zimanên nivîskî hene ku yek ji wan jî ne bi tekûzî standard in. Di 1950an de wesa bû û heta îro jî her wesa dimîne. Ez dê bi kurtî li vê meseleyê vegerim.

3. Dema ez xwendekar bûm li Bexdayê, tu têrmên kurdî yên pisporiyên zanistî û teknîkî nebûn. Bêyî termînolojiyên wesa ne mumkun e bi kurdî kitêbên zanistî bêne nivîsandin. Mumkun e ku kesek serbixwe dest bi duristkirina termînolojiyeke wesa bike, bes divêt pisporên ji dîsîplînên cuda hevkarîyê bikin û bigihine hevberîyê. Lewma -hêj dema ez xwendekar bûm ez ghiştîme wê baweriyê û min pêşxist- pêdivî ye 'Akademiya Zimanê Kurdî' bê avakirin. Ligel hindê hevalan ku ew bi xwe jî xwendekar bûn di beşên din de, me 'Komîteya Pêşvebirina Zimanê Kurdî' ava kir.<sup>44</sup> Min divêt diyar bikim ku madeyên 1 heta 3yê yên teblîxa min, di gotareke bi zimanê kurdî de hati-bûn beyankirin ku gotar bi sernavê 'Xwendewarî bi Zimanê Kurdî' di 1957an de li Bexdayê hatibû çapkirin.<sup>45</sup>

Di Çiriya Yekê ya 1955an de ez mamosteyê fizîk û matema-tîkê bûm di du dibistanên navîn de li Kerkûkê. Hêj ji serî ve min hewl da dersan bi zimanê kurdî bidim şagirtên xwe yên kurd da ku hêsantir têbigihin. Ji ber ku kurdî wê hingê qede-xe bû di dibistanên navîn de li Kurdistanê, hem rêvebirên po-lîtîk hem jî sîstema disîplîna dibistanê ketin nav liv û bizavan

44 Jemal Nebez: *Zimanî Yekgirtûy Kurdî* ('Zimanê Yekgirtî yê Kurdî'), weşana NUKSE, bi Kurdî, Bamberg, 1976, rp.15-18.

45 Jemal Nebez: 'Xwendewarî be Zimanî Kurdî' ('Perwerdeya bi Zimanê Kurdî'), bi kurdî, Bexda 1957.

li dijî min û dawî ez hatim sirgûnkirin bo Besraya li başûrê Iraqê. Di wan du salan de ku min li Kerkûkê mamostetî kir, min bingehen bo duristkirina yekem kitêba fizîk û matematîkê bi zimanê kurdî danîn. Di 1960an de, min pê çêbû yekem kitêba fizîkê ya bi kurdî biweşînim bi sernavê, 'Destpêk bo Mekanîk û Xwemaliyên Madeyê.'<sup>46</sup>

Di havîna 1956an de ez çûme Sûriye û Lubnanê ku li wê min gelek rewşenbîr û nivîskarên kurd nas kirin ku bi zaravayê kurmanciya bakur dixebitîn û karê weşangeriyê dikirin. Hindek ji wan Apo Osman Sebrî (Kanûna Duyê 1 1905- Çiriya Pêşî 10 1993), Qedrîcan (1916-1972), Xanima Rûşen Bedirxan (Tîrmeh 11 1909- Hezîran 1 1992), Ahmed Namî, û yên din bûn. Me behsa avakirina 'Akedemiya Zimanê Kurdî' û pêwîstiya bikaranîna elfabeyeke latînî ya yekgirtî bo zimanê kurdî kir. Protokola wê civîna me bi destnivîsa Osman Sebrî, ku çûye dilovaniya Xwedê, hate weşandin di nav kitêba min a 'Kurdî bi Elfabeya Latînî' de ku di 1957an de li Bexdayê hatibû weşandin.

Min di havîna 1957an de sefereke wekî wê kir bo rojhilatê Kurdistanê û Tehranê. Min li Kirmaşanê ligel yên din nivîskarê kurd Fath-Elî Heyderî Zêwacoyî û li Sineyê (Senendec) mela û nivîskarê kurd, Ayetullah Mihemed Merdoxî Kurdistanî (1885-1975) nas kir. Herduyan jî dilxwaziya xwe ya bo xizmetkirina li zimanê kurdî diyar kir.

Ji ber ku fêrkirina zimanê kurdî qedexe bû di dibistanên navînî de li Kurdistana Iraqê, wekî ku berî jî hate diyar kirin, min xebatên xwe ji neçarî bi dizî dikirin. Bi rêya dersên taybet, min gelek şagirt, mamoste û kesên din fêrî kurdiya bi elfabeya latînî kirin bi xêra kitêba xwe ya li jor navborî ('Kurdî bi Elfabeya Latînî'). Li dû xebateke kûr a gelek salan -li Kerkû-

46 Jemal Nebez: *Seretayî Mîkanîk û Xomelekanî-Madde* (Destpêk bo Mekanîk û Xwemaliyên Maddeyê'), Bexda. 1960.

kê, her ligel ciyê min ê sirgûniyê li Besrayê û paşî li Bexdayê-min pê çêbû têrmên bi kurdî durist bikim bo gelek peyvên teknîkî di warên fizîk, matematîk û hindek zanistên din de. Ev peyvên teknîkî di du ferhengan de hatine berhevkirin ku ji wan ya ewil min di 1960an de li Silêmaniyê û ya duyê jî di 1961an de li Hewlêrê weşand dema ku min li wir dersên ziman û edebiyata kurdî didan di Fakulteya Teknîk û Pedagojiyê de.<sup>47</sup>

Ev yek bes ji ber darbeya eskerî ya General Qasim di 14ê Hezîrana 1958an de û bi avabûna Komara Iraqê mumkun bû ku wê komara nû rê dida bikaranîna zimanê kurdî di saziyên pedagojîk de li Kurdistan û Iraqê. Ji dawiya salên 1960î ve, hevkarê min kîmyagerê kurd Kemal Celal Xerîb ku mixabin ew îro bi xwe ne di nav me de ye, dirêje bi wê xebatê da û çak bi serket.<sup>48</sup>

Heçî zimanekî kurdî yê yekgirtî û nivîskî ye -hêj dema li Kurdistanê bûm min bi vê dizanî- ne mumkun e zimanekî yekgirtî pêk bê bêyî ku ewil xebateke tekûz û berhevdaneke gramera zarava û devokên cuda bê kirin. Bi vê mebestê, min beşa Xebatên Rojhilatî xwend û herwiha Filolojiya Zimanên Rojhilatî li Ewrûpayê her ligel rêzeke zimanên Îranî yên qedîm, navînî, û nûjen. Encamên xebatên min ên derbarê berhevdana zaravayên kurdî de (kurmanciya bakur û navîn û ihtîmala nêzîkbûna wan) bi du berheman hatine weşandin: 1. 'Zimanê Nivîskî yê Kurdan' di *Acta Iranica de*, 1975,<sup>49</sup> û 2. 'Ber bi Zimanekî Yekgirtî yê Kurdî', 1976.<sup>50</sup> Di vê kitêbê de min pêş-

47 Jemal Nebez: *Ferhengokî Zanistî* ('Ferhengoka Zanistî'), bi kurdî, Hewlêr, 1961. Jemal Nebez: *Hendek Zarawayî Zanistî* ('Hindek Têrmên Zanistî') Silêmanî, 1960.

48 Kamal Jalal Gharib: *El'Qamus E'lmi* (Ferhenga Zanistî) kurdî, erebî, inglîzî, Cilda 1em 1975, Cilda 2em 1979, Cilda 3em 1983.

49 Jemal Nebez: *Die Schriftsprache der Kurden*. Ibid.

50 Jemal Nebez: Bnr. têbînî 44.

niyarin kirine da ku axêverên herdu zaravayan çêtir ji hev têbigehin. Gelek nivîskar û lêkolîner li wan pêşniyaran qayil bûn. Metodolojiya xebata min sebarek bi standardîzasyonê zimanê Belûcî jî hate nirxandin, mn. ji aliyê Belûcînas Xanima Carina Johani, di teza wê *Standardisation and Orthography in the Belochi Language* (Standardîzasyon û Îmla di Zimanê Belûcî de) de, Uppsala, 1989.

### Divêt çi bê kirin?

Ez bi vê helkeftê pêşniyar dikim:

1. Duristkirina ferhengeke berfireh a 'kurdî-kurdî' ku hemî peyvên di kurdî de bi kar tên rêz bike, peyvên biyanî û nûjen herwiha peyv û biwêjên hemî zaravayan li xwe bigre. Bi îmkanelektronîk û teknolojiya nû ev yek dikare di şert û mercên heyî de bê encamdan.

2. Ev konferansa navneteweyî divêt her sal bê dubarekirin, heke na, qe nebe herdu salan carekê.

3. Divêt enstîtuyên kurdolojiyê bêne avakirin û ew enstîtû girîngiyê bidine ser lêkolînên zaravayên kurdî û herwiha di xebatên li ser fîlolojiya kurd-îranî de rêza pêşîn bidin kurdî. Heta niha xebatên pisporî yên li ser zimanê kurdî, tim wekî beşeke çarçoveya firehtir a xebatên îranî hatine kirin. Divêt niha fîlologên kurd zimanê kurdî binin navenda sehneyê, ciyê xebatên îranî kêmbikin di nav çarçoveya firehtir a kurdolojiyê de. Têkiliya xebatên îranî û kurdolojiyê wekî ya matematîk û fizîkê ye. Di fizîkê de, matematîk bes wekî alîkariyeke temamker bi kar tê. Di vê haletê de, matematîk ne kêmtir girîng e ji fizîkê, û dîsa, ev yek nirxê matematîkê kêmbake. Proseke wekî wê heye bo kurdolojî û xebatên îranî jî. Heke kurdolojî armanca zanîna me be, xebatên îranî temamker û duhemî ye. Heke xebatên îranî be mijar, hingî kurdolojî rola xiz-

metkarekê dileyîze. Lê belê kurdolojî bi vî awayî pêk nayê. Kurdolojî bes ji xwe û bo xwe dikare bikemile. Ew jî beşek ji wezîfeya kurdolojiyê ye ku zaravayên kêm vekolayî yên wekî zazakî, goranî, feylî, lekî, lurî, kelhurî, hwd bi kûr û dûrî lêbikole. Jê pê ve, zaravayên mîna zaravayên kurdî, wekî zaravayên îranî mazandaranî, nainî, hwd ku hêj lêkolîn li ser nehatine kirin; divêt bi berfirehî bêne vekolan. Ez ligel wê baweriyê me ku 'navbera frekansê' ya zimanê kurdî firehtir e ji ya ku îro tê ferzkirin.

4. Qewlê projeyeke bo duristkirina 'Ferhenga Etîmolojiya Zimanê Kurdî' ji zû ve temam bûye.

5. Divêt peywendiyê zanistî hebe ligel Akademiya Zanist û Hunera Kurd, ku di 1985an de li Stockholmê hatiye avakirin da ku hêz û leza lêkolînên kurdolojiyê zêdetir bibe.

6. Di dahatûyê nêzîk de tu dewletên serwer ên gelê kurd nabin ku bi xwe bi helkirina girîftên zimanê kurdî û bêtir pêşvebirina wê dabikeve. Bi vê nezerê, bes yek rêhel heye: Divêt saziyek bê avakirin bo pêşvebirina zimanê kurdî. Ev sazî, bo nimûne, divêt meqamên akademîk bigihîne bo kurdolojiyê li gelek zanîngehan. Çêdibe, di van şert û mercan de elaqeya ser kurdolojiyê ne tenê li Kurdistanê û di nav kurdan de, belkî li Ewrûpa, Amerîka, Kanada, Îsraîl û Awustralyayê jî zêde bibe.

Gotineke pêşiyên kurdan çi dibêje? 'Dema pere dibiriqe û çingînî lê diçe, Mela jî mizgeftê dihêle.'



## Hindek berhemên Jemal Nebez yên çapbûyî

*Çîrokî Gerdaweke* (The Tempest). Wegera lîstika William Shakespeare bo kurdî, Bexda 1955.

*Lalo Kerim* (Apê Kerîm). Romaneke bi kurdî, li Hewlêrê çapbûye di 1956an de, çapa duyem li Stockholmê 1986. Fîlmê vê romanê heye ku aktorê kurd ê navdar Ahmed Salar dileyize. Wegera wê ya bi almanî li Munichê di 1968an de hatiyê weşandin.

*Xöndewarî be Zimanî Kurdî* (Perwerdeya Seretayî bi Zimanê Kurdî). Li ser muşkuleyên xwêndingeh û fêrbûnê û çareserkirina wan, Bexda 1957, çapa duyem bi pêşgotineke nû ji nivîskar li Stockholmê 1987.

*Nûsînî Kurdî be Latînî* (Nivîsandina Kurdî bi Tîpên Latînî), Çapxaneya Me'arif, Bexda 1957.

*Wergêran Huner e*, Silêmanî, Çapxanya Jîn, 1958.

*Palto* (Sako). Wegera romana Nikolai Gogol bo kurdî, ji erebî û ingilîzî, Bexda 1958.



- Hêndêk Zarawey Zanistî* (Hindek Têrmên Zanistî û Teknîkî, Ferhengoka Kurdî-Erebî ya Têrmên Zanistî û Hunerî), Silêmanî, Çapxaneyê Kameran, 1960.
- El-Ebcediye el-Kurdiye el-Latiniye Bayna Du'atiha wa Mu'aridiha* (Elfabeya Kurdî ya Latînî di Navbera Alîgir û Dijberên Wê de). Rêzeke gotaran bi zimanê erebî wekî bersivê bo 'Ittihad el-Şa'b' (Hewgirtina Gel), Weşana KP a Iraqê, hatine weşandin di kovara 'Sawt el-Ekrad' de (Dengê Kurdan), Bexda, Payîz 1960.
- Seretay Mîkanîk û Xomalekanî Made* (Destpêk bo mekanîk û taybetiyên maddeyê), Bexda 1960.
- Zarawekanî lijney 'riyazayat' le jêr hurdebînî lêkolînewe* (Lêkolîna têrmên matematîkê bi awayê ji aliyê Komîteya Matematîkê ve hatî weşandin) di kovara kurdî 'Rojî Nö' (Roja Nû) de, Silêmanî, hej. 6, 7 û 8/1960, hej. 11/1961.
- Kurdische Schriftsprache. Eine Chrestomathie moderner Texte* (Zimanê Kurdî yê Nivîskî. Berhevokeke Tekstên Nûjen), Hamburg: Buske Verlag, 1969.
- Sprichwörter und Redensarten aus Kurdistan* (Biwêj û Gotinên Pêşyan ji Kurdistanê), Munich, National Union of Kurdish Students in Europe NUKSE (Yekîtiya Neteweyî ya Xwendekarên Kurd li Ewrûpa), 1970.
- Hawla el-Muşkile el-Kurdiye* (Derheqê Kêşeya Kurd de), bi erebî. Lêkolîneke li ser hizrên partiyên kurdên Iraqî û erebên Iraqî derbarê kêşeya kurd de. Ji aliyê NUKSE ve li Almaniyayê hatiye weşandin, 1969.
- Der Kurdische Fürst Mir-i Kora* (Rawandizi) im Spiegel der Morgenlandischen und Abendländischen Quellen (Mîrê Kurd Mîrê Kore (Rewandizî) bi Ronahiya Çavkaniyên Rojhilatî û Rojavayî). Îlaweyeke Zanistî bo Dîroka Kurdî, Hamburg 1970. Ji aliyê Fexrî Salaschor ve hatiye wergerandin bo erebî. Weşana Akademiya Zanist û Hunerê, Stockholm û

- Hewlêr 1994. Çapa duyem, Hewlêr.
- Kurdistan und seine Revolution* (Kurdistan û Şoreşa wê). Rêze semînereke li Almanyayê pêk hatî di 1971an de, ji aliyê Yekîtiya Neteweyî ya Xwendekarên Kurd li Ewrûpayê -NUKSE ve di 1972an de hatiye weşandin. Ji aliyê Kurdo Elî ve hatiye wergerandin bo kurdî, Stockholm, 1985.
- Kurdische Marchen und Volkserzahlungen* (Çîrcîrokên Kurdî), ji aliyê Yekîtiya Neteweyî ya Xwendekarên Kurd li Ewrûpayê -NUKSE ve di 1972an de li Bambergê hatiye weşandin.
- Ein Kurdisches Mondobservatorium aus Neurer Zeit* (Ruwanîngeheke Kurdan a Serdema Nûjen) di ZDMG (Kovara Deutsch-Morgenlandische Gesellschaft), Hej. 122, 1972, rp. 140-144, hev-nivîskar Profesor Wolfhard Scholsser.
- Kurte Mejûyekî Kurdnasî le Elmanyada* (Kurte Mějûyeke Kurdnasiyê Li Elmanyayê), di 'Govarî Korî Zanyarî y Kurd' (Kovara Akademiya Kurd) de hatiye weşandin, Hej. 1, Beş 2, Bexda 1974, rp. 413-498.
- 'Kurden' (Kurd), di 'Lexikon der Islamischen Welt' (Ferhenga Cîhana Îslamê) de, Kohlhammer Verlag, Stuttgart 1974, Hej. I, rp. 114-115.
- 'Jeziden' (Êzidî), di 'Lexicon der Islamischen Welt' (Ferhenga Cîhana Misilman) de, Kohlhammer Verlag, Stuttgart 1974, Hej. I, rp. 67-68.
- Kommentar zu Otto Spies' Artikel 'Kurdische Märchen im Rahmen der Orientalisch-vergleichenden Märchenkunde'*, di FABULA de, Zeitschrift für Erzählforschung, 1974, 15. Bd., Heft 3, S. 245-49.
- Die Schriftsprache der Kurden* (Zimanê Kurdî yê Nivîskî), di Acta Iranica, Monumentum H.S. Nyberg, Hej 2, 1975, rp. 97-122, Diffusion E. J. Brill, Leiden
- Serincêk le Çend Zaraweyekî Tazebekarhatû û Korî Zanyarîy Kurd* (Hindek Nû-Têrmên Zanistî û Teknîkî ji aliyê Akade-

miya Kurdî ve hatî bikaranîn. Rexne), di 'Govarî Kollêcî Edebiyat' (Kovara Fakulteya Edebiyatê, Zanîngeha Bexda) Hej. 22, 1978, rp. 79-115

*Zimanî Yekgirtûy Kurdî* (Ber bi Zimanekî Yekgirtî yê Kurdî), ji aliyê Yekîtiya Neteweyî ya Xwendekarên Kurd li Ewrûpayê -NUKSE ve di 1976an de li Almaniyayê hatiye weşandin. Çapa duyem ji aliyê Weşanxaneyê Seyidiyan li Mehabadê ve di 1979an de çap bûye.

*Die Staatliche Persische Einheitspartei 'Rastakhiz' Entstehung und Niedergang* (Avabûn û Daketina Partiya Dewletî ya Yekîtiya Fars 'Rastakhiz'). Semînera li Enstituya Îranolojî ya Zanîngeha Kopenhagenê hatiye pêşkeşkirin, Danîmarka 1979.

*Die Religionsgemeinschaft der 'Haqqa' in Süd-Kurdistan* (Civaka Dînî ya bi navê Heqqe li Başûrê Kurdistanê). Semînera ku di bihara 1979an de Konferansa ji rojhilatnasên alman re hatî pêşkeşkirin li Zanîngeha Azad a Berlinê, 1979.

*Der Arabische Nationalismus in Irak und Syrien und die Nationalitätenfrage im Vorderen Orient* (Nasyonalîzma Erebiyê Li Iraq û Sûriyeyê û Rewşa Nasyonalîzmên din li Rojhilata Nêzîk), Teza Dîplomeyê, Zanîngeha Azad a Berlinê.

*Hendêk le Kêşe Binretêkanî Qutabxaney Kurdî y Sosyalîzm* (Hindek Kêşeyên Bingehîn ên Mekteba Kurdî ya Sosyalîzmê), Stockholm 1984. Çapa duyem li Hewlêrê 2001.

*Bîrî Neteweyî Kurdî, Ne Bîrî Qewmîyetî Rojhelatî w Ne Bîrî Nasyonalîzmî Rojavayî ye* (Felsefeya Neteweyî ya Kurd, Ne Nasyonalîzma Rojhilatî û ne jî ya Rojavayî ye). Semînera di 18ê Tebaxa 1984an de ji kurdan re hatî pêşkeşkirin li Stockholmê. Çapa yekem li Stockholmê di 1984an de û çapa duyem ji aliyê Kurdnameyê ve li Londonê di 2002an de hatiye weşandin.

*Dozî Nasyonalî Kurd: Otonomî yan Kurdistanêkî Serbexew yan*

*Mafî Biryarî Çarenûs le Azadîda û bo Azadî* (Doza Kurdan a Neteweyî: Otonomî yan Kurdistaneke Serbixwe yan Mafê Biryara Çarenûsê di Azadiyê de û ji bo Azadiyê). Semînera bi kurdî û ji kurdan re hatî pêşkeşkirin li Stockholmê di 11ê Gulana 1985an de. Ji aliyê endezyar Brûsk Îbrahîm ve hatiye wergerandin bo almanî. Wergera almanî di 1987an de li Stockholmê hatiye weşandin. Ji aliyê Kristian Ronberg ve hatiye wergerandin bo swêdî û wergera bi swêdî di 1988an de li Stockholmê hatiye weşandin.

*Die Kurdische Zeitschrift 'Nishtiman' Juli 1943-Mai 1944, Organ der Kurdischen 'Jekaf'-Partei und das Geistesgut des Intellektuellen Nationalistischen Kleinbürgertums in Kurdistan. Ein Beitrag zur Erforschung des Nationalismus im Vorderen Orient* (Kovara Kurdî 'Niştiman' Tîrmeh 1943-Gulan 1944 û Heyînên Hizrî yên Sinifa Burjuwaziya biçûk ya Nasyonalîst a Rewşenbîr li Kurdistanê. Lêzêdekirinek bo lêkolînên li ser Nasyonalîzma li Rojhilata Nêzîk (bi almanî û kurdî li gel rûnivîseke kovarê). Weşana Akademiya Zanist û Hunera Kurd, Stockholm 1985.

*Pêwendarêti y Kurdî* (Peywendîdariya Kurdî). Semînera bi zimanê kurdî ku di 27ê Kanûna yekem 1985an de li Kopenhagenê hatî pêşkeşkirin. Di 1986an de li Stockholmê bi kurdî hatiye weşandin. Ji aliyê semînerdarî ve hatiye wergerandin bo almanî, di 1987an de li Stockholmê hatiye weşandin.

*Serincdanek le Mitolojiya Kurd* (Lêkolîneke Mîtolojiya Kurd). Semînera di 1ê Kanûna 1986an de li Amsterdamê (Holland) hatî pêşkeşkirin. Weşana Akademiya Zanist û Hunera Kurd, Stockholm 1986.

*Êste û Paşerojî Netewey Kurd le ber Girî Agirî Cengî Êraq û Êran da* (Niha û Paşeroja Neteweya Kurd li ber Roniya Agirê Cengê Îran û Iraqê). Semînera di 21ê Gulana 1988an de li

Stockholmê ji sedan kurdên li Îskandînavyayê re hatî pêşkeşkirin. Weşana Akademiya Zanist û Hunera Kurd, Stockholm 1988.

Govarî Komonistaney 'Yekêtîy Têkoşîn' (1944-1945) û Îdyolojîy Hurdeborjway Marksîstî y Kurd (Kovara Komunîst a Kurd 'Yekêtîy Têkoşîn' (Yekîtiya Têkoşînê) di 1944-45an de û Îdeolojiya Hûrdeburjuwaya Marksîst a Kurd). Weşana Akademiya Zanist û Hunera Kurd, Stockholm 1988.

*Sizay Mirandin le Zagonî Îslamda* (Cezayê Îdamê di Huqûqa Îslamê de). Semînera bi kurdî di 25ê Adara 1989an de li Londonê hatî pêşkeşkirin, bi organîzasyona Akademiya Zanist û Hunera Kurd.

*Die Ezidis sind keine Teufelsanbeter* (Êzidî ne Şeytanperist in), semînera di 8ê Gulana 1990an de li Zanîngeha Bremenê hatî pêşkeşkirin.

*The Kurdish Language from Oral tradition to Written Language.* (Zimanê Kurdî ji Tradîsyona Devkî bo Zimanê Nivîskî). Teblîxa ku di 28ê Çiriya Duyê 1993an de li Parisê di konferansa 'Zimanê Kurdî ber bi sala 2000ê ve' ku ji aliyê Zanîngeha Sorbonne û Enstituya Kurdî ya Parisê ve hatibû organîzekirin de hatî pêşkeşkirin. Teblîx di 'Kurdistan Studies Journal' (Kovara Lêkolînên Kurdistanê) de hate weşandin, Hej. 5, Uppsala (Swêd), Adar 2001. Çapa duyem, Western Kurdistan Association, London, 2005

*Al-Mustadaafoon al-Kurd wa Ilkwanuhm ul-Muslimoon* (Kurdên Tepeserkirî û Birayên wan ên Misilman). Semînera bi zimanê erebî ku di 21ê Gulana 1994an de li Cologneyê (Almanya) di Duyem Konferansa Îslamî bo Çareseriya Kêşeya Kurd de hatî pêşkeşkirin ku ji aliyê Yekîtiya Îslamî ya Kurdistanê ve hatibû organîzekirin. Weşandin ji aliyê Kurdnâme li Londonê di 1997an de. Ji aliyê Tayer Hememîn ve hatiye wergerandin bo kurdî (Bêdeselatî Kurdekan û Bira Mu-

silmanakanyan), Silêmanî 1998.

*Kurdnasî le Nêwan Zanist û Hoqebazî da* (Kurdnasî di Navbera Zanist û Hoqebazî de). Semînera di 1995an de li Zanîngeha Göttingen li Almanyayê hatî pêşkêşkirin.

Hevpeyvînên ku hizirvanê kurd Jemal Nebez dane Kovarên 'Kurdistan el-Mucahide', 'Newroz', 'Sawt Kurdistan' û 'Kurdname.' Bi erebî û kurdî, ji aliyê Cewad Mela ve hatiye amadekirin, ji aliyê Kurdname ve li Londonê di 1996an de hatiye weşandin.

(Têbînî: Di wê çapê de hindêk name jî hene ku di navbera Jemal Nebez û serokên du partiyên sereke yên li Başûrê Kurdistanê Mesûd Barzanî û Celal Talebanî de hatine nivîsandin li ser pêkvejiyana aştiyane ya herdu partiyan û pêşniyarên li ser rêkên pêkanîna dahatuyêke baştir bo kurdan.)

Muqabelat Suhufiye maa el-Mefakir el-Kurdi Jemal Nebez (Hevpeyvînên hindêk rojnameyan ligel Hizirvanê Kurd Jemal Nebez). Hevpeyvînên bi kurdî û erebî, weşana Kurdnameyê li Londonê 1996.

*Die Kurden, ihre Geschichte und Kultur* (Kurd: Kultur û Dîroka Wan). Semînera di 19ê Îlona 1997an de hatî pêşkêşkirin li Mala Civata Kurdan li Berlînê.

*Rojanî Awareyîm le Swêsre* (Rojên Min ên Sirgûnê li Swîsreyê). Bîranînên kurte maneke 1962an li Genevayê. Weşana 'Binkê Edebî û Ronakbîrî y Gelawêj' (Saziya Edebiyat û Rewşenbîrî ya Gelawêj), Silêmanî, 1999.

Güneydeki Son Gelişmeler Üzerine (Li ser Rûdanên Dawî li Başûr), rapora Huseyin Taşan, hevpeyvîn ligel Jemal Nebez, di Kovara bi Zimanê Tirkî 'Kürt Solu' (Çepê Kurd), Rêze Weşanên Newroz, Tebax 2001, Hej.6, rp. 176-189., wergera bo tirkî A. Bali û H. Tasan.



Jemal Nebez di vê kitêbê de li ser gelek mijar û babetên cihê disekine, bo nimûne, dîrok û mîtolojiya kurdan a kevin a berî xirîstiyaniyê, bilindî û kûratiya kulturî ya kurdan li jêr sî û sîbera gelek êrîşên xelkên biyanî di Kurdistanê re, cihêrengiya dînên li Kurdistanê, ligel bal û girîngiyeke taybet li ser sînkretîzmê; wekî taybetmendiya herî beloq a kultura kurdan a dînî, û nasandina sînkretîzmê, wekî fênomeneke bi tewawî cuda ji dînên têkel. Nebez analîzeke hurd û deqîq a etîmolojîk û etnografîk a gelek şahidên dîroka kurdan pêşkêş dike: 'Peyv, têrm, tişte û her çi zuhûr û xuyabûna jiyana civakî ya berê', ku bi sedsalan e wekî 'ne-kurdî' hatine dêran ji aliyê wan kesan ve ku Kurdistan dagîr kirine, û bi bêfikirî wesa hatine qebûlkirin ji aliyê kurdên ku şik nedibirinê û rexne lê nedigirtin.

Ev yek aşkera dike ku Dr. Nebez ne dîroknasekî asayî û jirêzê ye, berevajî, wî bi xwe dîrok çêkiriye lew yekî wesa ye ku rexneya kulturî û prensîbên sosyal û felsefîk digihîne hev û şêwe dide wan.

**H. Mohemed Ali**

[www.avestakitap.com](http://www.avestakitap.com)

ISBN 978-9944-382-36-6



9 789944 382366



avesta 